

Kovareke rewşenbirî gisti ye
Her sê mehan carekê der dikeve



Navnîşan û Email

www.efrin.net/penus
kovarapenus@hotmail.com

Pênûs
Postfach 33 6
49023 Osnabrück
Germany

Jî weşanên

Partiya Yekîti a Demokrat a Kurd li Sûriyê -
(YEKÎTI) Rêxistina Europa

Pêñûs

Sernivîser Dr. Evdilmecîd Şêxo
mecidshexo@hotmail.com

Detseya nivîseran Keça kurd: serastkirina zimanê kurdî
H. Gundî: serastkirina zimanê erebî
Elî Cafer
Cim'a al-Dawod

Layout Hîm Mele Ehmed
Tabloya bergê Noredîn Cefer
Çapxane BABOL Druck
Köln



Her nivîskarek di ber berhema xwe de ; di ber
nêrîn , dîtin û helwesta xwe de bepirsyar e.
“Pêñûs” wî mafî dide xwe ku hemû nivîsarên
ku jê re têن, li gor rêziman û rastnivîsandina
mîrê Kurmanciya nûjen
Celadet Bedir-Xan, serast bike.

Pêñûs

Pênûsûnôq

naveroknaveroknaveroknaveroknaveroknaveroknaveroknaveroknaveroknaveroknaveroknaveroknaveroknaveroknaveroknaverok

Naverok

SERGOTAR	4
Êlén Bakur-rojhilate Kürdistané	6
Dr. O. Blau Wergerandin ji Almanî: Cankurd / 2001	
BÊJË Ú ËRKËN TÊVEL	17
Di Danîna Rêniyîsê de (Pewekirin û Cudakirin)	
BERZO M e h m û d	
Jina Kurdistan	20
Dewlet Eli	
Kurterexneyek li Cegerxwîn	23
Lokman Polat	
Sakirê Xudo:Kurd li çavên mirinê dinêrin	29
Û jê natirsin ew doza karê xwe dikin.	
Pêşkêskirin: Eli Cefer	
Bersiva min li ser nameya mamosta Reso Zilan	37
Keça Kurd	
„Haiko“-ya kurdî	41
Ebdurehman Effffi	
Feqî Resîde Hekarî û Du helbesten wî	42
Seîd Dêreşî	
Sî Ú HEW'T	47
Enwer Mihemed Ahmed	
GURG Ú SEYÊ ZÊREVAN	51
Perwiz Cihanî	
Dostê Baranê	53
Dr. Zorabê Büdî Aloian	
EGER DILSADÎ BI BASIK BIN	55
Adalbêrt Ludwig Balig	
Wergerandin ji zimanê elmanî Dr. Ebdilmecit Şêxo 2002	
JI bo me	59
Henîf Derwêş	

Xwendevanê rêzdar! Bi derçûna vê hejmarê re saleke pir awerte, watedar derbas bûye, û em hîn di bergehe hestewr û nazik de têper dibin. Di Rojhilata navîn de guhertinê giring û nirxbuha çê bûne. Vaye li Îraqê destdariyeke katî bi vîna gelên Îraqê hatiye damezrandin.

Bi vê destxistina ramyarî, stêriken Kurdistanâ başûrê e mezin geşîr bûn. Kurdistanî li Amedê Mehabadê û li Qamişloyê bi rûxandina rêtîma Bees li Bexdayê, û bi bawesîna azadiyê dilxwes bûn, û hêviyên serkewtinê mezin li pir welatê Rojhilata navîn hîn têne vejandin

Li aliyê din, rêtîmîn regezperest û nedêmukrat li welatê dirawsê, û bi taybetî destlatdarê Turkiyê, Îranê û Sûriyê ji têkçûna rêtîma Sedamê diktator, û ji pêkanîna hukmeteke dêmukrat û fêdral pir tîrsîyan û tengijîn. Lewra jî, karbidestê van sê dewletan, ci bi dizî, ci bi eßkere li hev dicivin û bi hev re pîlanên gemarî li dijî pêşketina Îraqa nû bi giştî û nemaze li dijî destkewtinê herêma Kurdistanê dirêsin.

Di 12avdara 2004an de bi fermana dezgeh û çavkaniyê fermî peyayên karbidestê Sûriyê pîlaneke şoven li dijî gelê me li Kurdistanâ rojava pêkanîn, lê cemawerê niştimanperwer bi mîranî li seranserî bajarê kurdistanê û li Heleb û şamê bi raperîneke aştiyane û şaristanî bersiva regezperistan dabûn.

Vêce mixabin “Rîh bû bost, lê dijmin nebû dost” Beesêjyan û nokerên wan, gule û qurşîn bi ser bêgunehê kurd de berdan. di encamê de bi dehan pakrewan û birîndar bûn, bi ser da jî, bi sedan welatparêzên kurd hatin zîndan kirin. Bi vê hêrişâ setemkar, partiya Bees li Sûriyê rûpeleke din e reşîr, şoventir di eniya dîroka xwe a qirêj de çespand.

Tevgera me a rewa, li hundur û li derveyê welêt bi qaserî bejna xwe, li gor nirîn û hêzên xwe, û hin caran li gel saziyên civaka bajarvanî û rêxistinê mafêni mifovan têkoşîna xwe li pênavê pêkanîna dêmukratîyê û çareserkirina mafêni gelê kurd li Sûriyê berdewam dike.

Bi rexberî vê jî rewş û taybetmendiyê nû di gorepana Sûriyê û cîhanê de peyda dibin wek 1-Avakirina sazî û dezgehê civaka bajarvanî, rêxistinê mafêni mirovan
2-Di vê dawiyê de, Yekîtiya ewropî dixwaze bi dengê nizm û şermokî li ser tunebûna dêmokratîyê li Sûriyê bipeyive, û her wisa jî hin têkiliyên sivik bi hin nûnerên bizava me re li derveyî welêt dike.

3-Ya herî berçavtir, gevgurên Emerîka ji partiya bees re li Sûriyê re ye.

Di bin siya van bandor û heyamên nû de, partiya bees ji bo dirêjkirina temenê xwe di rîveberiya welêt de neçar bûye van bîryarêñ jêrîn bistîne.

1-Vekişana lesgerêñ xwe jî Lubnanê.

2-Serbestkirina 218girtiyêñ kurd.

3-Bîryara lêvegerandina nasnameyê Sûriyê li kurdan.

Em hemî bi van gavavêtinê piçûk re dibêjin, erê! Lê em kurd û dêmokratên sûri di vê baweriyê de ne jî, ku pirsgirêk û derdêñ gelê kurd û civaka Sûriyê bi çend ASPIRÎNAN çareser nabin!!!!

Lewra jî azadî û dêmokratîwxaz bi dengê bilind û wêrekî dipirsin:

1-Çîma Siyasetvanêñ kurd û ereb hîn di zîndanan de ne?

2-Çîma karbidestêñ Sûriyê li ser kembera erebî naþeyivin?

3-Kîngâ destlata Sûriyê dixwaze hebûna gelê kurd li Kurdistanê weke neteweyeke serbixwe, û xawen hemî mafêni rewa di destûra welêt de bipejirîne?

4-Kîngâ bîryarêñ awerte li Sûriyê dê ji holê rabin?

5-Kînga Sûriyê dê bibe ya gelê kurd jî?

6-Kînga gelên sûriyê dê kanibin bi vîna xwe nûnerên xwe ji encumena gel re vebijêrin?

7-Kînga partî, komele dê kanibin serbest ji bo dêmokratiyê û pêşvebirina civaka xwe bixebitîn?????????

Di sebaret van kêşeyan de pêwiste em dîsan qîrînên xwe ji bo dadmendiyê, dêmokratiyê û wekheviya gelan bela bikin, û bêjin, tenê, piştî pêkanîna van pêdiviyên xalên jorîn û pirêndin, Sûriyê û civaka sûriyê dê bikanîbin roleke gewre û pêşrewî di pêşxistina şaristanî de bi hemî aliyên xwe ve li Rojhilatanavîn bilîze û xwe ji neyarêñ hundir û derve biparêze.

Xwendevanêñ birêz!

Dimîne em bi yadê 12ê avdarê û Helebca nemir serê xwe li ber pakrewanêñ hemî besêñ Kurdistânê bitewînin, û herweha jî em cejna rojnamegeriya kurdfî li we û li gelê xwe. Û li tevgera xwe li her çar besêñ kurdistanê pîroz bikin, û bila bijî tevgera azadîxwaz û pêñûsêñ serbest, rastgo û NETIRSONEK.

Sernivîser
15.04.05

Êlên Bakur-rojhilatê Kurdistanê

Dr. O. Blau

Wergerandin ji Almanî: Cankurd / 2001

(Jêder: Kurdische Sammlungen von Albert Socin, St.-Pétersbourg, 1890)

Li wê sêkoşeya balkêş, ku di ortê de seriyê(kopê) rûmetdar ê Ararat bi ser sê memleketan de dinêre û kumê wî di sê golan de dixuye; Gok li herêmên Urişî, Şahî li ên Farisî û zireyê Vanê (Behra Wanê) li ên Turkî, pêşxaneyên sê neteweyan dikevin di nav hev de, ewêne girêdayê sê baweriyên olî, yên ku li hember hev û din rawestîne.

Ji rojava û bakur ve cî û warên Ermenî, ji rojhilat ve êlên Turkmenî û ji başûr ve êlên Kurdî ta vê quncikê, ber bi jor ve.

Li hevçûna qewxiyan darbendên, ku siroşt û ramyariyê, netewayetî û baweriyê di nav gelan de danîne, hîn ranekirine, lê dîsa jî çare nîne li ber pêşketina hevnêzbûna tevan, bê ku taybetiyêne her aliyekev tev li ên din bibin, û girêkeka siqa bi navhevketineke ethnografi pêda bibe.

Lew re berî dem derbas dibe, divê kevnecihê van neteweyan ji zanînê re bêne servedan, berî ku ewan bi tevayî berşê (winda) dibin. Divê di serî de, bi hajêkirineke taybet li ser êlên kurdî bizaveke wilo bite kirin, ku xweybûna wan ji tevan bêtir bingef e.

Di serî de, çar êlên Kurdish, ku navçeya wan welatê navbera sê zireyan(derya) e: Celalî, Melanlî, Şikakî û Heyderanlî ne.

Celalî ji Kurdish tevan bêtir li derveyî têkiliya bi destûra êlan re ne, ewa ku ji aliye êlên başûrî ve hatiye paristin. Wek çawa ewan ji aliye cîgahê xwe ve ên tev dûrtir pijiqiyane ji navika Kurdistanê, wilo jî wan pir nijadêne kurd di nav xwe de birine, û ew xûna ermenî, yezîdî ([1]) û turkmenî tev li ya wan bûye.

Wek tê gotinê ([2]) wan navê xwe ji şehzadekî (mîrekî) ermenî ê hêzdar û cengawer, bi navê Celal binê ([3]), ewê ku bi sedan sal berê jiyaye, û êleke Kurd di berdestiya wî de bû. Ji aliye zimanî ve dij bi vê yekê tişt nîne, ji ber ku hevalbendiyêne din jî, bo nimûne wekî desteyêne derwêşen Celalî, li Multan, ku bi Seyid Celal El-Buxarî hatine navkirin, ewan jî bi wê şêweyê bûne xudan navê xwe, wek çawa êlan pir caran xwe bi navêne mîrên xwe nav dikin. Ew nimûne taybetiyeke, ku di vî navî de, li ser pirsên pircarkî, ku min ji Celaliyan pirs kirine, ka wan xwe ji kijan êlên Kurdish dijimartin û ji kijan malbatê hatine, ji min re herdem bersivek didan, ku ewan tenê Celalî ne û tev Celalî ne. Tenê yekî bo min got, ku bavpîrê wî kurdekî Dumbelî bû: berçavkirinek, ku min nikanî bû tiştek ji wê derxista ji ber ku min nedikarî bi pey navê dawî ketama, ta carekê min di destnivîseke ferhengeke geografi da, ya ku Nî'metullah Şîrawî nivisi bû, ev yek dît: „Dunbelî (bi Dam li gel Dal.) navê êlekê ye (taifeyeke) Kurdish e, ewan Qizilbaş in, bi Turkî dipeyivin û ewan Şîî'ne, cî û warê wan wîlayeta

Xoy ye „ ([4]) û hew..

Jî ber ku niha (mebest di dawiya sedsala nozdehê de) di herêma Xoy da hîç Kurdê koçer ne cîwârin. Diyare jêmayêwan êlên xwe di wan der û dorêni çiyayî de bi ich kirine, ku ciyêni niştewariya Celalî ne ([5]). Ez bêtir di wê yekê de dibînim, ku navê Celalî di binyada xwe de hîç ne navê neteweyî yê van Kurdan e, lê ew nişaneke bangewazîkirinê ye (navê lexem e-Wergêr), di serî de, di nav niderdora wan de, ku ji netewayetiya kurdî ne piijqîne, ew nav li wan hatiye kirin. Wekî din jî di Turkî de ev alîkarî bo rohnkirina navê Celalî , ku Celalî bi wateya dewletdişkonî û serhîlde e. Ji aliyekî dî ve, tiştekî seyr e, ku ev nav yê hemî binemalêni Kurdan, ên di berdestiya mîrê Ermenî Celal de bûn, û ji aliyekî din ve, ne wek serohata êlên Kurdan ên mezin e, ku malbatêni xwe li gor navêni mîrêni xwe nav dikirin (Ez dibînim, niviskar di vir de ketiye çewtiyeke mezin, gava Celaliyan bi mîrekî Ermenî nav dike- Wergêr).

Dibe, ku destekariya pevçûn û cengewarî û talankeriya Celaliyan li hember hersê dewletêni hevsînor re, ew rûmetnav ji wan re anî be. Herhal wan bi xwe jî ji xwe re ew nav wek nişan birine û bi kêmâsi niha ew êlnav bo cihêkirina xwe di vê navçeyê de bi kar tê. Hêzbûna vê êlê bi 5000 kon hatiye di-yarkirin, ku di bin fermandariya serakê jêtirs Ateş Axa de ne. Ew jî bi xwe xûkmendê (Tehsîldarê) serdarê Mako, Elî Xan e. Wargehê serekîn ê Celalî di mehêni zivistanê de senceqa Mako ye li ber Ak Golê, ku çiyagoleke biçûk a bi masiyan zengîn e, dorgera wê dora 3 katan e, ewan bi cih bûne.

Li vir ewan hin caran di gundêni xwe yên taybet de dijîn û carinan jî tev li êlin din in, ku ewan jî girêdayî Elî Xan in. Ewê paşîn ev in: Pareke ji Milanî û Heyderanî, ji ya dawî, şaxek ji Brukiyanî heye, emê careke din pêrgî wan bêni. Pişt re êlên serbixwe yên Kendîkanî, Banîkanî, Misirkanî, Zindikanî, û li dawiyê Karakoyunlî, ku ne sade Kurd e, divê ewan jî ji ên li dor Xoy rûdinin cihê bixuyin, û Yezîdî, ku ne ji wan Kurdan in û ne ji Turkmenan in, wek êlên hogir tên dîtin (Wek êlên serbixwe tên jimartin- Wergêr).

Gundêni serekîn ên, ku li derdora Ak Gol dema zivistanê xelkê xwe dihêwirînin, ev in: Xorof, Pênceri, Tambat, Jêrkolpî ([6]), Zendşana, Balûla, Mewlî, Şiddî, Zekîrlî-Kargoç- Elî, Terekeme, Indşe, Üzgûn, Nasik, Kosdu, Karabulak, Adagan, Tîkme (Divê ev bi ewa ku navê wê jî wilo ye û li paş Araratê biçûk cîwar bûye, neyê guhartin), û ji van pê ve hîn du gundêni din jî hene, lê çekdarê min, yê ku kurdekî ji Mako ye, navêni wan ji bîr kirine.

Celalî di teviya vê navçeyê de hêzgartirîn û belavtirîn êl e. Çembera barkirina wan parekê ji çiyayêni sînorî ên Farisî-Turkî digire, ku li başûr û rojhilate deşta Kara-Ainahê ye, rojavayê Diyadîn Ba-ligolê tê sînorkirin, û bakur- û ber bi bakurê rojava ve herêma Ararat ta bi qeraxê Araxes (Araks).

Hema berfa çiyan dest pêdike ku bih'ele, ewan dev ji Kişlakê (Zivistangehê) xwe berdidin, ku ber bi Yayleyêni (Zozanan-Havîngehêni) xwe bar bikin. Ew bi pezêni xwe ve, di serî de, bi çem re di robarê re dadikevin, ewê di nihalê Kara-Ainah re ber bi Mako ve diherike û pişt re xwe bi rebirrikî davêjin ser rîya karwanan, ew rîya ku Erzerum û Tebrîzê bi hevdû ve girê dide, û di 3 katan de li jêriya Bayezîdê sînorê tîrkî derbas dikin. Li gorî pêketina wan, ku li vê herêmê an li wê çêdibe, û vî rûyê çiya an wî rûyê din digirin, da bavêjin ser karwanêni biharê. Van talanan di Gulanê an Hizêranê de her sal çêdibin û wilo dirêj dikin, ta sînorparêzen Faris an Turk pêwîst dibînin, ku bi deselatdariya çekdar wan ji vê yekê rawestînin.

Dema ez di Hizêran a 1857ê de di wî sînorî re derbas bûm û min şevîna xwe li Kilisakendê kir, bi hatina me re qeral bi nişkê hat agahdar kîrin, ku Celaliyan di şevînê de bi hezar konan li Defîle, di rêya pan de, ku katekê dûrî çadiregeha qeralgehê ye, kon vegirtine, hema pezê du gundan derkirine û karwanek şelandine, û di pevçûna wan de li gel karwanê hinde kes birîndar bûne. Ji ber xedâbûna dijwar û çalakiya ku Celâli pê hêrişên xwe yên talanê xwe dikin, tirs avêtine dilên hemî daniştvanê aşt ên li deşte. Hîn piştvaniya çekdar cilên xwe ne kirine ber xwe, talankeran xwe bi şûn ve kişandibûn berqefêni çiyan, ku kesek nema bi pey wan dikeve. Ji dehan sal ve rêuî tev li ser van kiryarên xwînî yên Celâli dipeyivin. Di dema nû de egereke taybet pêda bûye, ku dihêle ewan bi bêtir viyan, bavêjin ser herêma Ovaçık ya qeralê Faris. Ev jî Xelîfe Kolî Xan e, ewê ku Wagner di bin navê Xul Xan de dinase ([7]), kurekî wî heye, Kerîm Axa, yê ku demeke dirêj li xangeha Elî Xanê Mako derbas kiribû. Li wir Fatmeya bedew, dota „qîza“ tenha ya serwerê kurd ji wî hez kiri bû, û loranî bavê wê minê ne kiribû keça xwe bide wî, ew keç pişti gelek karêne nebaş û dijwar revand navçeyâ Ovaçîkê. Ji ber vê yekê Elî Xan bi 3000 çekdar avêt ser Ovaçîkê û gef û gurr dan, ku ewê tev bide ber agir û şûr gava dota wî û zavayê nehezkirî nedin dest wî.

Hîngê Urisan di cengen xwe ên paşîn de dij bi Turkan Beyazîd bi dest xwe ve anî bûn, û hêzeke Uris jî li nêzîka sînorê li girên Kasdiolê bû. Kulî Xan ji tengerewê alîkarî ji serdarê wan xast, û wan jî bi gotineke hişk, ji ber têkiliya baş bi Elî Xan re, ku dostanî di nav wan de hebû, kanî bûn wî bo vekişanê ji wir biliwînin. Ew vege riya çû, lê her sal Celaliyên xwe dişandin ser wan, ku ziyanên talanê bigîhînin navçeyê Kuli Xan, ku seriyê qeralê şah dişandin. Di dema ku hovîtiya pîremêr delîve ji xwe re distand, Kerîm Axa û Fatme Xanim di qonaxa Kilissakendê de dijîyan, ya ku li dergahêne wê du gur û du qoç û qoçkîn kovîyan, ku ji nêçîrê bi dest ketine, hatine tijî kîrin û dalîqandin. Jîneke xanedanî derbas dikirin, ew mîna Nemrûdê çiyan, û ewa din jî wek durreya Ovaçîkê.

Gava ku Celâli xwe di dijwariya pêşvehatina cendirmeyan an hêzên fermî de dibînîn, tenê ji wan ve reçûna şevekê pêwîste, ku xwe bigîhînin nav herêma tirkî. Ev qiracê biçûk yê Kasî Golê ye, lê têr çêrgeh e, ew der, ku çadirgeha hemî Kurdên ji gavanen hevser in bo 40 rojên havînê ye, ango ji Gulanê ve ta bi destpêka Abê. Di vê demê de, yên ku li ber zireya biçûk a navê qiracê jê hatiye hetanî çêregeh şîn dimînin, qoçandariya tirkî li hember wan e, di rêya karwanênu ku ji Tebrîzê ve bi bar û pertalanê xwe ve, li wir pênc rojan cîwar dibin. Bi ser ve jî, ji ber şînbûna giyayî wilo dixuye, ku delîveyeke asan bo talanê çêdibe, ya ku hewesa Kurdan bilind dike, û dihêle, ku ewan ji berqefê zinaran ve binêrin, ka sewalek verê bûye, an xirarekî pertalan bê pawan li nêzik wan e, derdora riyên qoçandariye, ku karbdesten wê di vê çadirgeha havînê de, bi kêmîtir paristina çekdar mane. Lê gava qoçandarî ji çadirê xwe vedigerin zivistangeha Kizil-Dize (Kela Sor – Wergêr) nav kunkên erdê (maxêni zevînê de- Wergêr), Kurd ji dev ji çêregehêne wê tengenewalê berdidin, û Celâli hînek ber bi rûyê Araratê ve vedikişin û hînek jî bi pişta çiyan ve, bi aliyê Diyadînê ve diçin. Di wê navê de hînek oben Kurdan ên din tev li wan dibin, ji yên ku zivistangehê (qişlaqên) wan li herêma turki an rûsî ne, û bi wan re çêregehan parve dikin, an jî penahendê, ku ji aliyê xûnê ve kurdin, tev li wan dibin, yên ku ji ber ramyariya karbdesten turk, ya ku ji cîhilkirinê an jî ji ber tîrsa Nîzam, mîrzayê mezin, an Sar (Keyserê Urisan-Wergêr) xwe didin aliyekî û dîsa vedigerin jîna koçeriyê. Wilo qelfê Celaliyan her sal bi gelek seriyêni din dirêjtir dibe, bi taybetî ji destpêka cengen rûsî-turkî yên dawîn ve. Êlén biçüktir, ku di zozanen (yayleyan) de tev li Celaliyan dibin, Edemî, Sipirlî û hînek şax û binemalên Heyderanlı. Êlén ku ji aliyê fermandariya turkî ve li Diyadînê û li derdora wê hatine cîwarkirin ev in: Sivkanlı, Me'manlı, û Edemanlı ne, ên pêşîn ji van, Sila'lî ye, ev in ku emê careke din bênen ser wan, ên din jî di koka xwe de Heyderanlı ne. Li gorî nêv ewan ji Edemî yên koçer in.

Wilo pir êlên kurdî bi du navan tênavkirin, yekî kurt û yekî dirêjtir, bê ku ciyawaziyek di wateyê de bite bi cih kirin, bi kar tê.

Wilo mera Sîvkîlî li gel Sîvkanlî, Kazîlî li Kazkanlî, Maneklî li gel Manûkanlî, Mela li gel Melanlî, Sumayî li gel Sumayîlî, Marçor li gel Malçoranlî dibihişe; rewšeke, ku ciyawaziyêni di navbera gotinêne rîwîyan de, rave dike. Ez bawerim, ku min berçavkirinek aniye zimê, ku navşêweyêni dirêjtir bo parê cîwarbûyî ji malên êlê bêtir bi kar tê (Niviskar peyva erebî rea'ya - ایاع - bi kar aniye-Wergêr) û şêweya kurt, tersî wê yekê, bo malbatê koçer tê gotinê (Niviskar peyva koç - جوک bi kar aniye-Wergêr), Lê Kurd bi xwe vê yekê nakin serohat. Ger (Koçer) be ([8]), di navbera wan de ci hevbendî namîne, ên cîwar bûyî ji aliyê birayê koçer ve têni nizimkirin û زیارتیا rin. Ewana kêmîtir asê ne, lê mera nikane wêrekiya wan a serohatî wek yên koçerên serbixwe wilo bilind bi کوچ. Lawazî û daketina jinê kurd li gundênderdora Bayezîd û Diyadînê di nav Osmanliyêni wan hêlan de bi rastî heye. Celalî pesna xwe didin, ku ewan hemî koçer in, lê di rastiyê de, tevî ku li ser zevînêni farisî, tirkî û rûsî pezêni xwe diçerînin, ne Şah, ne Sultan û ne jî Sar wek serak ji xwe re minê dikin, tenê Elî Xan ê ji Mako mezintirîn serdar e li ba wan, ciwanmêrekî êla wan e û xanedantir e di nav giş axan de. Di herêma çolkirina Celalî de sînorê wan ji aliyê başûr û başûrê rojhilat ve digihe Melanlî an (Mela-Kurd) û ewan bi (Milanlî an Milan) jî têni naykirin. Ewan ji pişt Heyderanlî ne. Lê ji zû ve bûne wek desteyeke (Taîfeyeke) bi serê xwe û bi tevlîbûna bermayê hinek êlén bi hêz bûne. Navenda zozana (Kişlaqa) wan ciyayê Kotûr e û ciyayêni di navbera Kara Ainah û Xoy de ne. Di nexşeyan de ev girêka vî ciyayî wek adetê Cîlan Dax (Ciyayê Maran-Wergêr) tê navkirin. Bilindîtirîna herdu serîyan bi Çibûklî û Sîwandax têne nav kirin. Zincîra ciyayêni vulkanî, ku wê girkê bi zincîra Araratê ve girêdide, bi navekî hevreyî Mamiş Xan tê nav kirin, navekî ku li gel navêne herêma wê hêlê wek Mamiş-Şerîf û Mamişan, ew êla kurdî, ya ku bi navê Mamiş û niha Fraser wê ji Bilbas bi bîra me tîne. ([9]) Ev xêza ciyan herêmeke farisî ye, belê ew navçeya Kotûr ser ji nû ve ketiye destê Tirkan. Di van xêzikên diyarkirî de Melanlî tenê di pênc gundan de li ser zevînê farisî ne: Kurdîkend, Kara-Axaç, Kizilşe-Kela, Karakûş û Karpût, bi tevî li navçeya herikîna Ak-Çay (Çemê Sipî-Wergêr) di nav ciyan de li ser qeraxê wî ê rastê, cîwarin. Bêtir bi başûr de navbera Çorûk û Xoy de, hîn xirabeyê belengaz ên Xanê Kurdi hene, ku cîwarbûna Kurdan a berê li wir nîşan didin, lê niha Kurdan ew cî war berdan e.

Tersî vê yekê tê gotin, ku li sirtêne rojavayê ciyayê Mamiş Xan, êleke Kurdan heye, ku ne di bin destê Tirkan de û ne jî di bin yê Farisan de ye. Hevpişte Melanlî ye û navê wê Ellend e, li wir cîwar bûye û gelek gundêne wê kiştûkalî hene, wek şax in taybet ji Kurdên Melanlî, ji min re hatin gotin; Melanlî bi xwe, Lîvanlî, Sarîmlî û Kûseler, ev navê paşîn tenê wek turkî-farisî yê bo pêkenîne dixuye, ku ji kosebûna rîyên wan hatiye. Di herêma wan de jî, hinek obêne van êlan li kenaran belavin, wek Heyderanlî li rojava û Şîkakî li başûrê ciyayê Kotûr. Wilo wek nimûne di salêne dawîn de Marxur an Malxur ji Heyderanlî di nav Mela (Milan) de, ku li Cîlandaxê cîwar bûne, niha ji nû ve ber bi memleketa Urum ve çûne, ku bi wî navî ta niha hem Kurd û hem jî Turkmen wan navçeyêni anatolî û ermenî yên qeyseriya yûnanî ya berê navdikin. Min ewan pişt demekê li nêzîka Melazgerd bi terzekî koçerî di bin navê Malxuranlî de dîtin. Mela îro jî bi tevayî serberdayekî xav, xirap û gemarî ye wek Celalî. Ez pêrgî koçbûneke wan di navbera Haramî û Qere-Ainah de hatin, ku li kenarê başûrê deşte diçû, di wê demê de, ku Celalî kenarê bakur girtibû. Ew ob dora 200 gayêne barkirî bû, ku kon û zar û zêc hilgirti bûn. Mêr û jin, bêtir bi peyati diçûn, pir kêm malbatek suwar hebû. Di rewšeke wilo de, divê mîr bi çek li ser paşqirka hespê ba, jin tev li zarakan li ser paşpişta hespê ba. Karwanê wan hejarî û belengazî nîşan dida, pezêni ku hin hezar gav bi pey wan keti bûn, pir hindik û jar dixuyan, tenê mîrmezinê obê, ku xanedan û rûmetdar dixuya, serîlê wan dora 200 gav di serî de bi suwarî

diçû û li gel wî tenê jineke ciwan û rindik, ku bi şewe耶eke cilberkirina ne cuda ji ên din, li mehîneke gewrequşîni suwar bûbû. Ew bi xwe, Hesen Axa, ku ciwanekî geş û xurt, dîmen rûmetdar û serbilind bû, silav bi „Selamüleleykum“ ([10]) dida, ew pir li wî dihat û di peyvînê de xwe wek xudan serohatinek hêja diyar dikir, ku têgihiştî û rastiyar dixuya. Ew fermandarê bêtir ji 800 kon bû, ji 2500 konê an xaneyên Melan bi giştî. Dihat berçavkirin, her xaneyek xudan konekî bû, ku di orta wê de perdeyek hebû, aliye bo xwemal bû û yê din jî bo jin û zarokan bû. Tenê bo serêl û bi taybetî xanedanane konekî cuda ji h'erîmên (حریم) wan re hebû, konê kurdî yê adetî li ser 6-8 stûnan e, her yek ji wan 2- 2 ½ Zollan (Zolleke almanî 2 ½ - 3.30 Centîman e –Wergêr) qalind e, di ser wan re konê, ku ji müyê bizinan tev li hiriya reş û mor a miyan e, tevnekirî hatiye rôexistin, ji sê aliyan ve dora nîv bejmerekê bi kèlekan ve daketiye û ji bin ve bi benan hatiye girtin, aliye pêşîn wek adetê bi tevayî vekirî ye an jî bi xaliyan hatiye pêçandin. Bi singan ve li vî alî hespên xudanê kon tê girêdan, gava ew li mal be, di hindir de xalî û kulav têne rôexistin, ta ciyê ku agir tê de tê dadanê, hêla bermaliyê ji ji aliyê pêşîn ve baş girtî ye, belê tê re tê dîtin.

Li başûrê navçeya, ku Mela cîwar bûne, piştî zireya Urumyah ([11]), ku bi dirêjiya kenarê wê yê rojavayî û ta bi nêzîka zireya Wanê, wargehêن Şikakî belav in, yek ji êlén kurdî yê sade û mezin, ya ku ez navê wê wilo dînivîsim, weku mera her dibihîse jî, Şikêk (Şeqoq li gor raporê misyonerî yê amerîkî) an Şikêxt, ku di devê gel de pir caran dibe Şkeft jî. Di destnivîsa Nîmetullah de wilo ye: (Şiqaqî nam taîfe est ez tewâif Kurd û ez tewabî) Qizilbaş Mih'el işan der Newah'î Tebrîz û Siraist

“ Şikakî navê êlekê ye ji êlén Kurdan û pêkevên Qizilbaş, warê wan li navçeyê Tebrîz û Sera ye.”

شاققى نام طايفه است از طوایف کرد و از توابع قزلباش محل ایشان (در نواحی تبریز و سرابیست

Ew navê paşîn dibe jî tenê navê herêmekê be, ku di navbera herdu zireyan de ye (Wan-Urumiyah –Wergêr) li navçeya Albagê. Nîmetullah hêza 60.000 mal dide vê êlê. Niha ev êl nema li derdorêن Tebrîzê rûdine, belê wê xwe bi ciyayên li sînorêن rojavayî yê Aderbeycanê û hinekî jî xwe bi ser herêma turkî ve bi sûn ve kişandiye. Li ba wan jî hîn rîbaza êlî bi şewe耶ekî bê xemtir maye. Bo yek serkêş heye, ew jî kesaniya serekê malbata tewr xanedantir e. Niha, ji ber serhildana wan dij bi deselatdariya farisî pir bi navê Elî Axa tê navkirin, yê ku di ciyan de li rojavayê Urmîyah cîware. Taîfe li 7 êlan parve dibe, navên wan jî min re axayekî Sumayî bi vê terzî gotine:

Sumayî, Bodrayî, Tergewer, Mergewer, Gever, Mogor û Şemisiddîn. Bo her êlekê ji van axayek (serakek) heye, ji aliyekî ve ji hêla çandeya ku dem bi dem bêtir damaran berdide kenarekî zireya Urumiyah, û ji aliyekî ve ji ber hêzdarîya Kurdêن serbixwe yê mîrana Rowandozê, bergeha koçberiyê li ber wan hatiye tengkirin û tenê di nav navçeya ciyayî ya zirav de, ewa ku li kenarê rojavayî yê zireyê (Urmîyah-Wergêr) ji wan re dimîne, û gellekan ji wan jî bi dehan sal e xwe ji jîna koçeriyê cihê kirine û vehesa xwe di jîna niştewariyê de dîtine. Hetanî di bajêr û warêن vî alî de jî, bi nav ji êlén Sumayî û Budrayî niştewar bûne. Tergewer û Mergewer li sirtêن, ku bi navên wan in, li ser sînorêن turkî-farisî niştewar bûne ([12]) Gavar û Gever hîn koçer in, li aliyê turkî yê geliyê robarê Nehel an Nihil ([13]), û li wir pir Nestorî “Filleh-Wergêr” tev li wan bûne. Şemdînî û Mogor an Mukurî li dawî, bêtir li bakur-rojavayê deştêن Albag (Arrhapachitis) û Marastan belav bûne.

Çolistana mezin û dewlemend ya Albagê di dema gera min de, di Augusta 1857ê de, ji aliyê pênc obêن Mukurî ve, ku di bin serkohiya Ahmed Axa de bûn, hati bûn girtin. Êlén koçerî ên serbixwe, ku li rojava- û başûrê rojavayê sînorêن navçeya Şikakî, Hergî, Paçkî, Mikrî, Zerzaw, Bilbas û Caf –kesaniyê tabelav ên van hemî êlan, di nav Şikakî de jî li her derekê belav in. Navê neqenc ê hov-

bazî û çav li talanê, ku berê bi ser Şikakî keti bû, êdî pir winda bûye.

Min ew li her ciyekî baş dîtin, kiryar û ne dijwar bûn, li Dîlman her car ew dihatin bazarên hefteyî ji her hêleke derdorêن wir, bêtir yek rojkî pir ji dûr ve, û ne kêm xwe tev li karwanêن bazarganêن nestorî û ermenî dikirin, ku ji wir ta bi Wanê, ta bi Urmîyah û Tebrîzê diçûn, hikariya “bandora” mîsyonxaneya amerîkî li gel pêşdaçûna civakî û serohatîya gelokê “gelê biçûk ê” Nestoriyan, li vir hebûye. Pişt re zaravê Şikakî bi riya şandiyeckî amerîkî ji aliyê rêsimanî û ferhengî ve, dê bite kar anîn. Ew ne pir cihê ji aliyê herêmêن bakurî ve tê peyivandin, li gor berçavkirinêن min ên, ku heta ji min hatiye min kiriye, lê tê de kêmter bêjeyên, ku ji Ermenî û Turkî hatine birin, hene bêje, ku ji devzara Celalî, Melanlî û Heyderanlî ne.

Em ji nû ve berê xwe ji sînorê bakurî yê navçeya Şikakî ve bidin bi Araratê ve, li deşta, ku di navbera Murdaçay “Firate rojhilatî” li rojava û bakur hatiye girtin û ji rojhilat ve bi xêza sînorên turkî-farisî hatiye xêz kirin, emê pêrgî êla kurdêن Heyderanlî, an jî bêtir xirabeyên wan bêن, ji ber ku wê jî ji ber fermanêن fermandariya pir ji xweybûn û hevgirtina xwe ji dest daye. Li vir şaxeke rojavayî û yeke rojhilatî ji va êla jimarpir divê ji hevdu cihê bêن nasîn.

Ji ên rojhilatî, ku çadirgehêن xwe yên zozanî di koça, ku di navbera Bendimahî, kaniyê Murad (Çemê Murda-Wergêr) û riya Bayezîdê de, vegirtine û serekê wan ê pîremêr i jêtirs Hesen Axa ye, pênc êl girêdayîne: Ajanlî, Hesenî, Adamanlî, Brukiyanî û Çekemî.

Adamanlî û Burkiyanî wek me li jor gotiye, pareke wan li gel Celalî, serbixwe ji Heyderanlî li wan deran dimînin. Hinek şaxêن Sîla'lî, mebest Sîvkanlî di bin serkohiya serekê xwe A'sim Axa de, û pişti ku teze malbateke cuda bo Sîvkanlî pêda bûye, ya ku serekê wê E'lî Tagorî Axa ye, xwe bi Tagorî navdike. Ev Elî wek rîformdarekî ye di nav Kurdan de, ew di cengê de binzabitek bû û bi neviyê Abdulmecîd re (Sultan Abdulmecîd-Wergêr) xilatkîrî vegeriya, ew cil û bergêن xwe ên fermî ji xwe datîne û bi zûkî dest bi nûkirinan dike, ji bo wê yekê ew ji serekê êlê bilindir dibe, xwetêwerkirin û dilxwesnебûn ji her terzekî li ba çêdibin, û di havîna çûyî de li dora wî 150 kon hâline jimartin. Teviya konêن li aliyê rojhilatî yê navçeya Heyderanlî dora 4000î ye, pareke Adamanlî li Diyadîn û Bayezîdê cîwar e û bi averêkirina (transporta) pertalan, bi karwanêن gayan li ser riya Erzerumê, ku diçe Tebrîzê, xwe gêro kiriye.

Saxê rojavayî yê Heyderanlî xwe li teviya bakurê zireya Wanê ta bi Firat belav kiriye. Navika navçeya wê û wargeha êla wê ya kevin, ya ku navê wê jî jê hatiye, geliyê Heyder Begê ye, ku ne dûr ji Arşîş ve dikeve nav korta Wanê. Li vir û li derdora Heyderanliyêن, ku niha jî dora 1000 konêن wan heye, cîwarin. Şaxêن vê êlê evin: Hazranlî dora 400 kon e, Sîpanlî li dor Sîpan-Daxê bi 300 kon, Malxuranlî, niha li navçeya Melazgerd pezêن xwe diçêrinin, bi 180 konan, û Zerekîlî an Zirkanlî, ku li teviya herêmê belavin û xwe li herdu layêن Firat ta bi qeza Xoy jî belav kirine. Ji bilî vê jî li hin deran di nav Heyderanliyêن rojavayî tektek cî bi cî wan Heyderanliyêن, ku ne ji pîre kurdekî wî şaxî ba, minê ewan wek Heyderanliyan nav bikirana, wî ez hokirim, ku van Heyderanliyêن li vira, tev biyanî ne û giş ji niştê xwe yê berê Diyarbekir hatine.

Nimûneya Heyderanlî dihêle, ku mera niha baş têbigihe ci di bin navên êlên koçer û êlên rûniştî de tê nasîn, aniha vê êlê bizava bi cih- û warkirina Kurdan ji aliyê fermandariya “hukûmeta” turkî ve di rewşa xwe de berçav kir. Bo vê armancê li geliyê Murdaçay ta bi Kara Derbendê, ku gundê

Kurdalîyê hîn di nexşeyê “xerîteyê” de tune ye û dikeve navbera Daghar (Li nêzîk wê jî pêşxaneya bakurtirîn a neqşen kevirî heye) û Sêdi Xan, min pêşvehatintirê wargehêن Heyderanlî ên cîwarkirî dîtin. Ev cîwarbûn tenê bo wê yekê ye, ku di zeviyan de kar bikin, ji ber giringiya êmê zivistanê, ji pêz re, lê di mehêن havînê de ewana jî wek Turkmenê cîwarbûyî li Faristanê, tenê mêt û müşk bi zozanan de bar dikin, da konêن xwe li qenterêن çiyayêن hişîn vegirin, wilo ku mera di vê saldemê de li her derekê rastî gundêن devjêberdayî tê, an jî ewêن ku tenê niştevanêن ermenî tê de li şûn mane.

Cihêbûna (Cêlaka) van ji ya koçeran tenê ew e, ku evan ne wek êl, lê belê wek civatekê hevdu girtiye, û ne her li çiya û baniya diherin û têن, ewan tenê di çêrgehêن derdora gundê xwe de digerin. Wilo li ciyê êlê civateke bajarvanî pêda bûye. Cîwargehêن kurdî li deşta Alaşgerdê di bin çavdêriyeke taybet a qaîm-meqamê Topraqkelê de ne, ewê ku bi piranî di koka xwe de Kurd e, lê dîsa jî bi zordariyeke bê sînor, ku li wan dike, xwe taze mijûl kiriye. Da di wan civatêن, ku Kurd û Ermen bi hev re dijîn, wilo ji hev cihê bibin, û gundêن tê de kêmikên neteweyî ji gund derkevin û ji xwe re gundin din lêbikin.

Wilo di teviya nihalê de carinan gundêن kurdî ne û carinan yêن ermenî ne, lê belê bi piranî niştevanêن ermenî ne, weku ev cedwela li xarê ji wan gundêن ku min di rîya xwe de dîtine, pêk tê, pêdivî jî tuneye, ez bibêjim, ku wargehêن ermenî (navçeyêن) bêtir bi çalakiya çandinî, xanedanî û paqijiya xwe, ji yêن Kurdan hêjatir dixuyin:

Dêlîbabâ	ermen.	50 mal in
Dêghar	kurd.	20 mal in
Kurdalî	ermen.	30 mal in
Sêdi Xan	ermen.	20 mal in
Xoşîyan	kurd.	15 mal in
Mizûrî	ermen.	15 mal in
Çêlgan	ermen.	20 mal in
Biçûk	kurd.	45 mal in
Karakilise	ermen.	40 mal in
Ondaşlı	ermen.	13 mal in
Kêlasor, Daşlîçay û Alîgor (Ji revokêن farisî û urisî ne)		
Üçkilise	ermen.	30 mal in
Diadîn	kurd.	72 mal in
Diadîn	ermen.	02 mal in

* (Em dibînin, ku navêن gelek êlên ermenî wek Kurdalî, Sêdi Xan, Çêlgan..kurdî ne û lew re ez dibêjim, ku niviskar bi şaşî ewan bi ser Ermeniyan ve jimartine-Wergêr)

Di teniştä Heyderanlî de, ewêن li van deran, ku bi nîvekî ji sê piştan de cîwar bûyî ne (üç baban oturmuş “Sê bavêن min li vir jiyane“ kevintirîn bîranîna kurdekî wir e), bi piranî, û bi rastî, gelek ji zû ve li vê deştê, êla Sila'lî cîwar bûye, ya ku ji aliyê malbatê ve jî ji merivêن Heyderanlî ye, lê xwe ji demekê ve ji wan cihê kiriye, ku êdî nema bi ser wan ve tê jimartin. Hemî şaxêن ku bi ser vê êlê ve tên jimartin û tev li hev di gundan de rûdinin, şes in:

Manûkanlî, Kurdikî, Sîvkanî, Heyderlî, Kazkanlî, Diyûnglî (Diunigli).

Ji xwe li vir ne asan e lêkolîna koka kurdî ya malbatan bête kirin; ji ber ku ew koka xwe ya kurdî di-

peçinin û xwe wek osmanî diyar dikan. Ji ber ku ewan dikevin berdestiya „xizmeta“ leşkerî û hemî „bê istîsna“ bi Turkî baş dizanîn, lew re ewan vê diyarkirinê, bi gelempêrî, wek rastiyê dibînin, û dibe demek nêzîk bê, ku ewan neteweyetiya xwe bi tevayî di nav êla serdest a osmanî de bipişîfînin. Ji aliyê nasdana baweriyê ve jî, wilo dikan, hinek ji ber nezanî, hinek jî ji ber xwepêçana dij bi Turkan, cihênebûna xwe ji wan tînin zimîn, bi wê şeweyê, gava ku tu ji wan dipirsî, ka ewan jî ci desteyê „mezhebê“ ne, ev bersiv bi wan xweş tê, dibêjîn: „Desteya Sultan ya me ye jî! Xwedê camêr e!“ cil û bergên gelêrî, û çekêñ Mirzax û Mirtal, ku hildigirtin, wek berê li Diyadînê kêm tê dîtin.

Di nav xwe de hîn wek berê bi zarê xwe ê Kurmancî dipeyivin, lê bi Turkan û Ermenan re ji necarî, bi zimanêñ din dipeyivin. Wilo hemî ev êl bêtir û bêtir, hinek ji wan ji ber cihêbûna ji torevaniya xwe û ji ber çolberiyê, wek Celalî û Melanî, ên din jî bi rîya cîwarkirina wan bi zorê tev li neteweyen din kirin, wek Heyderanî û Şikakî, ji dema cihêbûna ji merivên êlên xwe ve dadikevin pileyeke bindestiyê, neteweyatiya xwe ji xwe dikan, xweybûna wan ji ber tevlihevzbûna niştevanî tê talankirinê, û tiştekî ne hindik e, di vê sistema ku fermandariya turkî li hember Kurdan bi kar tîne, ne tenê merbendêñ, ku nijadan wilo bi hişkî dipişifine, lê belê ol jî di ortê de heye. Taze li vê dawiyê, herêma Hekariyan a serbest, bûye navçeyeke turkî, serekê Hekariyan, Hecî Ehmedê Başkela, hatiye hildan, bûye paşa û bandora deselatiya wî bi gelek efendiyê stanbolî yêñ pacstandinê „tehsîldariyê“ hatiye dagirtin([14]).

Bermayê wêjеваниya gelêrî û arxeyolocî, ku di nav van êlên hêla bakurtirin ji navçeyêñ serhedî yêñ Kurdistanê de hîn maye, li gor rewşa gihiştina wan a rûh'î bi tevayî tê çaverêkirin, hindik e, lê hîn bi gişkî winda ne bûye. Pirsêñ li ser navêñ stêrkan li ba wan bi piranî bê bersiv dimînin, lê belê yekî Heyderanî wilo ew navkirin:

Mêzîn: Bo Hirçê Mezin e, ku li gor Lerch ([15]) di zaravê Kurmancî de Mêzîn, wek tê berçavkirin mîna peyva Erebî û Turkî (میزان) Mîzan bi şêweya wan stêrkêñ navkirî ye.

Karandiz: Sirius e, ku gotina Lerch tîne bîra mera, gava ew dibêje, ku di zarava Zaza de Camûs Karan „Stêrkek e di zivistanê de vedibirise“ bi nav dike, nîvê duwemînê Karandiz, bi paşpirtika peyva turkî (Jildiz) re tê berhevdan, (Dibe diz ji peyva kurdî dizî û diz hatibe ne ji turkî –Wergêr) li ba Şikakan Sirius bi Çawran Kermî tê navkirin, ku di Kurmancî de nêzîkî Kawran Keran e (Lerch a.a.O.) û tê gotin, ku bi wateya „Germîbirr“ e. Di destpêka Sirius da, angò destpêka Abê, êdi germî kêmter dibe.

Pêvurk: Stêrka Orion e, ya ku wek dixuye, li ba Lerch ne hatiye rohnkirin û Pêwir hatiye navkirinê (Li Çiyayê Kurdan - Rojavayê Kurdistanê hîn ta niha weku Lerch nivisandiye „Pêwir“ wilo tê navkirin-Wergêr).

Vêñus bi Stêrka Sibê tê navkirin.

Di warê nivisandinê de divê wek histobariyeke bê berxwedârîkirin nemîne, gava rîwî dixwazin xwe bi kîlên goristanêñ kurdî mijûl bikin. Bo Kurdan, bi piranî, di çembera mal barkirina wan de, goristan hene, ku ne hindik jî di van cihêñ çalkirinê de, neqşen di kêlan de kolayî dîsa hene. Kêm caran ewan wek niviştêñ kevirî ên berê hatine jimartin, û di vê rewşê de jî, ewan bi Erebî bêtir ji Kurdî hatine nivisandinê. Lê evêñ bi Erebî jî, gava tê de nav û nijadmendiya kesê mîfi hebin, dîsa giringin bo dûroka êlan.

Du tene ji van mezelê kurdî bi ber çavên min ketin, a yekemîn di tevlêka çemê Bendîmaî bi zireya Wanê re, li qeraxê wê ê çepê, ji riya ku piştî pirê ber bi zireyê ve diçe. a din jî li nêzîk gundê Ermeniyan ê niho Çawirma (Çêwîrme) 1½ katekê „sae’tekê“ li rojavayê Xunûs e, li wê derê, ku kêla mezelê Kurdê pîrozmand Ereb Dada û gelek mezelê Kurdan hene, wek kevneşop û neqşen Arabêsk, bi çewtî hatine jimartin. Li ser kevirê - wek adetê- giş çekêن kesê çalkirî, û hin caran jî hespê wî, bi şeweylekî kolandina xav hatine neqîş kirin. Li wan herdu ciyan, kevneneqşen nivisandî jî têr dîtinê.

Destnîştê berhemêni bi zimanê kurdî, li wan derdoran, ku vê nivisandinê armanc kiriye, gelek kêm in, ji ber ku ne pirtûkxaneyên kesanî û ne jî yên ji bo gişkan vekirî li ba van êlên binveçûyî hene. Qefta destenivîşen kurdî ên civandî, ku mera dikare bibêje ew mezin e li gor rewşen heyî, û min li ba Jaba Consulê rûsî li Erzerûmê dîtiye, hema hema bi giştî ji navenda Kurdistanê ne. Lê belê kurdeki xwende, pêşnimêjê (îmamê) gundê Muzûrî (Li jor binêre), ku navê wî Mulla „Mela“ Mehmed e, ji min re gotiye; melayekî Bayezîdê, Ehmed Efendî Xon „Xanî?“, gelek bi zimanê kurdî ravekirinên „tefsîrîn“ Quranê, pirtûk û dersên kurdî bo ciwanan, ji wan jî helbestek bi sernavê „Nuvar – Nûbihar“ bi metnên erebî, turki û kurdî nivisandise. Ew di dema jiyana (Mehmed) de li Bayezîdê miriye, kêla mezelê, li gel dema mirina wî jî ew dizane.

Wî Mehmedî jî Muxteserî Şarîe’t hebû, berhevoka zagona musilmanî – wek dixuye-, ji bo ku di navçenine kurdî de, ji bo bikaranîna rojane, hatiye nivisandin. Ew wek tiştekî hîç naye bawerkirin dixuya, ne jî dihat bi dest xistin, û ne jî wî dixwast wê berhemê bifiroşe. Ew dora sed û pêncî pelikên Folio bû bi şeweniviseke nûjen bû, pêşî û paşî ji hev ketibûn.

Tersî vê yekê, van êlên binvebûyî bi xwe di stran û kilaman de zengîn in. Ne tenê ew di barkirin û koçerêyan de, di berqefen zinarî de rûniştîne, wan şerbêjokên xwe ên kin û asê dihêlin deng lê bêñ vedan, di nav Kurdên cîwarbûyî de jî, yên ku mera li wan deştan dibîne, û hinek ji wan jî bi êvarê mîrêñ gund li dora xwe dicivînin û bi stranê xwe pesindariya mîrxasên cengewer distirê.

Wilô Çetoyê Heyderanî, rûniştvanekî gundê Kurdalî qefteka ji 20 stranê cûrecûre dizane, û Omer Axa, kurê Hesen, li Diyadînê dibêje, ku ew 40 stranan dizane. Wî bê rawestan stra û dengê xwe, di her kilamekê de, wilô diguhart, carina siviktir, carina bi meqamekî girantir, carina bilind û hin caran jî bi hûrbêjeyî, û herdem jî bi rûlivkên jîndar, ku li gel strana xwe diyar dikirin, bê ku mera têbigîhe metnên stranê jî, ku wî bi zanayî û xîşûşî distira. Pir bi dilmendî wî du kilam stran, ku li ser dilbera wî an avîna yekî din bû: yek li ser Ermeniyeke bedew, ya ku ji Karakilîsê bû, kurdekî carekê bi dest xwe xisti bû û ji ber hezkirina xwe ji wî re amade bû bibe Muhemedî (Musilman-Wergêr). Lê belê keşeyan xwe xistin wê têkiliyê û hêştin, ku biçe leşkeriyê; a din jî, wî ji min re malik bi malik wergerand Turkî, weku ez li vir, di dawiya van berçavkirinên xwe de, belav dikim.

(Me strana bi Almanî nivisandî, ji nû ve wergerandiye Kurdî-Wergêr)

Tu xweşikî wek ro û hîvê

Tu keşa delaltirî li Diyadînê

Kesa, dilbera min!

Tu gustîlka xwe bide min

Min jî desmaleke sipî daye te

Kesa, dilbera min!
Guîlka sipî di tiliya min de ye
Desmala sipî li ser serê te ye
Kesa, dilbera min!
Pereyên min nînin
Hespê min biçûk e, qimeya min biçûk e
Kesa, dilbera min!
Birayê te rê nade min
Pismamê te nahêle tu bê ba min
Kesa, dilbera min!
Raste, ezê te birevînim bibim çiyê
Ezê dîsa vejerim jîna koçeriyê
Kesa, dilbera min!

Bonn, 23.03.2002

- [1]) Yezîdî Kurdin (Wergêr)
- [2]) Wagner, Reise nach Persien II, S. 232
- [3]) Celal ne navê Ermeniyan e (Wergêr).
- [4]) Navê pirtûkê di pêşgotinê de wilo hatiye: Kîtab Xerabet ûnîsab, û fehresta wê, ku di pêşiyê de tersî wê bi tevayî şêweyekî din e: Kîtab Xerayêb ûnîsab Bustan Siyah e. Ew bi zarê Farisî ye û hêj nû ye.
- [5]) Li gor Lerch (Mel. Asiat. II r. 642) Dumblî jî niha (sedsala 19ê) li bakurê Palo dijîn.
- [6]) Wilo dixuye, ku ji Jêr-Koprû, ji “pira erdê” hatiye, ji ber ku bêjeya Turkî li ba Ermeniyan her weku koprû, kirpî û tiştên wilo tê guhartin.. (Lê belê Jêr-Koprû bi Wateya pira jêrîn e, ne pira erdê ye – Cankurd)
- [7]) Wagner a. a.O.II, Rûpel 231û 311
- [8]) Ji aliyê êtmymologî ve ev bo hemî êlén koçer bi kar tê (Binêre Lerch in Mél. Asiat III, Rûpel 632) Lê ew dibîne, ku nav sînorkirî tê gotin, ne wek ew di rastiyê de belave. Wilo navê Kara Çadir (Reşmal-Wergêr) bo êlén Kurdan tê gotin, ci cîwar bûyî û ci koçer bin, û li ba Kurdan hemî mal (kon) reşin. Konên sipî min tenê carekê dîtin, li ba êleke ne kurd ya li nêzîka Erivanê bû. Turkmen jî di hin rewşan de bi Kara Çadir tê navkirinê. (Di vê binxêzikê de niviskar gotina çer wek bêjeyeke turkî dibîne-wergêr)
- [9]) Fraser, Travel. In Koordistan. Rûpel 102. Rastenavê Bilbos, ku Fraser aniye, hinek din Bulbasî dînivisin, eve jî li gorî Nîmetullah Mscr. Bilbas e. Di dema wî de ev êl dora 20.000 xane bû. (قرب بیست هزار خانه)
- [10]) Silavdana Kurdan a adetî (Selam Eleykum) e, ku bi (Selam Eleykum) tê bersivdan.
- [11]) Navê rastir ji Urumiyah Urmî ye, ji ber ku ew şêwe lib a geografên ermenî ji heye (Care yekem, hîn di sedsala 8ê de, Ghevond li ba Şah Nazarian- Histoire des guerres des Arbaes, en Arménie, rûpel 129) û li ba xelkê wirê jî, tenê zarê niviskî li ba hokiriyan, li ba Ereban û Farisan şêweya mîzayî Ur
- [12]) Min di hinek nexşeyan de Cergewer li ciyê Tergewer dîtiye, lê ew şae çapê ye.
- [13]) Ev çemê, ku bi ser herêma Tigris (Dîcle-Wergêr) ve ye, tenê li ba Morier Voyage en perse, II, p. 109 yê çapa fransî de jî dibînim.
- [14]) Ji eyaleta wî yê Pacê jê distîne: Başkela, Zirnik-Maaden, Çolamerk, Lêwî, Dijar, Tuçub, Gever, Çîrwate, Çel, Orgamar, Bajêrkê, Xanig û Kotur
- [15]) a, a, O. S. 633

Di Danîna Rênívîsê de (Pevvekirin û Cudakirin)

BERZO M e h m û d

Rênívîsa ziman sîstimeke ligor destûrên ziman-vanîyê rîbaza xwe digirê, ku nivîsina bêje û peyvan bi hemî rengên xwe ve şêwe û awayekî taybet werdigirê.

Lewre, bêje, çi ji aliyê danîn û ronanê ve bê, û çi ji aliyê ristesaziyê ve bê, pêwîstî bi lêkolşenke zimanvanî heye, bo werê xuyakirin ka çawa ev bêje, cuda yan jî pabend, bête nivîsîn.

Di zimanê kurdi de, wa heye ku bêjeyek (morfêmek) bi çend erkên têvel rabê : çi weku peyveke asayı û çi weku gîrek, nemaze, pêşgir û paşgir. Pêwîste em bikarin wê cudabûnê navbera peyv û nepeyvê (gîrekê = affix) de nas bikin, jîbo ku danîna rênivîsê liser bingeha yasayên rêzimanî bête avakirin .

Di Ingilîzî de (gîrek) wek (affix) tê nasîn û weha tê şîrove kirin:

1- (An **affix** is a **bound morpheme** that is joined before, after, or within a **root** or **stem**.) Anglo gîrek morfêmekî pabende bi pêş yan bi paş yan di nav reg û qedê peyvê ve tê nivîsîn.

2- Peyv heye morfêmek bê, û heye çend morfêm bê, belê gîrek her morfêmek bi tenêye, wek:

huner + mend + î = hunermendî
(peyv + paşgir1+ paşgir2)

Herdû paşgirê (-mend) û (-î) gîrekin, lewre bi awayê pabendî têne nivîsîn.

2- Peyv bi tena xwe dikarê gîrekê wergirê, û

peyveke nû avabikê, bo nimûne, peyva (bext) nave û peyveke serbixweye, dikarê paşgira (-wer) werbigirê û peyveke nû drust bikê, ku ew jî (bextewer)e ya ku hevalnave. Belê gîrek, çi pêşgir û çi paşgir, bi tena xwe, ji nifşê xwe, ango gîrek wernagirê, wek em bêjin paşgira (-ewer) nikarê tu pêşgiran yan jî paşgiran werbigirê jiber ku bêjeyeke netewawe û morfêmekê pabende. Lî eger gîrek ne bi tena xwe bû, ango ligel peyvekê hevalbend diyar bû, hinganê, dikarê gîrekine dîtir wergirê, wek çawa gîreka (-mend) ya ku ligel (hunermed) hatiye dikarê gîreka (-î) wergirê, ku dibê: huner + **mend** + **î** = huner**mendî**

Lî hin bêje (morfêm) hene, hem weku gîrek bikar têن û hem jî weku peyveke serbixwe rola xwe di firêzê û ristê de dibînin. Lewre, eger bêje weku peyv bikar hat bi şêweyekî serbixwe tê nivîsîn, lî eger weku gîrekê, çi pêşgir bê û çi paşgir bê, çi nîşane bê diyar bû, wê bi şêweyekî pabend bê nivîsandin.

Niha emê çend nimûne ji bêjeyênil wiyo bidin xuyanîkirin, pêwîste em wê yekê jî bêjin ku pi-raniya van bêjeyan ji nifşê berê peyvîn erkdarîn (functional words, syntactical morphemes) ango ew peyvîn ku rola xwe di avakirina ristê û firêzêde dibînin, û ewênu ku bi şêweyekî serbixwe têne nivîsandin, wek :

- 1- Azad **û** Serbest çûn malê
- 2- Ez **bi** tirêne çûme Bexdê
- 3- Hedana min **bê** te nayê
- 4- Em bi **hev** dizanin
- 5- **Ne** te ez dîtim û **ne** min tu dîti

1- Morfêma (û)

A) morfêm (û) weku navbend (interfix) du peyvên serbixwe bi hevre gîrê didê, û peyveke lêkdayî durst dikê, wek :

ser + û + pê = serûpê
qaf + û + qot = qafûqot

B) morfêma (û) weku peyv jî dikarê nav berê emrazen kunçenşin (conjunction)
أدوات العطف de wek peyveke serbixwe cih bigirê, lewre divê serbixwe jê bê nivîsin :
Ez û wî hatin ba te

2- Morfêma (bi)

A) ev morfêm weku peyv bi emrazê pêwendî radibê (prépozêşin, prepositim), û serbixwe tê nivîsin, wek :

- 1- Ez nikarim **bi** lingê xwe werim ba te.
- 2- **Bi** navê xudayê mezin û gewre.
- 3- Hin tişt **bi** darê zorê çêdibin.

B) lê weku gîrek bi erkê (pêşgir) radibê, lewre bi peyva pêş xwe ve, wek kertêن pabend tê nivîsandin, wek :

- 1- Ev xort **bizirave**
- 2- Min xortekî **biserûber** divê
- 3- Ev keçik **bidil** e (bizimane ...)
- 4- Ev mirov baqil e (bi-aqil)

3- Morfêm (bê)

Ev bêje wek (bi), hem prépozêşine û hem jî pêşgire, ligor pergala ku têde diyar dibê. Nimûneyên vê jî evin:

A) wek prépozêşin tevda tê nivîsandin :

- 1- Ez **bê** te nikarim bijîm.
- 2- **Bê** vê yekê kar naçê serî.

B) weku pêşgir

- 1- Ev xort çiqas bê zirav e
- 2- Bê karî çiqas nexweş e
- 3- Ev xort hem bê zar e û hem bê pîrgal e

4- Morfêma (ne)

Ev bêje bi erkekî sêlayenî radibê :

A) Wek emrazê pêbestin (conjunctian)
أدوات الاعطف

- Ez **ne** vê dikim û **ne** wê dikim.
- filanches **ne** ciye û **ne** ware.
- **ne** Azad dikarî werê, **ne** jî ez.
- Heso ne li tembûrê didê û ne distirê.
- **Ne** gerim li me tê û **ne** sar li me tê.

B) weku gîrek, bi erkê nîşaneyâ nerêni radibê, û pabend tê nivîsandin :
Min ev peyv **ne** gotiye
Vê avê venexwe
Vê xwarinê **nexwe**

C) wek pêşgir

- Rengê te wek yê **nexweşa** ye
- Navê kurê min **nebez** e (**ne** + bez)
- Rastî û **nerastî** jî hev cudane

D) Morfêma (ne) (na) (no)

Weku peyvên serbixwe, di bersiva nerê de bikar tê, bi wataya (no) ya inglîzî û (kella)ya Erebî, wek :

Pirs : Gelo Azad li mal e?

Bersiv : **Ne**,

yan **No**,

yan **Nexêr**, **ne** li mal e.

Pirs : ma tu **naçî** malê?

Bersiv : **Na**, ez **naçim**.

5- Morfêma (na)

A) weku nîşane : Ez vê yekê nabêjim

B) weku pêşgir bi ewan erkê (ne) radibê.

Û ew morfêm pirtir di zarê soranî de diyare

C) weku peyveke serbixwe di despêka bersiva nerê de bi kar tê û me ev jî li pereyî rafa berti de da xuyanîkirin.

6- Morfêma (hev)

A) weku peyv (hev) cênav e

- Me gelek tişt ji **hev** re gotin
- Bi **hev** re herin gund

B) weku pêşgir

- Serokê partiya **hevgirtina** gel li Parîsê ye.
- **Hevkarî** tiştekî baş e.

Têbînî

1- Morfêmên wek (pê, tê, lê, jê)

Ji alîkî ve weku pêşgir bi kar têن, û ji alîkî din ve weku peyv bi kar têن. Eva han ji lêkolîneke berfere jêre divê, bi hêvîme ku di derfeteke dîtir de li ser vê mijarê xwe rawestênim.

2- Pêwîste em bêjeyêن hevdengî ji hev cuda bikin û wan tevlî hev nekin yan ji eger rênivîs têde şaş newê, lê şaşî wê bikevê warê wata de, wek :

A) Morfêma (dar) ku peyveke watedar e, serbixwe ye û dikarê xwe di nav hûnandina peyvîn lêkdayî û dirîştî de ji bibînê, wek :

1- **Dara** me îsal bergîr e.

2- Ji **dara** tuwê re, dartû dibêjin.

3- Ev spîndar çiqas bilind bûne.

Di risteya sêyem de bêjeya (dar) di (spîndar) de her ew peyva dara pêşîye. Her ev dar ji cudaye ji dara peyvîn wek (maldar) û (navdar) û (dildar) yên ku paşgirin û hîç pêwendî navbera herdu (dar) an de nîne, tenê hevdengî ye.

3- Morfêma (e)

Morfêma (e) ku pir nazik û sivik e, bi çend erkên hemelayen radibê, ew ji evin:

A) Paşmaya karê êsta ya (bûn)ê ye, wek :
Sînem keçke pir delal e

B) wek paşgir :
Rist + e = riste
Dest + e = deste

C) wek navbend (interfix):
Hêk + e + rûn = hêkerûn
Pîr + e + mîrd = Pîremîrd
Reş + e + ba = reşeba

* * *

Jina Kurdistan

+

+

Dewlet Eli 22-5-2000

Berî her tişti min divêt diyar bikem ku Dirûk ew tişte ewê
diqewmît û dihête nivîsîn û tarîx bo dihête da-nan lê mixabin milletê me ku ji ber bindestî û tepe-seriya xwe û herwesa ji xemsariya me ji ber ku me her dem bi xemsarî ve wergirtiye ku em dîrûka xwe binivîsîn, lewra gelek ji wan tiştan ewêt bi serê miletê me hatîn û serborêt bi serda borîn hatine jibîrkirin ji ber ku ew tişt bi rêka gotinê dihatine vegohaztin û nifşekî bo nifşekî vedgêra ji ber vê çendê jî gelek ji qewmînêt giring yêt berzeboyn ji ber ku ew kesêt di wê serdemê de, an jî ew kesêt bo hatiye vegêran yêt mirîn û ew dîrûk jî ya digel da mirî.

Helbet jina kurd êke ji milletê kurd lewra ew jî ya bê bar nebûye ji vê bextreşiyê ji ber hindê jî min viya ez ev roke vî dergehî biqotim belkî bikarim biçme jor û tîrojkekê berdeme ser hin rîzikan ji dîrûkeke dirêj û bihagiran..belê pa mixabin hemî nehatiye nivîsîn

Ji mîj de jina kurd roleke giring û taybet di dîrûka milletê xwe de hebûye û di hemî waran de. Ev jin ne ji zelamî kêmter bûye her ji despêka jiyanâ mirovatiyê ya sade û heta digehîte roja ev ro ya tim bi reşenbîriyê û teknolojiyê û teknikê ve girêdayî. Her wesa me hind fexir bese ku gelek ji dîrûknivê û nivîsevanêt biyanî bi rengekî gelek ciwan behsê jina kurd kirye, rîz û qedir û bi-

hayekî giran yê dayê. Mînoriskî di kitêba xwe de elekrad mulahezat intibaat dibêjît: Jina kurd ne ya veşartîye, di gel zelaman li dîwanxanan dirwiñît bi

hemî biwerî ve, bêy ku rengê şermê li ser xwe diyar biket, pişikdaryê di danustandinê de diket. Son dibêjît: gelek caran wesa çêbûye ku jina kurd pêşwaziya min ya di mala xwe de kirî bêy ku malxoyê wê li malê bît, digel min rodinişt û danûstandin di gel min de dikir bêy ku şermeka direwên an fêlbazyekê li ser xwe diyar biket wek jinkêt tirk û farisan, xarin û vexarin bo min diîna û dema ku malxoyê wê vedigerya, wek rîzgirtin bo min; ez ne dihêlam heta ku zelamê wê dewara xwe girêdida û bi jordiket. Ji bilî ku ew daykeke dilovan bûye û rola peydabûn û xudankirin û perwerdekirina zarokan li ser milên wê bûye, ji bilî vê çendê, ew xwedî kesatiyekê pirhêz û vejen jî bûye, her dem milê xwe daye milê zelamî û karekî giring kirîye,

çi bermalî ba li ber malê yan jî mazîçin ba li çiya, yan bêrîvan ba li ber bêrê, yan jî milê wê bi milê zelamî ve ba li zeviyê, û her karekî dî yê vê jiyanâ xwerist û sade di wê demê de. Em dişeyn bêjîn ku ev renge kar tiştekî normal bû li cem her jinekê di civaka kurdî de, lê pa zêdebarî vê çendê û herweku me gelek caran ji dayik û bab û kalên xwe bihîstî ku gelek jinan roleke ramyari û rêveberî hebû û gelek ji wan pêçebûnêt welê hebûn ku xelkê wan

destê helbijartinê dirêjketê û hevberî wê çendê bûn, ku civakê baweriyeke mezin pê hebît û wek rîveber bo xwe danît; her çende hijmareke mezin ji aqil û aqildar û maqwîl û xwedî kesatiyên mezin hebûn, lê pa gelek caran jin hatiye helbijartin ku bibîte serok eşîret û cihê berpirsiyê bît bo arêşe û

xweşî û nexweşî û êş û janêt civaka xwe; ev ji işaretên hindê ne ku ji kevin de milletê me rîz ji bo jinê girtiye û bihayekî mezin dayê û wek herkesekî ka ci ji bo hebûye û ci li ser heye (anko hiqûq û wacibat), li cem civaka xwe weke herkesekî danaye û cihê baweriye bûye.

Gelek jinan di warê hunerî da rola xwe diyar kirine, û her weku em dizanîn ku gelek reng û ta ji hunerî dipeşin, ji wana, jina kurd di tevn û teşî û nexş û nîgaran da dest zêrîn bûye, eger em bi çavekê hunerî lê binêrîn, anku ya dirustir ew e ku me lê nêrîba, da bînîn ku her maleke kurd entîkxaneyeke pir e ji ciwantîrîn entîkîn biha giran, yên ku bi tabluyêن ciwan û bi destê jina kurd hatîne nexşandin, ci Mehfireke(Rayêxek) raêexistinê bît, yan ji şemilkeke dîwarî, yan ji ya nivêjê, ci çandikek ji çandikêن renge reng, yên ku sivan û bêriyan pêdvîyên xwe dikirne têde, dema diçûne ber bêrê..ci werîsekî ciwan bo girêdana baran, yan kortanekî xemlandî bi ciwantîrîn gopkêن heme reng, ci çûx û êlek û êşlek û doxîn û saq û kalk û gorêن zelaman, yan ji qutkêن jin û kiçen ciwan.. û gelek nimonêن din ji vî karê hunerî ê ciwan û rîk û pêk, yê ku heta roja ev ro gelek malan nimone ji van tiştan helgirtîne, wek keleporekî biha giran..

Her wesa xweristiya milletê me û xweşîya wî, av û aqar, çiya û kanî û dar û barêن wî meydaneke ber fireh û xweş bûye ku xelkê me bikarin hest û dilînî û evîna xwe bi awazêن ciwan û bi dengêkî zelal berden û ev denge li tev çiya û zuzanan belav bibît. Û eve ye bo egera hindê ku gelek eger nebêjîn tev jinên kurd hunermend û deng xweş bûye. Lê pa hinekan ji wan delîve bo helkeftiye ku hunera xwe bi pêş ve bibin û belav biken, mîna deng xweşa nemir (Mirym Xan)ê, ya ku bi diristî tête danan wek xandingeha stirana kurdî. Eger delîvîn baş bo helkeftiyan da dengê wê li tev cîhanê belav bît û deng

vedet. Her wesa Nesrîn şêrwan û Gulbihar, yên ku dengê wan mîna swîlaveke tezî li ser çiyayêن Kurdistanâ ciwan tate xwarê û dilen evîndarêن vî warî hwîn dikirin, belê cihê daxê ye ku delîvîn wan ji di ber teng bûn, ne li

dîwîf bihayê dengê wan bûn. Û her weku bo me hemyan xweya dike ku dema dengê zelal û nazik yê Gulistanê bilind dibû û dengê Şivan Perwer himbêz dikir, bihizaran dilen dilsûz bo evîna milletî di helyan û rondikêن xwînê jê dirijyan.. gelek gencên me, werîsê azadiyê li gerdena wan aliyaye û giyanê xwe kiriy gorî ji egera hindê ku guhê xwe didan vî dengî, ev dengê şuôreşgêri, yê ku qedexe bû, her dem bo demeke dî, malen kurdan ji layê dijminî ve dihatine kontirûl kîrin û eger kasêteke wan peyda biba, mana wê ew bû, ku ew mal dihate vebirandin..lê pa evîna welatî dabû ser hemî tirs û sehîn û qumçalk û bindavêن xaniya bibûn wargeha guhêxwedana vî dengî. Bi rastî şoressêke mezin bû, evîna milletî di hemî dilan de peqand, mîna volkanike dijwar, hemî rex û dorêن xwe paqîj kir ji hîzr û bîrêt paşmayî yên dijminî, êkser peyvîn wan xwe li dilê hemî genc û lawan dida, ji ber ku ew ji evîna dilê hemî kurdan distîn.

Evca ma ne cihê şanaziyê ye ku ev jina nazik karîbît şoressêke hosa mezin bipeqinît?!

Her wesa gelek jinên kurd û wek bab û kalêن me ji me re vegêrayne, şoress boyne eger şer, mil bi milê zelamî ve şer kirine, mîna (Zêrina Amêdî) û gelekên din...û gelekan ji wana mergê xwe gorî milletê xwe kirine û bi destê dijminî hatîne telaftin. Lê pa navê xwe ê pîrûz di dilê milletî da nivîsîne û heta heta.

Bila ji hizra me neçît ku di tûre û edeba kurdî de, yê ku ew ji rengegî hunera wicdanî ye, jina kurd jê bê bar nebûye û bê bar nîne..ji kevin de jina kurd û bi fitra xwe kariye bi hizarehan stiran û awazan vehînît û li dawet û şahî û şeverûk û taziya û ber bêrê bibêjît, û ev ro rewşenbîra me qelema xwe helgirtiye û ew hunera devokî ya dayik û dapîrêن xwe li ser berperê darêtiye û kiriye hunereke tureyî ya nivîskî..û rîka wan dayika berdewam kiriye û gelek jinên kurd ev ro berhemên çapkirî hene mîna şere jineke wek (Rewşen Bedirxan)ê û gelekên din.

Jina kurd di wextê xwe de nojdarî kiriye ,me bîhistiye ku gelek jinan ev
 kar kirine û gelek êş çareser kirîne bi hînek dermanên xweristî, ji giya tatine çêkirin, û em dizanîn ku ciyayêن Kurdistanê cihê van giya ye,mina Tolkê,Giyabendê,Beybînik,Kulindokê,Dêwkanê,Pwîngê,Golîra û bi hizaran rengê din,
 herwesa hingvîn û reşreşik û kuncî û Zeyt û donê tehînê bo gelek êşan bikar di ïnan. Jinê kurd nişter dikirin û birîn sax dikirin û gelek êş nojdar dikirin mîna: hwînik û ba û nafik û serdil û gelek êşen din, mesaca leşî bi Zeytê dikir û evrûke nevyêن wê rêka wê bi rengekî Zanyarî û Teknolojî berdewam diken û her weku em dibînîn nojdarêن me yên
 nişterên mezin diken û baweriyeke pir mezin bi xudê û xwe heyin ku dê jiyanekî nwî dene nexweşê xwe.

Jina kurd ya li xandingehê mîna şemalkekê

dihelyêt û nifşekî bo yekî dî fêrdiket û bo paşerojeke ges berhev û perwerde diket..ya li kargehê, hêz û vejenêن wê, ne ji yên zelamî kêmîtirin..her wesa bilind bûye ser depê şanoyê wek Ekter êş û jan û doza milletê xwe bo xelkî vedgêrit, hunermendeke zîrek e, bi tabloyêن xwe azarêن milletê xwe didete ber çav û niyasîn, endazyareke hêja ye, milletê xwe bilind û ava diket û bi hemi bawerî û berpîrsî ve milê xwe daye milê zelamê kurd û ev ro di Perlemanê de û di hikûmetê de endam û wezîr e û eve ji bê guman nîşanêت hindê ne ku şîyanêت wê ne di kêmin û dikarît di her astekî de xebatê biket û serkeftinê bidest ve bînîت..û eve ji cihê şanaziyê ye bo her jineke kurd û pêdviye ku her ya berdewam bît û pêş ve biçit û bo hemî cîhanê diyar biket ku jin bi nazikî û dilovaniya xwe xwedî hêzeke pir mezine, eger ev hêz bihête bikarînan dê verêjêt mezin û pîr biha jê derkevin.

* * *

Kurterexneşek li Cegerxwîn Kurterexneşek li Cegerxwîn Kurterexn
eşek li Cegerxwîn **Kurterexneşek li Cegerxwîn** Kurterexneşek li
Cegerxwîn Kurterexneşek li Cegerxwîn Kurterexneşek li Cegerx-
wîn Kurterexneşek li Cegerxwîn Kurterexneşek li Cegerxwîn Kurter-
exneşek li Cegerxwîn Kurterexneşek li Cegerxwîn Kurterexneşek
li Cegerxwîn **Lokman Polat** Cegerxwîn Kurterexneşek li Cegerxwîn

Ji nav kurdan gelek hunermend, filozof, helbestvan û mirovên zanyar ên mezin derketine. Cigerxwîn helbestvanekî mezin e ku ji nav gelê kurd derketiye. Helbestvaniya Cigerxwîn ji yên gelek 'şâfrêñ gelên din cûdatir bû. Helbestvaniya Cigerxwîn hem xwedanê qareqtera - kesaniya- netewî û hem jî ya naynetewî bû. Ew helbestvanekî kurd ê netewî û helbestvanê gelên bindest bû.

Jiyana Cigerxwîn di nav têkôşînê de derbas bû. Navê wî ê rastîn Şêxmûs e. Di sala 1903ê de, li gundê Hasarê ji dayik bûye. Ew kurê malbateke feqîr bû. Cigerxwîn hêj biçûk bû, diya wî wefat kir. Ew sêwî ma. Cigerxwîn di nav zehmetiyêñ dijwar de mezin bû. şivanî kir. Di medreseyêñ olî de feqîtî kir. Ew xwendin û nivîsandinê di medreseyan de fêr bû. Cigerxwîn wexta ku 27 salî bû zewicî. Salek paşê jî di mizgeftan de dest bi karê îmamîtyê kir e. Piştî têkçûna serhildana Şêx Seîdê nemir, Ciger-

xwîn ji Kurdistana Bakûr koç kir û çû Kurdistana Başûrê rojava. Ew di navça Qamişloyê de bi cih û war bû.

Cigerxwîn di sala 1958an de çû Iraqê. Li Üniversiteya -zankoya- Baxdayê dest bi mamostekariya dersên zimanê kurdî kir. Cigerxwîn li wir 5 salan ma. Di sala 1962ê de ji Iraqê vegerîya Sûriyê. Di salên 1970yî de çû Lubnanê û li Lubnanê bi cih û war bû. Di sala 1979an de jî çû Swêdê. Hetanî sala 1984an li Swêdê jîyana xwe domand. Di sala 1984an de li Swêdê wefat kir. Kurdên welatparêz, yên li Swêdê û malbata wî termê wî birin di Kurdistana başûrê biçûk de - di Qamişloyê de- veşartin. Zarokên Cigerxwîn 7 kes in, ji wan 2 kur û 5 keç in.

Cigerxwîn di dema xwe ya feqetiyê de dest bi xwendina berhemên 'şâfrêñ klasîkî ên kurd kir. Berhemên edebî ên klasîkî li ser Cigerxwîn tesîreke mezin kirin. Cigerxwîn di bin tesîra Ahmedê

Xanî, Feqîyê Teyran û Melayê Cizîrî de ma. Cigerxwîn wexta ku 20 salî bû, dest bi nivîsîna helbestên kurdî kiriye. Helbestên wî li dijî zordarîyê, kedx-warîyê, zilm û tehdayê bûn. Helbestên wî li dijî feodalîyê, paşverûtîyê û dagirkarîyê bûn. Helbestên wî, helbestên têkoşerîyê ne.

Cigerxwîn bi berhemên xwe ên nemir, bi helbestên xwe ji çand û edebîyata kurdî re xizmetin gelek hêja kîrin. Wî bi helbestên xwe hêvî û daxwaza gelê kurd anî zimên. Wî di nav helbestên xwe de her tim doza netewa kurd derdixiste pêş. Cigerxwîn bi berhemên xwe riya aza-dîya gel nîşan da.

Min ev nivîs li jorê çend sal berê nivîsî bû û di pirtûka xwe a bi navê “Kovarên Kurdên Kurdistana Suriyê” de wêşandi bû. Dema min ev nivîs nivîsî û weşand, hêj bîranînên Cigerxwîn wek pirtûk der neketi bû û min ne xwendi bû. Pîşti ku bîranînên wî derketin (binêrin Cigerxwîn -Jînenîgariya Min - Weşanên Apec)û min xwend, ez gelek aciz bûm. Di bîranînên wî de gelek tiştên ne rast hebûn. Nirxandina wî ya li ser serîhildana şêx Seîdê nemir tewîş bû û ji rastiyê dûr bû. Wî bi şêweyekî hîsî şîroveyeke wişa kiribû ku, li hemberê serîhildanê û serok û birêvebirêن serîhildanê ne-heqiyek mezin kiribû. Ji neheqiyê jî wêdetir, wî li wan heqaret kiri bû, wan nezan û paşverû dabûn nîşandan.

Ez ji pirtûka wî a bîranînan çend hevok bê ku şîrove bikim, li jêr dinivîsim. Şîrovekirina van gotinê wî li teqdîra xwendevanan dihêlim. Cigerxwîn weha dibêje :

”Kurdên hindirû dixwestin ji zor û setema peyayêñ şorişê xelas bin. Qîma xwe bi cendirmê dijmin tanîn.” Rûpel - 148

”...peyayêñ şorişê ko goya ji ber dijminê miletê kurd derketi bûn, gelek talan, zor û setem li kurdên bindestê dijmin dikirin.” Rûpel - 148

”Turkên dijminê Kurd, Kurdên bindis-tên xwe ji zor û setema peyayêñ şorişê diparastin. Lê Kurdên derketî, li şûna ko mal û namûsa miletê xwe ji destê dijmin biparêzin, jînên wan direvandin û malên wan talan dikirin.” Rûpel - 148

”Haco Axa, Mihemed Begê Cemîl Paşa, Emînê Ehmed û hemû mezinên kurd ko hatibûn nav Kurdistana Sûriya, dicûn Ser Xetê û talanê kurdên bindest û bêçek direvandin. Heta jînên wan, ji xwe re tanîn...” Rûpel - 150

”Hevsarê rêzanî û rêberiya miletê kurd di destê qata jor de bû. Di destê derebeg, dewlemend, xwedî gund û kevneperestan de bû.” Rûpel - 143

”Xalid Begê Cibrî, herwekû dibêjin rêber û serekê tevgera miletê kurd bû.

Lê çawa tê xuyakirin mirovekî olperest û nezan bû. Dibêjin, Kemal Paşa û jina xwe Latîfe Xanim çûne mala wî ko bi hev re li ser şerpezekirina welêt bipeyivin. Latîfe Xanim destê xwe dirêj kiriye destê Xalid Begê ko bi germî bi-hejêne. Lê Xalid Beg, destê xwe bi paş ve kişandiye û gotiye : "Qusure baxme (bibuhure) ez bi destnimêj im." Rûpel – 143

" Herwekû dibêjin Latîfe Xanim, ji Kemal Paşa re got : " Tiştek ji mirovên weke vî bi pâşdemayî dernakeve. Ev mirovê kevnepерest û nezan, nikarî karekî hêja ji welatê xwe re bike." Rûpel – 143

Di derbarê serîhildana Şêx Seîd de nivîs û pirtûkên Kemal Burkay û Murad Ciwan hene. Tiştên ku wan nivîsîne û tiştên ku Cigerxwîn di bîranînên xwe de dibêje, zidê hev in. Cigerxwîn weke Kemal Burkay û Murad Ciwan lêkolînvan û dîrokzan nîn e û li gor bîr û baweriya min, di derbarê serîhildana Şêx Seîd de Kemal Burkay û Murad Ciwan tiştên rast nivîsîne û Cigerxwîn tiştên ısaş nivîsîne. Serokê serîhildana Şêx Seîd ê esasî Xalid Begê cibrî bû. Xalid Beg damezrevanê rêzxistina Azadiya Kurdistanê bû. Ji xwe yê ku serîhildanê organîze dikir, rêxistina Azadî bû. Ji bo ku Xalid Begê Cibrî zû hate girtin û di cî de hate dardekirin, êdî ji mecbûriyê Şêx Seîd serokatiya serîhildanê da ser milê xwe. Xalid Begê Cibrî weke ku Cigerxwîn dibêje mirovekî nezan nebû. Ew

di Ordiya Osmaniyan de Mîralay bû û mirovekî zana û kurdekî welatparêz bû. Wî li Kurdistanâ bakur rêxistina yekem pêk anî û ji bo azadîyê , kurdan bi rêxistin kir û serîhildan organîze kir û ji bo doza kurd û Kurdistanê canê xwe kire qurban. Ji bo şexsiyetekî weha, gotinê Cigerxwîn ji bo şexsiyeta wî bi xwe nebaş e. Mirov li ber dikeve ku, şexsiyetekî wekî Cigerxwîn çawa van gotinan di derbarê Xalid Begê Cibrî û serîhildana Şêx Seîd nemir de gotiye.

Dîtinê Cigerxwîn yên derbarê serîhildana Şêx Seîd nemir de hesabê çepêñ tirkan tê ku loma hema di cî de wêşanxaneya ku berê ji wan re "Halkin Kurtuluşu" digotin û ji alî partî û rêxistinê kurdan ve jî ew weke "Maoci" û "sosyal şoven" dihatin binav kirin, di cî de bi tirkî hate wergerandin û li Stenbolê bîranînên Cigerxwîn ji alî vê wêşanxanê ve bi tirkî hate weşandin. Wê wêşanxanê pirtûkeke weha qalind û çapa wê bi mesref, çima wergerand û wêşand? Wan ji bo dîtinê Cigerxwîn -ku li gorî wan rast û gorî kurdan şâş in- wêşandin. Di dîtinê Cigerxwîn de objektîfî tune û tu ciheke rast ku ji alî kurdekî welatparêz û xwedî Zanîna dîrokî be, bê parastin tune. Lê, ji bo çepêñ tirk ên sosyal şoven ew dîtin rast in. Cigerxwîn di bîranînên xwe de bi kurdî rûn li nanê sosyal, şoven û kermalîstan dike, wan bi heq û serhildêren kurd neheq der dixe.

Cigerxwîn lêkolînvan û dîrokzan nîn e, lê helbestvan e. Xwezî ew qet têkel bûyerên dîrokî nebana û qîma xwe tenê bi helbestvaniya xwe bianiyana. Wî weha bikrana, ji bo serhildana Şêx Seîd û birêvebir û serhildêrên kurd neheqî nekirana, gotinêne nebaş negotana, dê qîmet û rûmeta wî hîn pirtir û bilindtir bana.

Cigerxwîn ji bo kurdên Cizîrê jî weha dibêje :

“ Li nav kurdên Cizîrê nikarî mirovekî tenê jî pak bibîne. Hemî diz mîrkûj ta-lanker...” Rûpel – 164

Di navçeyekê de dibe ku hinek zilamên xirab hebin, lê mirov bi hezaran kesên navçeyê weha sucdar nake. Ev tawan-barî ji bo tevahiya runiştvanên navçê neheqiyeke mezin e. Cizîr navçeyeyeke kurdan e ku tê de hest û ruhîyeta kurd-ayetiyyê ji berê ve xurt e.

Mebesta vê nivîsê nirxandina dîtin û bîranînên Cigerxwîn nîn e. Ev karê lêkolînvan û dîrokzanan e. Kurdekî lêkolînvan li ser ışâsiyên bîranînên wî pirtûkek amade kiriye û ew ê di nêz de biweşîne. Ez dixwazim pirtûka wî ya bi navê “Sewra Azadî” a helbestan bi kurtî bidim danasîn û di derbarê şîrovekirina berhemên wî de çend gotinan bibêjim.

“Sewr” peyvek erebî ye. Kurdiya peyvê “şoreş” e. “Sewra Azadî” yanî „Şoreşâ

Azadî” ye. Ev pirtûk dîwana Cigerxwîn a duyem e. Pirtûk cara pêşî di sala 1954-an de li Şamê di çapxana “Kerem” de hatiye çap kirin. Çapa wê a duyem jî di sala 1979-an de ji alî wêşanên “Pale” de li Swêdê hatiye çapkiran. Ji bo çapa yekem Osman Sebrî pêşgotineke dirêj û ji bo çapa duyem wêşanên “Pale” pêşgotineke kurt nivîsîne.

Pirtûka “Sewra Azadî” 211 rûpel e û tê de 117 helbest hene. Cigerxwîn helbestên xwe kiriye sê beş. Beş a yekê “Birrê Welatî” ye, a duyem “Birrê Têvahî” ye û beş a sêyem “Birrê Evînî” ye. Li gorê sernavê beşan helbest li ser hev hatine civandin.

Pirtûka helbestên kurdî a pêşî ku min li navça Licê xwend, ev pirtûk bû. Di sala 1975-an de kurdekî welatparêz ê Lîceyî ev pirtûk bi dizî anî Licê û da min ku ez bixwînim. Min pirtûk xwend û helbestên tê de gelek xwêşa min çû. Naveroka helbestan welatparêzî bû û gotinêne helbestan bi ruhê kurd û kurd-ayetiyyê hatibûn xemilandin. Ev pirtûk di navça me de, di destê xortan de digeriya û bi dorê ji alî xortênu ku intreseyâ –qîma-wan bi fikrên siyasi û doza kurdî hebû, pirtûk dixwendin û hinek helbestên wî ezber dikirin. Li navçê bi navê “Mistefayê Berber” kurdekî welatparêz hebû, wî bi dehan helbestên Cigerxwîn ezber kiribûn û bi şêweyekî xweş ji xortan re bi deng dixwend.

Helbestên Cigerxwîn ên gelek baş hene. Lê, çi heyf ku bîranînê wî siya xwe da ser wan helbestên baş. Ew di dîwana xwe ya, ku bi navê “Sewra Azadî” de li ser qehremaniya Kurdan helbest dini-vîse, lê di bîranînê xwe de, qehremanenê ku gihiştin radeya herî bilind, anku çekdarên serhildêr weke diz, talanker bi nav dike. Ew bi bîranînê xwe ên çewt bi helbestên xwe ên berê re jî dikeve na-kokiyê.

Cigerxwîn li ser Marks, Lenîn û Stalîn helbest nivîsiye, pesnê wan daye û heta bi sernavê “Şîna Stalîn” helbestek nivîsiye û xemgîniya xwe nîşan daye. Lê, gelo ew nizanibû ew Stalîn bû ku herêma otonomî, ya Kurdistana Sor xirab kir, bi hezaran kurdên Kafkasyayê sirgûnê Sibîryayê kirin. Ew Stalîn bû ku komara Mehabatê kire qurbana petrola Iranê. Cigerxwîn li ser Stalîn helbest dinivîse, şîna wî digre, lê li ser serokên kurdan yên netewî helbest nanivîse û şîna komkujiya kurdan nagire.

Ez naxwazim vê kurterexneya xwe dirêj bikim. Ez vê jî bibêjim, di gel şâşî û çewtiyên Cigerxwîn, ew helbestvanekî kurd e û wî ji bo ziman û edebiyata kurdî xizmet kiriye. Tişte wî yê ku ji me re pêwîst e, ew hêla wî ya edebî ye. Ev hêla wî bila ji gelê kurd re be û dîtin û baweriyê wî ên şâşî jî bila ji wî re bin.

Cigerxwîn nivîskarekî berhemkar bû. Hijdeh (18) pirtûkên wî hatine çap kîrin

û hinek jî li benda çapê ne. Cigerxwîn ne tenê pirtûkên helbestan diafirandin, wî herweha pirtûkên li ser ziman, dîrok, gotarên pêşîyan û çîrok jî nivîsî bûn. Di gel ku ewqas pir pirtûkên wî hene, xuyaye bala rexnegiran nekişandiye û tu rexnegirekî pirtûkên wî ne nirxandîye. Ez hêj rastê nivîsek jî ne hatime ku rexne li pirtûkeke Cigerxwîn girtiye. Li gor bîr û baweriya min, divê tu kes nebe pût û li derveyê rexneyê nemîne.

Rexne û rexnegirî divê ji bo hemû nivîskaran û berhemên wan bê pêkanîn. Tu nivîskar û berhemeke pîroz tune ku ke-sekî nikaribe li berhemê wî / wê rexne bigre. Rexnegir dikare li berhemên her nivîskarî rexne bigre. Dema min ev nivîsa xwe dinivîsî, hevpeyvîneke bi Jan Dost re di kovarekê de derket. Wî di derbarê Cigerxwîn de weha gotiye :

“Divê 8 dîwanên wî bêne nirxand in, wî ci li wêjeyê zêde kiriye? Ez behsa ke-siyatiya wî û fîkrê wî nakim. Nizanim, pesnê kê daye, ew tiştekî dine û di fîkrê xwe de hemû kes azad in. Divê hemû berhemên wî di bêjingê re bêne derbas kîrin û bêne parzûn kîrin û safikîrin. Em niha sedsaliya wî pîroz dikin û pesnê wî didin. Herkes radibê û dibêje, nizam La Fontenê kurda ye, ji ber ku wî li ser heyvanan jî helbest nivîsandiye... Heke ku em wî bikin pût û jê re pûtparêstiyyê bikin, emê li cem wî bisekinin, nekaribin jê derbas bibin. Heke ku em wî nekin pût emê jî derbastir bibin û dê helbast-

vanêni ji wî mezintir jî derkevin. Ev jî ji bo wêjeya kurd girîng e. “ Jan Dost – Malpera Rojev rûpel : 1

Gotinêni Jan Dost rast in. Divê ne tenê 8 dîwanêni wî, herweha pirtûkên wî ên din jî bêne nirxandin. Cigerxwîn dîroka Kurdistanê nivisiye. Gelo ew çiqas dîrok e? Li ser ziman nivisiye, gelo ew çiqas zimanzan bû?

Bi min, ji bo pêşketina helbesta kurdî, divê helbestêni helbestvanêni kurd bêne nirxandin. Cigerxwîn jî yek ji wan e ku divê berhemêni wî bi ışêweyekî rexnegirî bêne nirxandin. Sala 2003 bû sala bîranîn û pesindayîna Cigerxwîn. Bila sala 2004 jî bibe sala rexne û nirxandinê berhemêni Cigerxwîn.

* * *

Şakirê Xudo:

Kurd li çavên mirinê dinêrin û jê natirsin ew doza karê xwe dikin.

Pêşkêşkirin: Elî Cefer

Di bin nav nîşana „ Pirsa kurdî ji Lozanê ta Yekîtiya Ewropayê „, hêja Prof. Dr. Şakirê Xudo, serokê „ Navenda Lêkolînê Kurdî li Moskoyê „, ji lay KOMKAR ê ve hati bû vexwendin; ku li çend welatên Ewropayê semîneran bi vê boneyê bide. Li Elmanyayê jî, li çend cihan semînar hate dayîn. Yek ji wan cihan, ku ligel hevalên Komkarê, rêexistina Başûrê Elmaniya ya Partiya Yekîti a Demokrata Kurd li Sûriyê (Yekîti) li bajarê Bottropê pêkve, di 11. 10. 2003 an de, semînarekî nirxbîha hat li dar xistin.

Berî ku em naveroka axaftina hêja Şakiroyê Xudo ji we, xwedevanan re rêxin, û tevî ku Ş. Xudo, xasme di nav gelê xwey Kurd de nas-dare, lê dîsan jî em dixwazin wî bi kurtî bidin nasîn:

Şakirê Xudo, derbazî naveroka babeta semînarê bibe, pêşkêşvanê semînarê jê xwest ku xwe bi xwe bi mîvanan bide nasîn. Şakirê Xudo weha got: ((Pîşiyên min ji Qersê ne, bi xwe sê pêlên penaberen ji herêma Qersê koçî Ermenistanâ îroyîn bûn. Pêla pêşin li sala 1853 – 1856 an, di şerê Rûsan û Tirkîyê, pêleke biçûk, di şerê 1877 - 1878 an de, û pêla sisiya di şerê cîhanê ê yekê de bû. Tê bîra min, dê û bavê me, taxeke gundê me Helexizê hebû, digotin heva Gaxdegane, me dizanîbû ku peyva Gax-

degan ji merivê ku qisurê wî hene re tê gotin, ango bi wateya kesên ne bavçî (eslî) tê gotin, paşê ez pê hesîm, ku xebera Ermeniya Gaxte-gan, yanê penaber. Min xwendina xwe a pêşin li gundê Elegazê standiye, pêre çûme universtîtê, min xelas kirîye, pêra du sal hatime gundê xwe Elegazê, dersdarê dîrokê bûme. Sala 1955 an rojnama «Riya Teze» hatibû rawestan, ji sala 1930-1938 an, «Riya Teze» derdiket, sala 38 an rawestî, di sala 1955 an de, pê rawestanê re cardin derket, vêca gava «Riya Teze» derket, gavik beref dikirin ku di «Riya Teze» de kar bikin, yek ji wan jî, ez bûm, salekê wekî xerîcê serokê besê kulturê, paşê ez pêşda kişandim xwedîgiravî kirime cîgirê berpirsyar (..... Eser), lê kurdzanînê mijol bûm, çar salan ez di «Riya Teze» de xebitîm, sala 1960 ï ez derbazî akadîmiya Ermenistanê bûm, li wir besê kurdzanînê hebû, ji 1960 ï ta roja îroyîn karê min, pêşeyê min kurdzanîne, dîroka Kurd bi temamî, lê bi taybetî Kurdistana Başûr. Li 1963 an, diktoriya xwe a yekê tewaw kir, li 1977 an, diktoriya diduwa, li 1981 ê navê Prof. Min stand, ji 81 ta 94 ê serokê besê kurdzanînê bûm, besekî êpêce mezine ; Haciyê Cindî, Xalidê Çeto, Mersîmê Xemo, Celilê Celîl û Evana gişkî di vî bei de kardikirin. Sala 1991 ê, ez hatim hilbijartîn wekî endamê aladariya akadîmiya zanistî ya Ermenistanê, ev cara yeke-mîn bû, wekî pêşkî kurdzanînê nav sîstema

Yekîtiya Sovyetistanê de meriv hatin bijartinê, ew jî ez bûm. Sala 1996 an, ji endamê aladarîyê, derbazî endamê rastî (tekûz) bûm yê çand, niha jî ez hesab dibim endamê akadîmiya zanistiya Ermenistanê. Sala par (2002) ez hatim bijartin endamê akadîmiya Rûsî ya bi navê: (Lêkolîn û Navnetewî). Niha ez serokatiya Navenda Lêkolînen Kurdî dikim li Moskoyê. Ev deh salin ez kar dikim, bi kurtî dixwazim bêjîm, wekî karê me lêkolîn û lêneradina(????)pirsên kurdzanînê ye. Ta roja îro me 14 pirtûk çapkirine, yek ji wan dîroka Kurdistanê bi şêweyekî akadîmî û bi giştî. Ev cara yekemîn bû; me 5 Prof. (Şakirê Xudo serokatiya wê giropê dikir) Kurd, Kurdistan, milet, welat, ev pirtûk bi çend zimanîn hatiye wergerandin. Niha jî em karê xwe berdewam dikan, lê sed mixabin, em bixwazin, nexwazin karê me bi siyasetê re gelekî girêdayî ye, nimûne Elman dikarin zaravekî gelê Elman lêkolîn bikin, wekî perçekî zanistî, lê ya me Kurda, em bixwazin nexwazin, em bi siyasetê re girêdayîne, nimûne em gerek bicil bikin, ne ku bi şer, şûr, xebera, wekî Zazakî perçekî zimanê kurdî ye, diyalikte lê kurdî ye, wekî giramêra kurdî ya ku me nivisiye,(.....) , ev cara yekemîn, me ser bingeha hemû zarav û hemû diyaliktên kurdî, pirtûkek çapkîr, wekî diyaliktên me pirin û nikarin bê diyalikt bibe mîletekî mezin, welatekî mezin, lê bingeha wan a giramêrî giş yekin.

Îsal me dest bi çapkirina tiştekî nû kir (Çerge) ew pirtûka pêsin li ser temenjîn, Şerefjan Bedlîsî; kî bû?, Malbata wî kî bûn?, Kengî hatine Bedlîsê?, Bîr û baweriyêñ wî çîne?, Ramana wî ya netewatî, felsefa wî...em rastî tiştekî zehî têñ, wek merivekî gelekî xwendî bû di dema xwe de, pir zana bûye, ev pirtûka wî ya ku çekirîye (Şefernama) nexşandina, şîklîşandina giş bi destê wî hatiye kirin, paşê em îro dixwazin çêrga xwe berdewam bikin, navê sîrya jî ev e (Gire girêñ Kurdistanê). Paşê nêta me heye, ew navnîş vekiriye, em dikarin bi hevalêñ xwe re giftogo kin, ka gelo kê em bikin wê navnîşanê, merivêñ navdar gelek in, lê gereke rastî mezin

be, em dixwazin pê Şerefjanê Bedlîsî re Mustefa Barzanî çapbikin, Şêx Seîd, Qazî Mihemed, Seyid Riza, Qasimlo, Hejar, Ehmedê Xanî, Mîlayê Cizîrî û ên mayî çapbikin.

Bi vê yekê em dixwazin şansekê, qanalekê çêkin, wekî em xwe baş nas bikin, tiştekî bi ciye, sed mixabin, wekî gelek ji me zanin Ehmedê Xanî merivekî mezin bûye, E. Xanî dîroka bengitiya Mem û Zîn gelekî bi hustatîke mezin nivisiye, lê yê ku dixwîne insokulobîdiyake tewaw emirjîna Kurdistanê, felsefa Kurdistanê, mîlethezkirina E. Xanî têda heye û bi ser ên dinê jî, em xwe baştırîn nas bikin, ew ji me ra bibe weke qanaleke mezin, weke em dersa ji dîroka xwe hildin, bi kurtî serhatiya min ev e.))).

Piştî saloxdana serpêhatiya xwe, hêja Şakiro derbazî naveroka semînarê bû, û weha dest pê kir: ((Gelî bira! Gava ez dihatim vê derê, ez di balafirê de diramîm, wekî bi çi cureyî ev rasthatina me, ev suhbeta me derbaz bikim. Ez bawerim wekî piraniya we, divê giş jî, agahdarin li ser peymana (Sîvirê) jî, li ser peymana Lozanê jî, li Sîvirê şanek ji me re çêbû, wekî bingeh bê danîn, paşê ji destê me çû, paşê ji Lozana çêbû, Lozanê Kurdistan lap kirine zagonî perçekirina wîya û navê Kurd û Kurdistanê ji holê hildanê, yanê ev bûyer bi kurtî û giştî ji gişka re eyane, bo wê yekê ez fikirîm wekî hinekî bi careyekî mayîn, evê xeberdana xwe çêbikim, û paşê wextê axaftinê, guhdarîke mezin bidim ser wekî ku em çi gereke hîn bibin ji dîroka xwe. ((Dîrok ders-darekê gelekî berg, dersdarekê gelek mezin e, kî ji dîroka xwe ders hiltîne, ew temenjîna xwe rast çêdike û dîghêje armancekê, kî dersê dîrokê hesab hilnade dîrok gelek berg wana ceza dikê. Eva xebera min nînin, eva xebera dîrokzanekî Rûs ï gelek mezin e, navê wî Giloçêviskî ye. Dibêje; dîrok dersdar e, kî dersê wêra hesab hilnade wan ceza dike. Sed mixabin nava vê axaftina îroyîn de, em bibînin wekî dersek heye ku me hesab hilneda ye û bo wê em hatine cezakirin û hêjî têñ cezakirin.

Derseke dîrokê herî sereke ew e, wekî em îro bo karê xweyî û rûnîn gerekî pêre hesab rûnin, ew nayê wê wateyê ku em dixwazin di cîhanê de tevlihevbûnek çêbe, lê rastî heta ew e, wekî statuseke we qeyd zagonê cîhanê da hene, hinekî tehevî çênebe, pirsa me nayê holê, eva riyalîtêteke, ev bîr û baweriya min nîne, ev kes nikare me gunehkar bike, bêje ; bo çi tu tiştha dibêje, pirakisyonê, çiye?

Em dêna xwe bidine dîrokê, sê caran pirsa kurdan bi temamiya bejna xwe ve pêşberî dîrokê sekiniye; cara yekê di şerê cîhanê ê yekê de, bîra we tê, Sîvir û Lozanê hatin ortê, cara diduwê şerê cîhanê, ê duwem, eqopiya Mehabadê, ya sisîyê ev tevlihevbûn 91 ê û vê dawiyê, pirsa kurda bejna xwe ve xuya hat, û mîxanizma wê jî, ez bawerim şirovekirineke kûr û dûr ne gereke, gerek aqilekî mezîn tune be wekî meriv viya fêhêm bike çîma wisane, gava her kes sînorê xwe xuya kirî, xwe têda dijî û tu problêm, tevlihevbûn, giftogo tune, her tiştî we heta heta herê, lê dema tevlihev dibe şansek çêdibê, dibêjê bibore ev neheqî hatiye kîrinê divê bê guhertinê. Ger hûn vê neheqîyê rast nekin, em nahêlin hûn nan û xuyê rihet bixwin. Divê pîrsê de, pirseke dinê jî pêşda tê; ew derseke dîrokî herî mezîn e, em çi cureyî gereke bikin wekî bigêjine çare-serkîrina pirsa xwe? Ev bi Sîvirê ra girêdayî ye, ev bi Lozanê re girêdayî ye, ev bi peymanen vê dawiyê re jî têngirêdanê.

Gava em pirsa Kurdan hemberî pîrsên netewên, mîletên din dikin, em dibînin wekî tenê, ha bi tomarî, bi nêrîneke cara yekemîn, em dibînin ya me jî, wekî ya wan e, nimûne pirsa kurdan pirsa Yûnanan, wextê xwe de, wekî bin nîrê Tirkan derketin, pirsa Kurdan, pirsa Belqanan, pirsa Kurdan, pirsa Bengiladêşê ye, pirsa Kurdan pirsa Felestînê ye, lê ew hemberhevkirina pêşin wêdatir êdî tiştekî ne wana wek hev tune, taybetî pirsa kurdî gelekî ferehe û gelekî kûre, em wexta wê nabînin, serê sérîda em ber berderiyê reş disekekin, nayê safî kirin, yanê eger em vê fîkrê tomarî bikin, fîkra pêşin ew e wekî, pirsa Kurda, baweriya we bi Xwedê hebe, ji van pîrsên min

gotine, ji gişka çetintir, ji gişka zehmetire, bo çi? Berî her tiştî em gereke ji bîra xwe nekin wekî Kurdistan welitekî bindest ne wekî Engola bona Burtogalyayê, an jî bo Firansayê, heta îrîtirya bo Esyobya, Kurdistan herçar perçê wê, aha kîp kîp hevra, perçeyekî li Tirkîye ne, perçeyekî li Îranê ne, perçeyekî li Îraqê ne, û perçeyekî li Sûriya ne, û sedsala weide wisa derbas bû, wekî ew intîfigirafîya me xweş tê, xweş nayê, ew tiştekî mayîne, em ne ku tenê li kîleka hevin, nav hevda dijîn, eva yek. Dêmek wextê meriv başqe bû, bindest be, şerkariya wî hêşantir e, eve welatê min e, ez pêşkariya wî şer dikim, pak e, xirap e, ew tiştekî mayîn e, ev yek. Ya diduwê, em di vê civînê da, ez bawerim, emê hevdû fêhêm bikin, bi heft şîrîta ji alîyê olê ve, alîyê ola misilmaniyê va, em bi Tirkan ve girêdayîne, Îranê ve girêdayîne, bi Ereban ve girêdayîne, ez hêvidarim hinekî ji bîra xwe wêda bavêjin, wekî ez Êzîdî me, ez qal-qisurî tu ola ra çenakim, ol, ol e, çi xaçperest be, çi îslamî be, çi ..., lê ola îslamê, oleke zor e, ola îslamî intîgirasiyoneke wisa çêkiriye, wekî pêşîya me, heta roja îro jî gelek hesab dibin ew birê me ne, em misilman in, hûn dizanin wekî nava îslamê de jî fêhêmdarıyek weha heye: Ume, Ume-El-îslamiye, Miletê îslamî; tu Kurdî, Erebî, Farîsî, çi dibe bibe, lê em giş birê hev in. Evê biratîyê gelekî mala me xera kirîye, me fêhêm nekiriye wekî em birê hev in, lê bo çi gerekî zimanê te serketî be, zimanê min qedexe be? Bo çi em birê hev in, ez piştgiriya te digrim, tu piştgiriya min nagrî? Îslamî gereke xwîna îslamî birê xwe nerijîne, lê bo çi xwîna min mîna çem dikşî? Bo çi Ayetollah Xumeynî weta şer destpêkir dijî Kurdan, dijî Qasimlo got, em cîhadê, dest pê dikin, wana bê Xwedê ne. Bê Xwedê tune bû, Kurd in, me, çawa îslam bûn, wisa jî îslam bûn, dua xwe jî dikirin. Na bona wana îslamî hesab dibû qanalek wekî pirsa xweyî netewî pêşda bibin, û eger em dêna xwe didinê tu cudatî orta siyaseta Xumeynî ya olperest û şahê Îranê M. Riza Behlewî yê, ne olperest da tune. Di pirsa kurdî da giş yek in. Eger bîraderê min yên Kurden Bakur ên li vira hazirin, dêna xwe bidinê, emê bibînin wekî di pirsa kurdî

da, bawer bikin cudatîke gelek biçûk heye, eger nebêjin tune ye, nava çepê tirka, rastê tirka, ol-perestê tirka, Nazêm Hikmetê komanîsta, hem pirs digêje Kurda giş hev digirin, eva jî dersetke mezin e, wekî sed mixabin, ev miletê meyî torin, aqil, namdar, seke sîfetê xwe da serîkî ji wana bilindtir, kultura me hele çênebûye, wekî em hinekî nekokiyên xwe biçûk hûda daynin, em bigîjin welitekî, paşê ez bêjîm, ez vira rûnim, tu jî vira rûne, ev jî dersetke lapa mezin e. Dêmek min anî ser wê yekê wek taybetik Kurdan e. Eger em hinekî jî bi dilvekirî xeberdin, ez wera bêjîm, ez bawer dikim hûnê ji min fêhêm bikin, eger em Kurd xaçperestbana di olê da, me dijî dewleteke îslamî şer bikira, karê me hêsanter ba, yan jî sersêrî daynin, eger ew dewletêt em dijî wan şer dikin, ew xaçperest bana, em ser vê ola xwe bana, dîsa wê hêsanter ba. Eva ha taybetiyeke wekî bê gîlî-gotin azadbûna me, dest-danîna armanca me, gelekî aqîlerê, û ser çêkirê. Dermanê wê çiye? Dermanê wê jî ev e: Wekî em giş ji bîra xwe nekin, wekî em Şêîne, em Elî Ilahî ne, em Êzidî ne, lê piraniya xwe va, em Sinî ne, lê em miletik in, em Kurd in. Dêmek kurdayetiya me gereke ser bîr û baweriya me olî be. Ya gelek miletik, evan herduwa bi hev ra kiriye, nimûne xaçparêziya Ermeniya ewana xaçparêzin, ewana başqe dibû ji xaçparêzen din jî, girîgaratiya wana, rûndartiya wana, netewatiyê da, bi hevra tevî gorî wankê wekî ola me, netewtiya me, haqa bi hevre naçin, ola me bi wan ra hatiye girêdanê, netewtiya me başqe ye, em nikarin destê xwe ji olê bikşînin, ol jî kultureke, ol jî curekî Xwedê nasîyê ye, herkes ïzna xwe heye, dua xwe, çi cureyî dixwaze bila bike, lê em taybetiye me ewe, wekî giş gerekî pêşî bîr bînin, wekî em Kurd in. Sibê rabû bê Xwedê hawara 72 miletan bê, paş hawara me. Helbestvanekî me jî hebû, Simoyê Şemo, mehdîra Xwedê lêbe, digo pêsiyên me, serê sêrî da xerifbûn, bona me Êzidiya digot, digot; dëwsa bigotana Xwedê tu hawara me bê, paşa hawara 72 miletî, digotin Xwedê tu hawara 72 i bê, paşê hawara me, Xwedê jî hawara wan hat, em bîr kirin, em vê rojê da man man û man.

Şerê cîhanê ê yekê şansek da Kurda, wekî vê rêx-ezebê derkevin, ew şans jî ew bû, wekî dewletên Entatayê cara yekemîn bilokeke gelekî zor hat çêkirin, wekî tirkîyê, imperetoriya Osmanî bi-perçiqîne, perçiqandina imperetoriya Osmanî tiştekî ne haqa zehmet bû, hûn zanin wekî dest-pêka çerxa 19 an de, navê imperetoriya Osmanî danîbûn, "Merivê Nexweş" merivê nexweş jî, wekî dehfekê lê bide, lê pirs çetinayıya wê ew e wekî nekokî nava wan welatan de hebû. Kî, wê kîjan parî xwera hilde? Hûn zanin wekî Elmâyâ, Ustirayayê wana, piştgiriya Tirkîyê dikirin, (Entatayê hînê ew hersêk bûn), û Firansa û Rûsyayê, sîmpatya, Emerîkayê jî terefê wan bû, di vî şerî da sala 1916 an, peymanek hate girêdan navbera Firansayê û Ingiltirê da, ev peyman jî navê wê; peymana Saykis - Pîko. Saykis wezîrê karê der ve yê Ingiltirê, Pîko yê Firansayê, bi navê wana, navê peymana Saykis - Pîko, mehekê şûnda ev peyman hate îmzikirin, wisa jî, ji aliyê wezîrê karê der ve yê Rûsyayê Sazunof, gelek caran lîdretorê da dibêjin, peymana Saykis - Pîko - Sazunof. Ci hatibû nivisandin di vê peymanê da? Bi kurtî peymaneke gelekî mezin bû; gerekî, kîjan, çawa, bi ci cureyî, hazar û yet pirs hebûn, lê kurtahî bo me, êntirêsa wê ew bû, wekî bi vê peymanê Misir, Îraq, Felesîn dikete dest Ingiltirê. Libnan û Sûriyê, diketin bin destê Firansayê. Ermenistan û Kurdistan dikete bin kontirola Rûsê, bi objektîvî çiqasî impîryalîzma Rûsyayê ci bû, ci nebû, bona me ew şansek bû, wekî em bin nîrê Tirkîyayê derkevin, weke dewletekê, bin dest, ci dîbin, ew tiştekî başqe ye, û wisa hat standinê, tu bêjî ha ha ha zûtirê em bigîjine wê qederê, di vê holê da, du hasîgeh çêbû ser safikirina vê pirsê, heta niha sed mixabin ci li Sovyetê, ci jî dervayî Sovyetê li der-heqa vê yekê da kêm hatiye gotinê, yan jî nîvîro hatiye gotinê, weke nîv rastî, û gelek merivê zane dibêjin, wekî derew diha başe, neku nîv rastî, yan eva rastiye, eva ne rastiye, nîv rastî lê her talûke ye, ew nîv rastî jî ew bû, wekî rola rîberên Oktoberê, - ez bixwe jî komanîst bûm, me xwe bixwe jî di pirtükên xwe de çend ciya nivisîye, lê qisura min biborînin eva rastike -, hele Sovyet hebû jî min ew rastî jî texmîn kir,

û got; wek rêberên Oktoberê di pirsa me da malxirabîke mezin bû. Biraderekî me heye; Dr. Ebdî Hacî, kurdekî Sûriyê ye, gelekî xwendîye, û kurekî gelekî zana ye, dibêje, mamoto Şakiro, rêwilosya Oktoberê bo xezeb, bo du miletâ; bo Rûsa û bo Kurda, ya Kurda minzanî bû, lê vêca wexta wî bala min kişand ser Rûsa jî, kêfa min pêra hat, wekî min got şukir di nav me da rewşenbîrên ha hene. Bo çî? Gava rêwilosya Oktoberê, Rûsyâ ji nav şer talûke bûyê derket. Rûsa dijminê herî xedar ji bo Tirkayê, Rûsa û Tirkâ 12 şer kirine, cara yekemîn Rûsa dixwast ev topraxa çavê wê li ser bû, hilda xwera, cara yekemîn dewletên Rojava, yên ku tim li pêşberî Rûsyayê disekekin û nedihêştin ew pilana bê sérî, ew ji pişt wan revîn, wexta wana dixwast zorê bî din Tirkayê, Rûsyâ pişta Tirkayê digirt, evê carê giş yek dijî Tirkayê derketin, dêmek rêwilosya Oktoberê çêbû, û êdî pilanê dewletên Entatayê xuya bûn, pêra tevgera Kemalistâ dest pê bû, Mistefa Kemal dest pê kir û lîdretora Rûsyayê nivisîne, wekî şerê azadariyê, eva jî tiştekî sexte ye, çimkî şerê azadariya çî?! Azadarî wexta tu miletê xwe, axa xwe azadkê, lê wextê tu dixwazî ew miletên, dîsa bin destê xwe xaykê, eva ne şerê azadariyê ye, lê temamî lîdretora Sovyetê wisa hatiye nivîsarê, eva sextek û gunehkariyeke mezin e. Rûsyâ ji dijminê herî talûke ji Tirkayê re, bo dostê wê herî nêzîk. Ew nayê wê wateyê, wekî Rûsyâ dijminê miletê Kurd bû. Na, Rûsyâ dixwast wekî Kurdistan jî, Ermenistan ji bikeve destê wê, çimkî Bolşevîk û komonîst lawaz bûn, nikarîbûn pêsiya Entatiyayê bisekinin, Firansayê, Ingiltirê, ewa jî destpêkir dijî wana, ew û Kemalî hatin bûn yek. Dêmek bi serê Rûsyayê Kemalî neku bi tenê kumek stand, lê dijminek ji holê derket. a duwem Kemaliyan xwe bixwe şerekî mezin dest pê kirin û wisa hate standinê wekî eniya dijî Tirkayê sist bû, wateya wê sist-bûnê ew bû, wekî Îngilayê ew çiku dixwasta distand, ew hersê welatê xwe, wekî min got, Firansayê jî ya xwe stand, pirsa Rûsyayê Kurdistan, Ermenistan, bû tiştekî tektîkî, bûye, bûye, nebûye, li cehnimê. Bi vê tehrî, di vê rewşê da sala 1920 an, li 10. 08. hat girêdan peymana Sîvirê, hûn haj vê hene, ez naxwazim hûrgîlîk ser

vê bêjim, Peymana Sêvirê gelî bira, dixwazim hinekî we agahdar bikim, 600 rûpele, derheqa Bosforê, derheqa miletên biçûk, derheqa deynê Osmaniye, derheqa Izmîrê, derheqa , hezar û yet pirs. Ez vê jî bêjim, wekî heger peymana Sîvirê bihata sérî, ne ku tenê her miletên bindest xelas dibûn, wisa jî Tirkiyê diçû Anadoliya Rojava û lokal dewletike usa bû, wekî rola wê iroyîn êdî tu ortê nikarî bû berbe, lê sed mixabin sala bîstê, êdî aşkere bû, wekî dihate xuyakirin, wekî peymana Lozanê, dikare peymana Sîvirê, yaserbûna wê gelekî zehmet, û gelekî giran e. Gava sala 1922 an, ber çemê Sakariyê Kemaliya leşkerê Yûnanan, yê ku dakuta bûn pişta wan şikinand, êdî aşkere bû, wekî Kemaliya bi serketine.

Em vê stasyonê daynin wê kêlekê û derbazî ser mesela Kurdan bin, basîsa me ci bû, em Kurd, me ci dikir, karê me ci bû? Hûn dizanin, wekî eynî wê demê da, sala 1918 an, agirbesta Mûdrosê hat girêdanê, eynî hema berî, destpêkîrina wê ya wîlayeta Musilê, yanê Kurdistana Başûr, ket destê Ingiltirê, ew û Îraq bihevra. Ingiltirê gelek soz dan Kurda, wekî emê wera ha bikin, ha bikin, lê eynî wê salê da jî, bes bi şerkariya şêx Mihemed bû, lê serê sérî da, hela hîn dewleta Îraqê nehati bû çêkirin, konfilêgtâ Kurdan, Ingiltirê revo. Kurdan dixwest ser Autonomiyê, serxwebûnê tiştekî bistînin. Ingiltirê hele ne amade bû, ci cureyî bê, çawa bikê, çibkê. Ya duwem ser vê bingehê konfilêgt çêbû orta Ingiltira û Kurdan da. Bi dîtina min rehmetiyê şêx Mehmûd hinkî lezgekt, gava şer destpêkir dijî Ingiltirê, neku bi wê wateyê wekî Ingiltirê baş bû, Ingiltirê hele komplêgtâ wan bi Ereban jî gelekî zor bû, Ingiltirê dizanî bû, wekî Kurd dikarin bibin şansekî wekî ewanakî staslîbsasyones çêke di Îraqê da ber wê bi dîtina min rehmetiyê şêx Mehmûd hinekî demê zûtir şer kir. Me nikarîbû bi hostatî ew nekokî ji xwe ra bida bikaranîn, lê tişte dine ew bû, wekî Kemal û kemalista himlî dijî Ingiltirê şer bikira. Şêx Mehmûd konflêgtâ wî ew bû, Kemal dakete wê derê, Elî Şefiq hebû, qumandarê Tirkan bû, ew temamiya karê xwe tevî Kurda ewî dikir, wekî

Kurd û Tirk birê hevin. Bi xwe M. Kemal ne ewqas olperest bû, lê di vê pirsê da, îslam kete bîra wî, dibêje em birê hev in, em îslamî ne, em gerek bi hevre dijî Êngiltirê şer bikin.

Eynî vê çaxî da, tucaran di dîroka Tirkîyê de, haqas berg û gumreh pirobaganda çênedikirin, wekî Kurd û Tirk birê hev in, ev dewlet dewleta du mîleta ne, ev dewleta Kurd û Tirkan e, navê Kurdan jî datanîn pêşiyê, ango pêşiyê digotin Kurd, paşê Tirk. Şert jî ew bû, wekî eger bi wan ra lihev bê, wîlayeta Musilê paşda bînin, lê yala bê sereke, wekî jî şert û peymana Sîvirê xwe dûr xin. Eynî vê demê da, sala 1921 ê, herêma Koçgere serhildanek çêbû, ya Kurdan, Tirkan ev serhildan nava xwînê da perçiqandin, û di meclîsa Tirkan da çend digitata ev pirs bilind kir, ecîb, wê çaxî nekokî nav Kemal û dijminê wî da hebû, ev giftugokirin. Eynî wê wextê da, pêşniyarek hatiye kirinê, wekî gerekê Awtonomiyê bidine Kurdistanê. Ev dikomênt nava tu pirtûkan de tune ye, van salêna paşin, sala 1996 an, ev dikomênt hate holê. Ci dikomênte? Berlemana Tirkîyê biryar da, wekî Awtonomî bidin Kurda.

Ew dikomênt 10 xalên wê hene, ez we aciz na-kim, yekê, diduwa ji we re bixwînim.

- Bona hesabhdan û dayîna mafê Kurdan, encumena Tirkî Awtonomiyê dide Kurdan, ya ku gerekê hemû extiyarî wana, netewiya wana, erfû edetên wana, hilde ser hesêb.
- Weke wezîr Awtonomî, encumena Tirkî mirovekî dibêjêre, yê ku gerekî rêz û hirmeta wî nav mîletê Kurdan hebe, wekî karibe bi destê xwe de xayke.

- Ew wezîr bi 3 ê salan tê xuya kirin (bicîhkirin). Eger millet bixwaze wî paşda vegşîne, wê çaxê karin yekî din pêş din. Bi kurtasî ev wezîr ji alî Anqere da tê bi cih kirin.

Bi gîlîkî, di vê ruhî, deh xal hatine xuyakirin dermaf Awtonomiya Kurdan da. Em nava axaf-tina Kemal û kemalîstan da gelek tiştan dibînin,

wekî wê çaxî dermaf biratiya Kurd û Tirkan gelekî hatiye gotinê, lê dikomêntek vî cureyî, cara yekemîn em dibînin. Çawa bû, yazia wê bextê vê dikomêntê? Nasoyalîstên Tirkan, ci bi ci, du rojan şûnda, ev dikomênt hinda kirin, lê libek kete destê Ingiltirê, Rûsa. Ingiltirê, ya ku dijminê Tirkîya bû, û ev dikomênt ji dest wan hatiye holê û derketiye nava meydanê, yanê ev lîstîka Tirkan - kemaliyan bi Kurdan re, neku tenê bi zarekî hatiye gotin, dikomêntekî hajî hebûye. Ez bawer dikim wekî gerekî ev jî bê kar anîn, vir hada bona şerkariya Kurdan, seba big-ijin bext û rizgetê xwe. Bi vî tehrî, sala 1922 an, êdî dihate xuya kirin wekî peymana Sîvirê hele hîn nebêli bû, berve windabûnê, berve mirinê diçe.

Sala 1923 an, li Lozanê konfirans çêbû, di wê konfiransê da perçebûna Kurdistanê, êdî bi kurtasî hate bi ci kirin. Peymana Lozanê ne wekî peymana Sîvirê ye, lê ew jî 140 pere, hezar û yet pirs têda hene û bona Kurdan tu tişt tê de ne-hate gotin; ne navê Kurdistan têda heye, ne navê Kurdan têda heye. Xalê wê bal min hene.

Peymana Lozanê da, beşekî wê heye, besê ser kêmnetewe, mîletênibicûk. Bona mîletênibicûk ci hatiye gotin, bona mîletêni ne misilman ci hatiye gotin? Yanê kongirêk di Tirkîyê de demê Ermenî, Ciho û Yûnan. Kurd kirine qalibê, İslamiyê, mîletekî İslâmî ne, tu problêm di vir de tune. Tiştekî pir entirêsent e wekî carekê va, dest ji peyman û şertîn Lozanê kişandin tiştekî zehmet bû, çimkî sê sal berê, hele sê sal kêmtir jî, navê Kurd û Kurdistanê hebû, çawa bû huriş Tirkê dane, a li vê derê İsmetî Kerr, İsmet Înöno, - bi xwe Kurd bû, Xwedê temenê wî kin ke -. Ez bîr nekim bêjîm M. Kemal, wextê dêgotatê (nûner?) Kurd dihatin encumenê, lîstikek zor dihat kirinê, bi Kurdan ra, digot gerekî hûn bi cilêñ kurdî va bêne encumenê, wekî bê xuyakirin, hûn Kurd in. Eynî jî kongirê Lozanê wextê pirsa Kurdan hate ortê, dewletê Rojava jî go-tin, helbet durûtiya wan jî gelek hebû, ewa ci ji wan re gerek bû, hildan, wekî Kurd bibe, nebe

li cehnimê.

Firansayê dest pê kir têkiliyên xwe çêbike wekî deynê xwe ji wan bistîne, Ingiltirê nêhêrî Rûsa û Tirkiya-Kemalî nêzîkî hev in, ew jî, alî xwe ra nêzîk bûn, wekî gelek nekeve hembêza Rûsyayê. Îca Kurd hatin firotan, lê dîsa jî çiqasî hebû, gerekî nîşanî cîhanê bidana wekî me bîr nekiriye pirsa Kurd heyen. Gava behsa Kurdan hate kirin, wana got; problêma Kurdan tune, dewleta Tirk, dewleta Kurdan û Tirkan e, û İsmet Înono têligram şande Anquerê. Li Anquerê nûnerên (dêgotatê) Kurdan têligram şandin bi îmza xwe. Çend serokên Kurdan, wekî em vê îmza xwe didine bicihkiran, wekî tu problêmên me li vira tune ne, dewlet dewleta me ye, perlement, perlemana me herdu miletan e. Di nava wan da Husêن Ewnî û Husêن Xeyri. Têligram hate Lozanê, li Lozanê hate xwendin. Helbet eva ne şertê sereke ye, wekî wana got, loma ev biryar pejirandin. Ez dixwazim bi vê yekê nîşan bidim, wekî em çiqas dilsax, gelek cara çiqas birîmîfik, çiqas zû bawer dîkin û sala 1925 an, wexta serhildana şêx Seîd hate perçiqandin, ev herdu jî hatine dardakirin. Bi vî tehrî, peymana Lozanê pirsa kurdan ji holê da hildanê. Kîjane dersa serekî bo me, dîsa em bêne ser problêma serekî. Li Sîvirê; Sîvir bajarekî biçük e, kêleka Parîsê ye, peyman li wir hatiye girêdanê, loma jî dibêjin peymana Sîvirê. Em Kurd sed mixabin ne amade bûn, wekî çawa pêwîste xuyîtiyê li extiyarî û bext û rizqê xwe bikin. Şerif Paşa, ceneralê kurd, wekî balyozê Tirkîyê bû li Siwêsirayê, ewî bolyoziya xwe berda û xuyîtikir, lê aborata wî tune bû, konsalatî tune bû, şewirdarî du-sê meriv bûn. Eynî wê demê pirsa Ermeniyan jî dihat, lê Ermeniyan dêlégaseke mezin hebû, xwediyên wan hebûn, piştgiriya wan dikirin, ev yek. Jê wir da, ew derdê mey dê û bavan, dîsa serê xwe bilind kir, yekîti di nav Kurdan de tune bû, em bêjin digotatê Kurd piştgiriya pirsa Kurdan nedikirin, ev jî pirsek e. Li wilayeta Musilê xwe bixwe jî yekîti nava Kurdan tune bû; şêx Mehmûd, bi dîtina min hinekî weidê zûtir xwe bi serxwe hesab kir, navê xwe jî danî paşa, paşayê Kurdistanê. Çi jî hebûya, êdî ala Kurdistanê rakirin, êdî markeya

hate berdan, rojnamên wan derketin û hwd. Eynî wê çaxê Adile Xanim, Xorşîd Axa, Baba Bekir Axa û gelek şewirdarên din jî û şêx Mehmûd şer dikirin. Yanê ev şertê der hebû, lê em ne amade bûn, wekî wan şertan bona xwe baş bidine bi kar anîn. Eger em giştî hildin dersa herî mezin, ew wekî em, divê ev xeberdana min, gotina min, bi têorîtkî, bi pirênsîb ne pejrandinê, lê hesab hildana wê em bojdarin. Ez wek dîrokzan nikarim miletékî bindest ji çerxa nozda girtî heta iro nîşan dim, bi tiliya ve, bala we bikşînim ser wana, wekî ew xwe bê komeldariya dewleteke mezin, ji bin nîrê dewleta dinê derkekiye, eger hûn meseleke weha bibînin ezê gelekî spasdarê we bim.

Em bêne ser Yûnanistanê, sala 1825-1828 an, eger Rûsyâ û welatên Ewropa nîbona, nikarîbûn bindestê Tirkîyê derketa. Ez vê wera bêjîm, bawerîk û nivîskarê mezin Corc Bayron xwe bi xwe tevlî wî şerî bû, bona azadariya wê, û lingê wî li wê derê seqet bû.

Em hildin Ermenistan ji Îranê xelas bû, weidê xwe de, sala 1828 an de, em bêjin Erâtîrya ji Esyobya, em bêjin Bingladîşê, em bêjin welatên Balqan; eger piştgiriya Rûsa tune ba, nikarîbûn xwe xelas kirana. Kîjan welat dibe, bila bibe, bê piştgiriya dewletekê nikarîbû xelasiya xwe bistîne. Ev têye wê wateyê, wekî em gereke gumana xwe nedine ser dewletên mezin, wekî bêne me aza bikin. Xwedê gotiye; ji te hereket, ji min bereket, lê gerekî em qedrê wî faktorî zanibin. Em gerekî karibin xwe re dostan çêbikin, mesela me Kurdan heye dibêje: “ Hezar dost kêm e, dijminek pir e ”, sed mixabin di nav me de hêz û meriv hene, wekî mera bol, bol çiqas dixwazin me ra dijminan çêkin, dewsa dostan çêkin, eva rîyalîtêteke me ye reş e. Eger em nikarin dostan çêkin, qenê be wisa bikin wekî nîtiran bikin, eger komekê nade me, xirabiyê jî mera nekin.

Ya diduwan, di vê pirsê de, gertekî derseke Lozanê û Sîverê, êlahî Lozanê, ew e wekî em gertekî hînî kultura siyasetê, diplomasiyê bibine. Dunya îroyîn hezar û yek mesele dide me, wekî

meriv gelek caran dikare bi destê diblomatekî zor, siyasetmedarekî zor pirsên wisa safî ke, yê me bi çomax, mêtîng, û hezar tişti ve nikarî bûn safî bikira.

Ya sisiyan, wekî tiştekî oktomîst bo me Kurd û Kurdistanê, ew jî ewe wekî wextekê Şiroçiklî; Alman bû, Ingiliz bû, niha bîra min nayê, miletê Kurd sed mixabin, çûbû Kurdistanê, dîtibû, Kurd gelekî jê hezkiri bûn, sed mixabin dibêje; miletê Kurd, miletækî ji bîr kiriye, şerekî ji bîr kirî dike. Yanê wî xwe bi xwe jî, ji bîr kiriye, şerê wî jî bîr kiriye. Şukir ji vê gavê re, em gîhîştine rojeka wisa wekî niha kes nikare bêje, Kurd û Kurdistan bîrkirî ye, şerê me bîr kirî ye, lê awtomatîk pirs nayêن safî kirin, gava siyasetmedar, yan jî diblomat bêjin; erê mafê we heye, nizanim çi çi, em gerekî wîya bawer nekin, neku wekî ew xerabin. Na. Ez deqekî hinekî dûrkevîm ji axaftina xwe, Firansiwa Mîtiran dostê Kurdan ê mezin bû, lê çimkî jîna wî jî dosta Kurdan a mezin bû, Firansiwa Mîtiran dostayîya xwe û kirina xwe, em gava berhev dikin, dibînin ha ne haqa wekî hev in, dêmek eger em dixwazin, piştgiriya me bê kirinê, em gerekî bi hêz û yek bin, rastiyekê mezin heye, meinî sistiya me, zeîfiya me ew kî êlahî derê piştgiriya me nedikirin, lê em ji bîra dikin, wekî piştgiriya me nakin, çimkî em sistin, eger em dixwazin piştgiriya me bikin, gertekî em bi hêz bin, çimkê dunya kişiye, şaxmat e, bazar e, tu vê dikî karê min têda heye, ez ji bo te dikim.

Ez dixwazim ser vê xalê, qisura min efo bikin, min hinek dûr û dirêj kir, serê we eşand, bême ser wê wateyê, wekî iro dermafê pêwendiyêن Kurdan û Emerîkan gelek axaftin tê kirin;

Emerîka me bixapîne, yan nexapîne, Emerîka bidê me, yan nadê me? Di siyasetê da, ev tişte birêmitîk kar nake, eger em dixwazin Emerîka komekê bidê me, eger em dixwazin yarmetî bistînin, çimkî me re pêwîste, gereke yekîtiya me hebê. Gereke ew karê em dîkin, Emerîkî, çi dost, çi dijmin têda bibînin, wekî pêrispîk ta ev kar heye.

Xala dawî nav me da gelek cara, (duh axaftinek jî min bist), ez naxwazim bêjim pirsa serxwebûnê, standina mafê xwe, bicurey Awtonomî, fêderasyonê, serxwebûn e, tiştekî dine mayîne. Ya me ne weke gelek miletên mayîne, ya me pirosêse, pirosês tê fêhêm kirinê, pirosêseke dûr û dirêj e, gerekî hêdî hêdî, pêpel bin, yek yek herin. Ew nayê wê wateyê wekî em naxwazin, yan tê wê wateyê curekî mayîn tune, gerekî dîrokê lez neyêxin. İro ev şans kefî destê me, iro Kurdistan Başûr e, iro Komkar li vê derê, Alman seba wê yekê ev cî nedane me wekî gunê xwe bi me tê, Alman dinêre ne ji bona wê yekê qedrê me bigre, Alman iro di Kurda n de hêzkekî dibîne, weke miletækî layiqî wî qedrî. Eger em karîbin temama van pirsan kompilegt, bi hevra bînin û kultura me danûstandin hebe, em bi hev re berg pirsan giftogo bikin, bi hevra qar nebin, hinek ser hevda hêrsbin, lê wexta ji vira derketin, weke dostan derkevin, weke miletækî kultur, wê çaxê emê bextê xwe jî bistînin, rizqê xwe jî bistînin.

* * *

Bersiva min li ser nameya mamosta

Reşo Zîlan

Keça Kurd

Nameyek ji hêja Reşo Zîlanî di riya mamosta Tengezarê Marînî re, gihaye min, ku tê de min rexne dike û raya xwe li ser bêjeya(çêr) di zimanê kurdî de daye. Wa diyare ku mamostayî gotara min, ya li ser bêjeya(çêrok an çîrok) di kovara PÊL de xwendîye. Vêce hin têbîniyên mamostayî li ser şirovekirina min ya li ser bêjeya (çêr) hene. Û dide xuyakirin ku raya min di wateya wê bêjeyê de şaş hatiye.

Ez ji xwendevanan dixwazim ku ew bikarin wê kurtegotarê bixwênin; li gel ku mixabin ew gor tar di kovarê de çewt hatiye çap kirin jî. An jî ew dikarin di malpera qamişlo de(pencera pênûsxane) bixwênin, da bizanin bê min ci nivîsiye. Li gel wê jî ez neçar im hin hevakan ji wê gotara xwe biguhêzime vir. Û raya xwe ji mamostayî û ji xwendevana re şirove bikim.

Birayê min, ez sipasiya we dikim û ez hêvî jî ji we û ji her nivîskarekî dikim; her rexneyeke we hebe, bê erêno raberî min bikin, da livandina di vê barê de xurttir bibe. Bi raya we, ya min û ya nivîskarekî dî findek li pêsiya xwendevanan pêdiikeve û sûdek jî jê werdigirin. Bi vê nameya we û ew rexneya ku we li min kirî, ji min re bû tirafa di tifika vê gotara min de, da ku ez bikarin bihtar li bin rehê bêjeya(çêr) bikolim û hinek ji wê rastiya ku hun dibêjin, û ya ku ez jî bawer pê tênim, raberî xwendevanan bikim.

Lê ji berî ku ez bersiva mamostayî li ser vê bêjeyê bidim, dixwazim li ser hin ra û takbîrên wî, yên ku li destpêkê rû bi rûyî min kirine, bi-

axivim. Mamosta dibêje: "Heyran, di cîhana zanistê de zanistek heye, ku jêre dibêjin etîmolojî, ango nasîn û zanîna rehêne peyvan..."

Ez li gel mamostayî me û bê bingehekî zanistî tu kar cihê xwe nagire û bêsûd jî dimîne. Zanist çiye? Gelo nasîn û zanîn çawe bi dest mirovî ketiye? Mirovekî nezan, yekî şivan an jî gavan li cara pêşî hêza agirê kûmirê têbînî kiriye û paşê mirovine zana ew hêz bi zanistî bi kar anîne. Anglo ez dixwazim bêjim ku ne merce em hemî tişti di riya pirtûkên zanistî, an jî ji lêkolînên akademî wergirin; lê a baş ew e ku em wan bêjeyên di bin toza salan de bivêvirin, em li bin rehê wan bikolin; heryek ji me çi di karîna wî de heye, bila nemerdî neke. Dibe ku ez bi qilçikekî darînî li bin rehê vê gulistanê bikolim, lê yekî dî bi alavekî pêşketîtir bikole; belê em herdu jî xebateke sûdber dikan. Eger me pirtûkxaneyeke weha dewlemend hebaye û me zimanekî nivîskî i kevin hebaye, wê xebata me jî hesanîtir baye. Lê em çibikin, mercen ku gel û welatê me têre derbas bûye û hêjî di nav de ye, em pêbend kirine. Pirsgirêka zimanê me ne weke ya ti ziman an e, ji ber ku ta roja îro zimanê me li derveyî dezgehê zanistê maye; ne ketiye hundurê dibistan û zanîngehan de û ji qewareya ezmûneke zanistî bê par maye(mebesta min zaravê kurmanciya bakur e). Ti pirtûkên ku li ser bingehine zanistî, yên ku ji rexê zanayne cîhanî danpêdabin me nînin, ta ku em pal bidine ser ; em hîn di destpêka civandin û komkirina bêjeyê zimanê kurdî de ne. Em bi şûn pirtûk û hin çêrokên mele Mehmûdê Bayezidî, yê ku

di hicrika feqetîyê de çend pirtokên bi zimanê erebî xwendî bûn, digerin, da ji zimanê wî sûdeke bi dest xin...

Ez di wê kurtegotara xwe de bi şûn bingehê çêrokê de çûm û min berawirdek li gel hin bêjeyên dî, yên ku paşpirtika(ok) sitandine kir, ta ku ez gihame wê rastiya ku bêje(çêrok) e, ne (çirok)e. Û bi vî rengî ye: Çêr weke bêjeyekê navdêreke serbixwe ye, lê ku paşpirtika(ok)ê stand, navdêreke dî, ya ku çêrok e pêk tîne û wateyeke dî dide. Ev paşpirtik bi ser gelek navdêran ve dibe û navdêreke nû, bi wateyeke nû dirust dike, wek; Serok, kenok, hevok, lêvok ...Û min di wê gotarê de bi vî rengê xwarê nivîsî bû:

„Di baweriya min de, çêrok ji çîrokê rasttr e, ...ji ber ku navdêra(çêr) bi wateya axivtin û gotinê hatiye. Li devera çiyayê kurmênc û li hin deveren dî bi kar tînin û dibêjin: Duhî Ehmed çêra Xelîlî dikir; bi wateya ku li ser Xelîlî di-axivî. Dema Apo Osman di civatê de rûdînişt, çêra wî li ser kêşa gelê wî bû. Li devera Aliyan, li Binxetê jî li cihê (çêr), (çêl) dibêjin; te çêl min dikir, ango çêla te li ser min bû; di zimanê me de tipa(r) û ya(l) cihê hev digirin“

Vêce mamostayê hêja Reşo Zilan di vê nameya xwe de dibêje ku bêjeyâ(çêr) bi vê wateya min gotiye nayêt û eva ha çewt e. Bälge jî ji min re anîye, dibêje:

„Ji ber ku tu dibêjî ku kurdênilan-bêvan deverê „çêr“ jî bi manaya li ser peyvîn/behs kirin û hwd de dibêjin. Ne rast e. Eger bibêjin jî, çewt e û tiştekî gelek deverî ye.

Li ser gotina mamostayî ku dibêje ev gotin.“gelekî deverî ye”

Bersiva min li vê rista mamostayî û li ser ya ku dibêje:”..etimolojî, ango nasîn û zanîna rehêne peyvan“

Eger mirovê vekolîner pal ne de ser bêjeyên deverî û wateya bêjeyekê ji çend deveran û ji nav dilê çend cotegetinan dernexe, wê çawe bikare

bîgehê reh û bingehê bêjeyê û çawe rastiya wateya wê derfîne? Vêce li vir ez dibêjîm, hemî ew bêjeyen deverî ji me re giring in û nabê em wan pişt guhê xwe ve bavêjin. Dema min dît ku li du deveren ji hev dûr; li rojhelatê Qamişloyê bêjeya (çêl) û li devera Çiyayê kurmêc bêjeya(çêr) bi wateya gotin û axavitin bi kar tênin, min got ku bingehê çêrok, ji çêr hatiye. Lê eger me got ku çirok e, gelo wateya çîr ciye? Bêjeya çîreçîr(dubarekirina çîr e) bi wateya dengê nexwêş têt. Cîrçîrk(çîçîrk), kêzikeke bi şevê çîrçîrê dike. Dema ku mirovek bi dengê bilind di-axive û qerebalixê dike, nemaze dema ku dengê wî zirav û bilind be, jêre dibêjin, ev ci çîrçîra te ye? Dema ku zincîra bîrê de çîrikê re derbas dibe û bi dewlê re tê kişandin, dibêjin çîrçîra çîrikê ye. Ango em dikarin bêjin ku çîr, navê dengekî nexwêş e.

Mamostayî di nameya xwe de gotiye:“Min ew(mebesta wî bêjeyâ çêr e) li çend cihan dîtin û bi rastî min fedî jî kir.“ Angu ji ber vê bêjeyê ji gotara min fedî kiriye

Mamosta bi xwe dibêje, divê mirov pal bide ser zanistê. Vêce eger em pal bidine ser bingehêen zanistî, ji xwe di mijaren zanistî de fehêtî nîne, ev ji layekî û ji aliyekekî dî ez ji te re bi behwerî vê rastiyê dibêjîm, ku min şaşî nekiriye û ew wateya wê bêjeyê min rast gotiye; Kurd li hin deveran hene ku dibêjin: Ez çêra kêşa gelê xwe dikim, ango ez li ser kêşa gelê xwe dipeyivim.

Mamostayî nivîsiye:“Min jî heval hene ji çiyayê Kurmênc, lê heta niha min ji yekî ev bi vê maneyê nebihîst.“

Ez jî ji we dixwazim, eger giranî nebe, li ser wateya vê bêjeyê, ji wan hevalên xwe û ji hinêñ dî bipirse, binêre ka dê çi bersivê bidin? Lê min bi xwe gelek caran ji xelkên çiyayê kurmênc bi-hîstiye. Û min ji bo vê mijarê, ji çend hevalên xwe ên nivîskar pirsî, ew jî ev in: (mamosta Heyderê Umer, Dektor Evdilmecidê şêxo û Dektor Kamîran Bêkes); ev hersê jî ji xelkên çiyayê kurmênc in û ji min re bi her deh telî-

yan morkirin ku xelkên gelek deveran ji çi-yayê kurmênc, nemaze yên ku ji sinôrê Ereban dûr, bêjeya(çêr) dibêjin û gotina ku bêjin, min behsa we dikir, nabêjin; ew dibêjin min çêra te kir, ango axavtina min li ser te bû. Dema min bi telefonê ji dekor Evdilmecîdê Şêxo pirsî, wî got ku li çiyayê kurmênc bêjeya(çêr) weke bas kirin tê gotin, lê ne li hemî deveran; li devera me, ji ber ku em bi dev Ereban ve ne, em dibêjin qala wî kir û ev gotineke erebî ye; em nabêjin çêra wî kir. Paşê jî bi dev ken got, vaye kebaniya min dibêje, ku li devera wan, navdêra (çêr) bi kar tênin û dibêjin çêra wî kir, ango basa wî kir.

Mamosta Heyderî got, ku ev bêje, ango çêr li herêma çiyayê kurmênc bi du wateyan tê gotin: 1) Bi wateya gotin û axavtin têt(çêra min dike; behsa min dike).

2) Bi wateya mirûskirin û madê nexweş têt(çêra xwe nexweş dike, ango mirûsê xwe dike; rûyê xwe nexweş dike).

Ev wateya dawî di baweriya min de, ji bêjeya çehr û çar hatiye, ango rûdêm.

Niha jî ez mînakeke nivîsî ji gotareke Dektor Kamîran Bêkes tînim, ya ku di kovara PÊNÛSê de, hejmara 13hê, rûpelê 5ê hatiye, dibêje:

„Gelo ma di siya nebûna yasaya partî, komele, rêxistin û çapemeniya azad de, mirov ê çawe çêra hilbijartinekê(hema nîydemokrat be jî)bike.“

Bêguman mirov di vê hevoka dekor Kamîranî de, dibîne ku bêjeya(çêr) bi wateya gotin, bas û axavtin hatiye.

Mînak li ser bêjeya(çêl) di pêñusa van dû nivîskaran de:

1) Bavê Nazê di pirtûka xwe RÊZMANA ZIMANÊ KURDÎ de, rûpelê 43ê dibêje:

“Dêmenê siyem. Ewe yê ku di axavtinê de çêl wan tê kirin.”

2) Mamosta Deham Evdilfetah di pirtûka xwe HINDEK ALOZIYÊN ZIMANÊ KURDÎ de dibêje:”Mamosta Reşîd Kurd, Dr.Kamîran

Bedirxan, S.Şivan û Dr. Qenatê Kurdo, (e) ji ser bernavêن şanîdan xistine û çêlî şêweyê dî nekirine.”

Mamosta Evdilfetah careke dî di rûpelê 133ê li sê cihan bêjeya(çêl) bi kar anîye û di serê rûpelî de dinivîse: “Celadet Bedirxan, di rêzimana xwe de çêl şêweyê(b) yê nekiriye.” Li birka(movik) didoyê de, ji wî rûpelî careke dî nivîsiye, dibêje: “Dr. Kamîran, di rêzimana xwe de, çêl babeta zêdera dûbarekirî, kiriye, lê tu rêzan ji wê re dannaîye.” Li cara sisîyê jî, her li wî rûpelî nivîsiye, dibêje: “Dr.Qenatê Kurdo, di rêzimana xwe de, çêl babetê kiriye, lê bi lez di ser wê re çûye.”

Mirov dibîne, ku van du nivîskaran bêjeya(çêl) bi wateya axavtin bi kar anîne, li gel ku, li deve-ra van herdu nivîskaran bêjeya(qal) bi kar tînin û dibêjin: Xelo qala Celo dikir. Belê di nivîsinê xwe de, li cihê bêjeya(qal), bêjeya(çêl) bi kar anîne.

Mamosta Reşo Zilan dibêje:

“Lê li gelek herêmên Kurdistanê, Kurdên li Qefqasyayê jî têde, bi tenê ji bo Dijûnê dibêjin. Ango, sixêf, xeber, qiseyê nexweş. Vêce, wek birayekî ji te tika dikim, lavakarê te me, ku bi tiştên weha rêyê li ber çewtiyênu ku dikarin birînê kûr vekin, xweş meke. Digel silavêni bîratiyê.”

Gotina te rast e, bi wateya dijûn jî têt; lê dijûn jî her gotin e, belê gotineke nexweş e. Kurdên Qefqasyayê bêjeya(çêr) weke dijûn û xeberên nexweş bi kar tênin. Li binxetê jî em dibêjin filankes xeberan dike, ango dijûnan dike. Lê xeberên xweş û yên nexweş jî hene; xeberan ji wî re dibêje, ango axavtin û gotinê nexweş ji wî re dibêje. Di bingeh de xeber bi tenê nebû ye, li pêşî xeberên pîs, xeberên qirêj, yên ku cihê dijûn û sixêfan digirin hatiye gotin. Lê di pey re û ji bo kurtkirinê, bêjeya pîs, an ya qirêj nemaye û xeber bi tenê weke dijûnê hatiye gotin. Raste em bêjeya xeber weke dijûn bi kar tînin, lê em

bêjeya xeber weke gutin û axavtinên baş jî bikar tênin; herwekî berê jî min dabaş kiriye. Vêce em vê bêjeyê li gel bêjeya(çêr) berber bikin, emê bibînin ku ew jî dikeve bin bazikê vê bendê de; em dikarin bêjin ku navdêra(çêr) carekê weke dijûn û gotina nexwêş wateyê dide û carekê jî weke axavtin û gotinê şêrin û xweş tê gotin; çêra şêrin û a neşerîn.

Li nav kurdên Sason û Bişêriyê jî bêjeya(çîr) ne ya(çêr) bi wateya dijûn hatiye.

Di ferhenga Elî Sîdo Goranî de bêjeya(çêr) bi wateya dijûn hatiye nivîsîn. Lê gelo em bi pirsin, ka mamosta Goranî çiqasî zimanê bav û bapîrên xwe dizanî? Ew mirovekî ku li Urdinê û li nav Ereban mezin bû bû; tiştê ji destê wî derketî kir û ev karê ha ji wî re serbilindîyeke gelek mezin e. Lê herwekî ku em dizanîn, wî bêjeyê ferhenga xwe hemî ji devê kesan guheztine, tenê ew kesen ku pêrgî wan bûye; lê em nikarin bêjin ku ferhenga Goranî serketiye. Wî nikariye hemî bêjeyê zimanê kurdî kom bike, ango ferhenga wî kêm e.

Mele Mehmûdê Bayezîdî jî bêjeya(çêr) bi wateya dijûn û xeberên nexwêş gotiye. Li rûpelê 36ê ji pirtûka(Adetên kurdistanê) gotiye: "ew(ango kurd) qewî bi ziman çêrî yekûdu nakin....Çêr kirin li nik wan fehêt e..)

Mamosta Hejar mukriyanî jî bi vî rengê xwarê ev bêje rave kiriye: „çêr:1) Jêr, bin.2) çêl (çêlek). 3)dost û heval. Ü deselat jî gotiye. Lê mamosta Hejarî bêjeya(çêrr) bi (r)ya qelew:1) Têr û çewalê dutakirî. 2) dijûn.

Mamosta Hejarî li gel ku mirovekî gelek zana bû û hinek ji zaravê kurmanciya bakur jî dizanî; lê wî nikariye ferhenga xwe ji zimanê kurmanciya bakur têr bike; li gel wê jî mamostayî ne tenê wateya dijûn, belê hin wateyê dî jî bi bêjeya çêr daye. Ev jî wê rastiyê dide, ku di zimanê me de gotinek bi çend wateyan heye û me mînak jî gelek hene. Ji bo mînak, bêjeya(ber): 1-Ber, ango kevir.2-Ber, berê tivingê, ango fîşek. 3-Ber, berê darê, ango mîwe. 4-Berê nixurî, ango zaroka pêşî. Çêleka me sêberî ye, ango sêgolik anîne; sê caran zaye. 5-Ber, berê te li kîj rexî ye?

Berê xaniyê xwe nede bayê reş..

Bi rastî ez behitî mam, ji vê lavelava mamostayî ku ji min dike û dibêje, ku ev çewtiyê ha dikarin birînê kûr vekin; ez nizanim wê ci birînan vekin!!???

Birayê min, ez niha xwe di mijara zimên de mi-jûl dikim û ez hewl didim ku ji hemî deveran û ji hemî devokan eger bikarim gotinan kom bikim, da ez bikarim hînî zimanê xwe bibim. Ku min karî ez hemî bêjeyan nas bikim û li hemî wateyê wan bigehim, hingê ji nû ez dikarim di bingehêن gotina kurdî de xebateke hêja pêşkêş bikim; ev hê destpêke, ez û te, em hîn di pêpelükên pêşî de ne; ne ez û ne ti kes dikare li hemî kuncen Kurdistanê bigere û ji bin guhêñ lat û beltikan xezna zimanê me kom bike, ku rûpelên sedên pirtûkan tejî dîkin. Bi hoyâ parçebûna welatê me û van sînorêñ ku piyêñ me bend kirine, tevgera me tim wê kêm bimîne û nameya me jî di mijara zimên de wê her timî kêm be. Lê çiqas dan û sitandin di nav me de berdewam be, em dê bikarîn berhemek bidin; çiqas piçûk jî be, her wê sûdber be.

16.5.2003

„Haiko“-ya kurdî

Ebdurehman Efîfi

Hezkirin min dûrî nivîsandinê dibe, nivîsandina helbestan. Divê ji evînê re hestên xwe deque bi deque binivîsim, an ewê aciz bibe, wê xwe aciz bike, wê hinekî bixeyide!!

Ez dixwazim xwe vala bikim, ti ramanên min tine bin, ti pêşeroj û çûrojên min tine bin; dixwazim nefikirim, nexwim, û venexwim, naxwazim razêm, tenê şiyar bim wek kulîlkekê ji kulîlkên dara qeresyan!!!

We kulîlkên dara qeresyan dîtine!?? Hûn bûne kulîlkên dara qeresyan!???

Carekê di hevpeyvîneke bi min re de, berî nêzîkî 15 salan, min wilo pirsek bi bersiv kiri bû: Ez dixwazim bibim gîhayek li ser banê xaniyan, dixwazim pişt re bibim hêlinike çûkan, dixwazim bibim kevirek, da bikari bim nas bikim ka çawa ew şînkahî, ew kevir û gir û darêن bîhîvan dihestin, ka danûstendina wan bi xuristê re çawa ye! Min dizanî bû, ramanên wan pir xurt in, hê-sirêن wan pir xurt in, ken û bisîrîna wan bêhaweye. Min dizanî bû, ez li ber wan biçûk im, bêfен im, bêmical im; minzanî bû, ezê pir bêşim, da kari bim pariyekî ji kontakta wan bi Xwedê re binivîsim.

Roj û şev ez xwe ji dinyaya derive dişom, ez xwe vedigerîn dinyaya hinav; carcaran bi min re derdikeye, pircaran bi min re dernakev: ez çêbûnek im ji herdu dinyayan, ez vî tiştî baş di-zanim; lê dinyaya derive min dêşîne, ez tiştîn wê gişan nikarim biecibînim, pir tiştîn wê nikarim biecibînim. Pir xerabî û êş tê de hene û dilê min ji xwe ne hesin e, dilê min kulîlk e!

Çima li ba me Kurdan, kes bala xwe nade Bud-

dah, hayê tikesi ji Zêن tineye: ev balnedabûn, ev hayjênebûn sûcê kê ye? Kê wilo kiriye, ku em vê kurahiya mezin, em jê bidûr bin, em jê çavgirtî bin! Kê wilo kiriye, ku ştexaliya me tenê li ser êşê û polîtîk û bindestiyê be! Ma ev ne sedemek e, ku em naletê li zorker û zerdesten xwe bînîn! Çima ew nahêlin em bibin Buddah!

Ez ji evînê re wilo dinivîsim: ez li ser riyekê tengik im, li çepê min darstan e, li rastê min serê birca kenîsê ye, baraneke hûr dibare û dinya rok e. Tu zanî, ci bi serê min hatiye; naxwazim herim malê, ez betilîme û nema liv ji min tê, lê hîn dixwazim bidime ser vê riya tengik, li bin vê baranê bim, ji vê ruhniyê bixwim.

Evin ji min re dinivîse: "Te iro tiştek ji min re ne nivîsî, ez jê fêm dikim ku tu di min de nafikirî, ez nayêm bala te." Evîn hinekî xeyidiye: evîn şitleke gulê ye, divê axa dora wê carê bête kolan, carê bête avdan, carê ew pencera, ya ku ew li ber e, bête paqijkirin. Heke tenê tu ji şitlê re bêjî, ji te hez dikim, ew têrê nake, ew ji gotinan bêtir kirinan dixwaze, xwe di ser nivîsandina helbestan re dibîne.

Di ber stasyona sereke a tirênan re li Hannoverê dimeşim. Evîn ne li vir e, dûr e. Yekî cilperpitî hinekî xêzan li ser kaxetekê dinivîse. Gelo ew helbestvan e! Belkî ez bi xwe bim, van rêzan dinivîsim: kulîlkên darêن qeresyan ên japanî li ber bê diweşin, evîn dûr e, ew kesê cilperpitî ez û ne ez im.

"Haiku"-ya kurdî dibînim hêdî hêdî li Kurdistanê û li cîhanê kulîlk dide.

* * *

Feqî Reşîdê Hekarî û Du helbestên wî

Seîd Dêreşî

Feqî Reşîdê Hekarî êke ji helbestvanê kevin, ewî jî li dwîv şîyanê xo dewsâ xo di mêtôya torevaniya kurdî de hêlaye. Evî helbestvanî Wekî piraniya helbestvanê kurd kêm li ser hatiye nivîsîn û kêm berkarê wî jî maye; tiştê heta niho li pey wî maye tinê kitêbeke bi navê (Sîrrûl Me'hser)û du helbestên wî jî di nav desnivîsên min de hene, ku li ser "Biharê"ne. Di vê guitarê de, dê hindekê li ser jîna wî û li ser kitêba wî a navbirî nivîsîn û herdu helbestên wî jî ïnîne xwarê:

Tiştê heta niho li ser Feqî Reşîd hatiye nivîsîn, bi vî rengî ye:

1. Berî her kesekî Cegerxwîn di helbesta xo ya li ser helbestvanê kurd, navê

Feqî Reşîd ïnaye, herweke ku dibêjît:

Yekî dî dibêjine wî Feqî Reşîd
Di zarê kurdî de fêris û egîd
Niviştek wî heye bi navê Sirr Mehser
Zarokê kurdan dixwînîn ezber

2. Sala 1984ê, hêja Ehmed kurê Helîmê ê Di-yarbekrî, pirtûkek li bin navê "Rehberê Ewam" danaye û çap kiriye, ku raverkirna pirtûka "Nehcul Enam" a Mela Xelîlê Hîzanî ê Sêrtî ye, pirtûka Reşîdê Hekarî "Sirr Mehser" jî di gel de çap kiriye û di rasta jîna wî de tiştê negotiye, tinê dibêjît: "dibêjin ji koçerê Hekarya ye".

3. Sala 1985ê nivîsevanê hêja Ebdil Reqîb Yûsif navê vî helbestvanî di gutara xo "zanayê mezin Mela Xelîlê Sêrtî" de bi "Feqî Reşîdê Alki" ïnaye.

4. Sala 1987ê nivîsevanê çeleng Ebdul Rehman Mizûrî bo cara êkê di gutarekê de, pîçekê bi dirêjî li dwîv jîna vî helbestvanî çûye, gutara xo li bin navê

"axivtinek serbara hozanvan Feqî Reşîdê Alki" belav kiriye.

5. Sala 1986ê nivîsevan Zeynelabîdîn Zinar pirtûka vî helbestvanî

"Sirmehşer" ji tîpên erebî veguhastiye tîpêن latînî û sala 1990ê çap kiriye.

Hêjayî, berahiye bo nivîsiye û pîçek jî li ser jîna wî axivtiye. Û dibêjît:

"Ev çapa Sirmehşerê ya bî tîpên Erebî ku didest me de ye, di sala 1984 an de bi destê Mele Ehmedê Qoxî, di paşıya Nehcilenama mele Xelîlê Sêrtî de, bi yek cildî çap bûye û wî hinek têbînî jî li ser hin malikên wê-bi kurmancî-nivîsîne5."

1

Tiştê gelek baş ew e, ku Zeynelabîdîn desnivîsa Mela Ehmedê Qoxî ya Sîrmehşerê di gel latîniya wê çap kiriye.

Navbirrên kitêbê

Kitêba Sirr Mehser ya pêkhatiye ji 589 beytan.

Kitêb hemî li ser 24 navbirran hatiye nivîsîn: Navbirra êkê: li ser Xudê û mezinatiya wî ye.

Navbirra duyê: helbestvanî li ser rewşa xo gotiye.

Navbirra siyê: li ser rewşa Gorrê ye.

Navbirra çarê: dîsa li ser serûberê Gorrê ye.

Navbirra pêncê: li ser bêmifayıya dînyayê ye.

Navbirra şesê: li ser nîşanên Qiyameta mezin e.

Navbirra heftê: berhevkirina Cehnemê.

Navbirra heştê: danana Tirazîye ye.

Navbirra nehê: Tirazî û 'Hesir.

Navbira dehê: li ser rêzên mexlüqatî li roja Qi-yametê.

Navbirra yazdê: kesên Zikatê neden.

Navbirra dwazdê: xudanên kirrîn û firotinê.

Navbirra sêzdê: şehadeta zor.

Navbirra çardê: yê şehadê diveşêrît.

Navbirra pazdê: ehlê Zinayê.

Navbirra şazdê: ewê Cîranan têşînin.

Navbirra hevdê: xudanêñ keyf û henek û laqirdîyan.

Navbirra hejdê: ewêñ malê sêwîyan dixon.

Navbirra nûzdê: xelkê Kujek.

Navbirra bîstê: xelkê çakî û başiyê.

Navbirra bîstûkê: dwîmahî û aqûbeta kesêñ navbirî.

Navbirra bîst û duyê: Feqî Reşîd li ser nefsa xo.

Navbirra bîst û siyê: xatîma kitêbê.

Navbirra bîst û çarê: dîsa Feqî Reşîd li ser xo û texsîriyêñ xo.

Dengêñ navbirran

Navbirra (1): li ser deh dengan hatiye vehandin.

Navbirren 3, 5, 9, 22: her êk ji vana li ser şazde denga hatiye vehandin.

Navbirren 2, 4, 6, 7, 8, 10, 11, 12, 13, 14, 15, 16, 17, 18, 19, 20, 21, 23, 24: li ser yazde dengan hafîne vehandin.

Di dawiya desnivîsê de, meşiqvanî navê xo û dîroka meşiqkirna wê bi vî rengî nivîsiye:

Xudê ji we razîbe, ku we fatîhe xwend

Ehmedê Qoxî jî bikin şerîkê xêrê

Roja duşembê 23 Cimada axir sala 1404mîşexî

13 Adara 1399r, 26 Martê

sala 1984za

Cend malik ji Sirr Mehserê bo mînak

Ev cend malikêñ xwarê dê bo mînak ji kitêba “Sirr Mehser”ê, ji navbirra duyê deyne Pêş çavêñ xundevanan:

Ey Feqî tarîx-i benda te temam

Heq teala mexfîret ke filqiyam

Min nivîsî ev kitab leyî û nehar

2

Lew ji bo îxwanê dîn ra yadigar

Kê bi vê bendê bikêtin û tibar

Hem bike herçî ku nuqsane sitar

Heq Teala eybê wî mestûr bike

Hem di heşrê da ewî mesrûr bike

Min bi ewna Reb nivîsî ev kelam

Ber ruhê Ehmed selat û hem selam

Hem li cumle al û hem eshabê wî

Tabîîn, ensar û hem ehbabê wî

Hem ji Ummet razîbîtin ew muîn

Rehmetullahî eleyhîm ecmeîn

Kî bixûne Fatihe bo me ji can

Rebbê alem wî bike ehlê îman

JÎNA FEQÎ Reşîd

a. Xelkê kî derê ye?

Di rastiya jîna wî de tiştekê têr û tijî li ber destê me nîne, tinê ew e, ya ku Ehmedê Hêlîmê ê diyarbekrî gotî, ku ((dibêjin ji koçerê Hekariya ye)).

Dîsan Ebdreqîb Yûsif dibêjît xelkê “Alka”ne. Alka jî eşiretek e û dûr nîne ji Hekarê bît.

b. Nav û Nasnavêñ wî

Tişte em ji nav û nasnavêñ wî dizanîn tinê ew e, ya ku wî di nivîsînêñ xo de ïnaye, ku di (Sîrrmehşer)ê de, çend caran bi “Feqî” xo nav kiriye, carekê jî bi “Feqiyê sanî” û carekê jî bi “Reşîd”. Di helbesta wî ya li ser “Bîhar”ê, tinê carekê bi vî rengî navê xo ïnaye: “Ew Reşîdê dil kule, Mîmî Hê l’pişte kevît”

Merema F. Reşîdî bi “Mîm û Hê lpişte kevît” ne xoyaye, dûr nîne mexseda wî her F. Teyran bît, ku piranî wî nasnavê xo bi “Mîm û ‘Hê’” ïnaye. F. Reşîd divêt bibêjît: Reşîdê dilkul, ku ew bi xo ye, dikevîte piştî Mîm û Hê, ku Feqiyê Teyra ye.

c. JI DAYIKBÛN

Di rasta ji dayikbûna wî de, wî bixo çarmalkiyek di kitêba xo Sîrrmehşerê de nivîsiye û dîroka nivîsîna pirtûkê xuya kiriye, dibêjît:

Ey Feqî tarîx-i benda te temam

Heq teala mexfîret ke filqiyam

Min nivîsî ev kitêb Leyl û Nehar

Lew ji bo îxwan-i dîn ra yadigar

Zeynelabîdîn Zinar dibêjît: ((belam F. Reşîd di
beşê dawî yê vê pirtûka xwe de weha gotiye:
“Ey Feqî tarîxê benda te temam” û di malikeke
din de jî gotiye:

“min nivîsî ev kitab Leyl û Nehar”.

Îcar di van herdu hevokan de, dibe ku wî jî
mîna gelek nivîskar û helbestvanan tarîxa li
dayikçêbûna xwe yan tarîxa kutakirina nivîsan-
dina vê pirtûka xwe li gor hesabê Ebcedê “Ce-
mel” nivîsî be”. Lê eger ku ev wisa bin û em
rêza pêşî bikolin ji bêjeya “Tarîx”ê, tarîxa 1211
(1793) derdikeve. Eger ku em
li rêza din bikolin, ji hemû tîpêن wê tarîxa 1130
(1725-26) derdikeve!.)(10)

3

Bi baweriya min ya dirust nêrîna êkê ye, ya ku
dibêjît: ((Ey Feqî tarîx-i benda te temam)), ku
peyva “Tarîx” bi vî rengî tête vekirin: T 400 +
A 1 + R
200 + Î 10 + X 600 = 1211mş 1793za.

Nêrîna duyê ((Min nivîsî ev kitab)), ya ku ez
dibînim di cihê xo de nîne; û bi vî rengî xwarê
tête vekirin: ((m 40 + n 50 + n 50 + f 80 + i 10 +
s 60 + î 10 +

e 1 + f 80 + k 20 + t 400 + a 1 + b 2 = 1130mş
1725-26za.

Ji ber van egerên xwarê ez nêrîna êkê rast
dibînim:

1. wesa xuyaye ji awayê axivtinê û awayê
nivîsinê, ku Feqî Reşîdê Hekarî ne hindê kevne.
2. Praniya helbestvanen kilasîkî peyvîn Erebî
bo lêkdana dîroka nivîsinê, yan ya ji dayikbûna
xo bikar ïnayne, nek yên Kurdi.
3. Ev rêzepeyva hosa dirêj biser şiklê hindêve
naçît, ku wî bo mêjoya nivîsinê, yan ji dayik-
bonê ïnabit.

Helbestvaniya Feqî Reşîdê Hekarî

Bi rastî F. Reşîd xo gelek bilind dibînît û wesa

hizir diket ku helbestvanekî jêhatî û serkeftî ye,
herwekî ew bi xo dibêjît:

Eya ey Feqiyê Sanî heta kengî bikî dewran
Li wî darî tu mihvanî diçî paşî dibî ‘uryan

Merema wî li vêrê bi ((Feqiyê Sanî)) Feqyê
Teyra ye. Ew wesa xo dibînît ku Feqyê Teyra yê
duyê ew e. Lê eger mirov temâşey helbestên wî
biket, dê baş bo mirovî xuya bît, ku ne wesa ye
wekî wî hizir kirî. Ew û Feqyê Teyran gelek jêk
dwîrin. Bi rastî hunera helbesta R. Hekarî gelekê
lawaz û bêserûber e,
lewra jî hevberkirin di navbera wî û F. Teyra da,
nahêt kirin. Di teknîka vêhandinê de û di dariştina
dîmenen helbestvanyê de, ci helbestvanen kilas-
îk bi wê lawazyê nehatîne di meydanê da. Lê di-
gel vê çendê jî, wî cihek di nav dîwarê klasîkên
Kurd de girt û kete di lista klasîkan de.

Du helbestên Feqî Reşîd

Ev herdu helbest, sala 2000 min ji destnivîsekê
li Bîblyotêka Berlînê deranîn, ku di bin vê hij-
marê “ms.or.oct.1207” hatiye parastin. Di desn-
ivîsê de, bijîlî van herdu helbestan pêtir ji pazde
helbestên dî jî yên klasik tê de hene.

Desnivîs bi qelema Mihemed Tofiq kurê Ebdula
Efendî li Silêmaniyê hatiye veguhaztin.

Sala nivîsinê li ser nîne.

Hejiye bêjîn, ku ev herdu helbest bi êk awa û
êk mijar hatîne nivîsin, heta qalibên wan jî wek
hevin. Eger bi êk helbest jî danîn ci guhorîn na-
kevîtê.

Di helbesta êkê de nasnavê wî hatiye, lê ya duwê
nehatîye.

Di van herdu helbestan de F. Reşîd çav li helbes-
ta Mela Mensûrê Gêrgaşî, ya ku li ser “Bihar”ê
kiriye. Mela Mensûr yê ku di çerxên pazdê û
şazdê zayînê de jiyayî, ku bi wê helbesta xo, ya
ku ser “Bihar”ê navdar e û

berêkaneyeke di gel Melayê Bateyî. F. Reşîd jî
viyaye li ser rêça Gêrgaşî binivîsît, lê mixabin F.
Reşîd negehiştiye tûza Gêrgaşî jî. Helbestên wî
bêxîr û bêserûber hatîne. Evêن xwarê jî têkistên

wan in:

HELBESTA 1

Sibhan ji mîrê xefarî
Sibhan ji şahê cebarî
Xoş têt weqtê bîharî
Xoş bît lew feqr û jarî

4

Feqîr û rahet rûnît
Xilas bît mebrin baran
Dê çîn sorgulan ûnîn
Dinav beqçêt biharan
Heyran ji dil dicitin
Bo nêrgizêt xumaran

Nêrgiz û Lalezerkin
Şîn bûn li ber keviyan
şalûl û indelîkin
Dixûnin digel hemiyan
Van hemyan çîke çîke
Dixûnin liber kaniyan

Ehmer û sor û alin
Sinbila ser ximari
Yeqîne ew xelatin

J'bo dinyaê hinarî
Ew kanî û cibal in
Mineqqes bûn b'biharî

Sor û zer minewwer bûn
Bi litfa zalcelalî
Koh-i çiya gerim bûn
Ew ji Berf bûne xalî
Ku sor û al û zer bûn
Ew nêrgzêt hilalî

Hilal û gul kemilîn
Bi tertîba dinyaê
Kesk û sor pak xemilîn

Be qudraeta xudaê
Sinbil û lal fessilîn
Bi sor û al, semawî

Sor kesik bûn cibal e
B'qudraeta rebbniya
Kelş li rû hilal e
Têk xemmilîn hemiya
Kesik zer, sor û al e
E'hmer bûn koh-i çiya

Kohiser minewwer bûn
Çiya ku bûne bûke
Çiya ku sor û zer bûn
Hinarî j'bo kulîlka
Biyaban müşekkel bûn
Kebik derbûn ji şûka

Lew şûk û zincîr vebûn
Dest û payê bilbilî
Herçî hey mezlûm berbûn
Exres bibûn 'indelî
Lal û gul mizeyyen bûn
Bihar temam mekmelî

Temam kemîlî dinya
Bi zîneta biharê
Bilbil gerya şahiya
'Indelî hate xarê
Melbûs bûn koh û çiya
B'semawî û sor û tarî

Ku sor û zer kemili
Xoş bû weqtê şahiya
Ewin melhema dili
Heta koh-i Qafîya
Ku xoş dixwînit bilbilî

Bilakotin hate çiya

Bilbil bo mi`hib gule
Welê bidest nakevît
Van sorgulan da mile

Ji bo `himaran dê çît
Ew Reşîdê dilkule
Mîm û `Hê l'piştê kevît

taze kemilî
mizeyyen bûn hîlale
têt awazê bilbilî
sûsin wêt bûte kûyal
dê keyn melhema dilî

- 1.Ebdurrehman Mizûrî/Axitvinek ser bara hozanvan Feqî Reşîdê Alkî/govara:Beyan,hijmar134bp5
9,sal1987Bexda.Ji Ehmed Hilmî diyarbekrî/Rehberê Ewan/1984,Bp79
- 2.Ebdilreqîb Yûsiv/zanayê kurd Mela Xelîlê Sérîti/rojnama hawar,hijmar:805,sal1985
- 3.Ebdurrheman Mizûrî/jêdera berê
- 4.Feqe Reşîdê hekarî/sirmehşer/guherîn ji tîpên erebî Zeynelabidîn zinar.Weşanên Dengê Yekîtiyê.
Yekîtiya Demuqratên kurdistan.sibat 1990Duseldorf,weşanxana xweyî.
- 5.Feqe Reşîdê hekarî/Sirmehşer/guherîn ji tîpên erebî Zeynelabidîn zinar.Bp6.
- 7.Ebdurrehman Mizûrî /jêdera berê
- 8.Ebdurrehman mizûrî/jêdera berê
- 9.Destnivîsa Mihemed Tewrîq erendî/Bîblyotêka Berlînê,li bin vê hijmarê hatiye parastin”ms.
or.ok.1207
- 10.feqe Reşîdê hekarî/sirmehşer/guherîn ji tîpên erebî Zeynelabidîn zinar,Bp5-6.
- 11.feqe Reşîdê Hekarî/sirmehşer/destnivîs

37 37 37 37 37 37 37 37 37 37 37 37 37 37 37

30 Ü HEWT

37 37 37 37 37 37 37 37 37 37 37 37 37 37 37

37 37 37 37 37 37 37 37 37 37 37 37 37 37 37

37 37 37 37 37 37 37 37 37 37 37 37 37 37 37

37 37 37 37 37 37 37 37 37 37 37 37 37 37 37

37 37 37 37 37 37 37 37 37 37 37 37 37 37 37

SÎ Ü 7

Geyişte ber kinaypeke* û westa. Pêş ewey dabezê û hewalî dawakerî taksi bipirsêt, dergatexteke kirayewe. Kabi-rayekî ketey sûr û spî be larelar le pêpîl-kanekanewe hate xwarewe. Şofereke serincî da û kewte bîrkirdinewe.

Aya eme kelkî guwastinewey heye?..le rîga le naw otombêleke da narşete? Yan xewî lê nakewêt?.. Eger ew core bedmestane xewiyan lê bikewêt be agahênaneweya gelêk dijwar e û dirêje dekêşêt. Kat be fêrodane! Şofêrî taksi boy nîye herwa sûk û asan bedmest firê-date ser şeqam. Debêt nawend“sentral“ agadar bikrêtewe..Biryarî ewanîş her yek şite, bangî polîs dekirê yaxud yaro teslîmî niziktirîn binkey polîs dekrêt. Ey ewan çî deken? Be destkêşî naylonewe pelkêşî derewey deken. Le cizdan, yan gîrfanî parey taksiyeke derdênin û det-denê..êdê to mal awa“.

Hêsta biryarî tewawî nedabû kabira der-

gay piştewe kirdewe û xoy be ser kursi-yeke da kêşa û be dengî nizm wutî:

-Rojbaş heval!

Şofereke zor be nabedil welamî dayewe.. bonî keskunî bîre û cigere hewakey pir kirdewe.

-Fermû, bo kuy?

Ewca penceşî be jimêre(edad)otomat ikiyeke dana. Kabira qederêk serincî şoferekey da û be xawî wutî:

-Tikaye bo Garat**

Le rîga, wek hemî şew, bo ewey kat be ser berêt lêy pirsî :

-Em şewit xoş be ser bird ?

Kabira herdû destekanî be ruxsare sûre gûştinekey da hêna, pufêkî dirêjî kird û

wulamî dayewe

-Sî û hewt bîrem xwardotewe..birwane
wirgin delêy tankî lorî ye..

Şofêreke serincî da, bedem pêkenînêkî
nermewe pirsîyewe

-Sî û hewt bîre?? Ewe be rastite?!

-Ewca çi mecbûrm diro bikem

-Le şewêwe?

Kabira ruxsarî girj kird û riwanîye
katjimêrekey meçekî destî rast. Înca
xaw pirsî

-Saat çende heval?

Lêxureke serincî xêray daye katjimêrî
pişti sêw nîwî paş nîwero ye.

Belê, supas.

Hîpêkî kird û qirqêneyekî dayewe

-Bimbûre

-Meseleyek nîye

-To şofêrêkî mîhreban û mirovdostît

-Çon?

-Çunke zor le lêxuranî taksî xelkanêk
le gel xoyan helnagirin ke bedmestîyan
kirdibêt

-Bawer nakem bedmestît kirdibît..le
şewêwe heta êstayîş...

Kabira serî hênaye pêstir û pirsî

-Wutit çî ..le şewêwe ?!..nee nee heval
le seatî dew nîwî em beyanîyewe..

-Le pênc seat da sî û hewt bîre ?!

-Eha..

Bo çî bew xêrayî ye ?..Pêşbirkêy xwar-
dinewe bû ?

Pufêkî dirêjî kird, bonî keskun û cigere û
elkihûl hewakeyan qurstir kird. Şofêreke
pencey be dugmeyek da naw hewayekî
sard hate jûrewe.

-Belê heval..bebê pêşbirkê min
dorawim..bo ewey le xem û nîgeranî
dûrbikewme we.

Şofêreke serî leqand û(xem û nîgeranî)
wutewe.

Herdukiyan maweyek bêdeng bûn. Te-
nya givey hewayeke û wurey motor û
wîzey tayekan debîstra. Le pirêk da :

-to çît heval ?

-Çî.. min çîm ?!

Be pêkenînêkî nerme we wutî

-Dezanim to mirovît..Mebestim ewe ye

ser be çi gel û neteweyekît?

-Min Kurd im.

Serî leqand û çend carêk”ehay”
wutewe.

-Hîç le barey Kurdewe dezanît?

-Belê..belê, bedbextirîn gel in..

Destî xiste ser destî Şofêreke ke beser
gêrekewe bû, ewca piçir piçir wutî

-Heval! Ey Kurd.. bawer bike hîç dijî
biyanî nîm..xo îşim zor le derewe karim
kirduve..ewaney dijî biyanîn..bê zanyarî
û kurtbîn in..zewî û mirov tewawkerî
yektirîn..siruşt berhem dedat..îtir agay
le reş û spî û zerd û çûleke û Islam û
Mesîhî û ew şitane nîye..Min bawerim
waye le her kuwê kar û nan hebêt, ba
xelkî ruwî têken..

Hîpêkî kird û qirqêneyekî dirêjî dayewe

-Bibûre heval!

-Belê, Qeynakat.

Paş kemêk bêdengî dirêjey pêdayewe

-Deba êweş hîç nebêt ew mafetan hebêt
ke kirêkarî mîwan lîre heyane.

-Waye..eha..

Geyiştine Garat, Şofêreke ruwî tê kird:
-Fermû bilê, bo çi seqamêk?

-Eha..belê..rast, çep, ewca rastew rast.. a
lewêkane raweste.

-Zor hez dekem mîwanim bît

-Zor supas, debêt kar bikem..detwanît
le gel jin û mindalekanit da rojêkî xoş
besere berît..

Le katêk da parey taksîyekey deda
lîçekanî hênyewe yek, serincî le ser
çawî Şofêreke ragirt, henaseyekî dayewe
û be nîgeranîyewe wutî:

-Hemûyî têperri!

-Çî têperi?

-Jiyanî xêzanîm, tenanet hewtî
nefretîsim***tewa nekird!

-Bo?

-Le destim helhatin..

-Le destit helhatin..yanî çî ?!

-Her waye

-Bedaxewem..

Dergakey kirdewe, hewayekî fênik hiru-
jmî kirde jûre we. Qaçî rastî le derewe
bû, destî rastîşî be ser dergake we. Be
destekey tir ke cizdanî parekey têda
bû, sûk be şanî şofêrekey da kêşa:-
Ay le minî beraz, êsteş jinekemim xoş
dewêt.. dû mindalekem ewe her ba-
siyan meke! Nabût bûm..Ay le minî

beraz!..şewgerî û qumar û bedmestî nuqmî zelkawiyân kirdim..Bawerit bêt ew kesane(demaxsizin) ke wa dezanîn serkirdine ser xwardinewe çareser..

Awirî le dû kes dayewe ke be layan da têperîn..Serî birdewe pêstir û nizm wutî:

-Wa dezanît ewende gelho û nezanim hestim bewe ne kirdibêt? Ow..ewey debû ruy ne daye, ruy da..Lew bawere-dayt ke ew bo jinekem piyawêkî baştır debêt?

-Çî bilêm..

-To bilêt bigerêtewê lam?

-Çî bilêm..

-Axir çend carî tirîş belênî başbûnim daw..

Tep dergayekey daxist. Şofêreke otom-bîlekey xistewe kar û pêçî kirdewe. Kabira werçerxayewe û be lare lar çuve be piçir piçir wutî:

-Heval..em ro rojî ledayıkbînme..eger çî şewîş ledayık bûm..em ro bûme sî û hewt sal!

Şofêreke dest xiste naw destî pîrozbayî lê kird. Dirêjey pêdayewe:

-Hetmen êware jin û mindalekanim..be gulewe dêن.. wa nîye?!

-Ay ke xoş debêt!

Kabira werçerxayewe, be lare lar be çend pilîkane da serkewt. Xoy be derga asineke da kird. Şofêreke be mêşkî cencal û bîrkirdinewe kewtewe rê. Çendîn seat her bîr lew kabiraye dekirdewe. Eger çî ewe yekêke lew sedan u hezaran baseseyr û sersûrhêneraney ke bîstûnî. Serincî kewte ser katjimêrî pişî su-kaneke..zanî katî dengûbase. Mîlekey bada. Ke dengûbasî derewe dway hat, le beşî dengûbasî nawçeyî da emey bîst(volvang zayel, em roke bibwe sî û hewt sal, le qatî hewtemî bînakewe xuy firêdawete xwarewe.. Dêrêkî xwar û xîçî le ser lapereyekî jakaw nûsiwe we cêy hêstuwe: Îtir twanay jiyanim ne mawé! Ew deste gulaney ke jin û mindalekey deyanwîst pêşkeşî biken..dexrête naw gorekey..

Perawîzekan:

*Kinayne: Bar, Mexane

**Garat: Şaroçkeyekî nizîk be“Duseldorf“e

***Hewtî nefret: Qiseyekî Kultûrî Elmanî ye, bawerîyan waye ke ew jin û mîrdey hewt salan pêkewe helbiken êdî ciyabûneweyan degmen e.

GURG Ü SEYÊ ZÊREVAN*

Şevez hîveron, sayî bû esman
 Gurekî bîrsî pirç lê weriyayî
 Rastî seyekî li ber malê hat
 Gur hind lawaz bû, hind qor û hejar
 Terrî rût û tût wekî şivdarek
 Çav korevîşkî limoz gewr û boz
 Ew gurê pîr î jar î dev kelxot
 Lê seyê malê bi pirç û pal bû
 Xweş dibirisqî pirç û şenga wî
 Her du çavêñ wî cot tasên xûnê
 Gava direwtî deng wekî topan
 Gur bi dîna wî gelek zende ma
 Tirse tirs silav li wî segî kir
 Gotê pismamo çi hal û dem e
 Tu çi dixoy ku wa qelew bûyî
 Ka qebûl dike xudan û rebî
 Tu çi dikî ku dema te saz e
 Ew seyê malî xwe pir û gjî kir
 Got ger dixwazî tu jî wa kok bî
 Were li bal min em hevra kar kin
 Gur got hez dikim xudanê kar bîm
 Bêje kurapo çîye karê te
 Segî gote gur ez nobedar im
 Ez gur û dizan jî mala axa
 Eger gurek bê bo layê pezî
 Ez ewana he j, dûr va dibînim
 Li ber vî karfî evê xizmetê
 Goşt û hestikan dide min axa
 Li wê demê da çavêñ gurê pîr
 Wî zincîrek dît li ustuyê gemal
 Gur got ew çîye li gerdena te
 Seyî gote gur eva xelêtk e
 Gava gur bihîst navê zincîrê
 Jê pîrsî yanê tu ne serbestî
 yanê kurapo tu hindे pestî
 Ji bo nanê zik dijî pismaman
 Bi şev digerî lê rojê ronak
 Bi şevê axa te kîşkîş dike
 Bi roj zincîrê dike ustiyê te

hîva çimbilzîv ron kiri bû cîhan
 ji weş daketî pişt lê çemiyayî
 seyê bermalê lê ma heyr û mat
 hestiyêñ parxanan dihate hejmar
 ser li ser ustû xwe giranbarek
 gava dimeşî jê diweşî toz
 kê ew bidîta dil bi wî disot
 li ber pîrxoriyê şeng û şepal bû
 wek ya şêran bû xwe navtenga wî
 sor û geş bûn ew weke êtûnê
 wek hespê cehxor li bez û lotan
 li ber heybetan li cî da vema
 pîrsiyara dem û rewşa heyî kir
 dibînim dilê te pir bêxem e
 li ber çi pismam wa bedew bûyî
 ez wa qorr û jar tu wa qelew bî
 gelo tê bêjî ka ew çi raz e?
 li pêş gurê pîr xwe tirş û dij kir
 xudanê mil û pelek û çok bî
 bibin hevkar û tev kar û bar kin
 bi rûmet bijîm, ne şermezar bîm
 çawa dimeşe kar û barê te
 zêrevanîye şev kar û bar im
 diqewirînim jî rez û baxa
 pirikek here nav bax û rezî
 zû axayê xwe pê dihesînim
 axa dide min gelek rûmetê
 roj radizêm ez li ser binraxa
 kete gerdena seyê rûve jîr
 ku diteyîsî herwekî şemal
 ew çi bizmike li jêrcena te
 axam zincîrê bi wê ve dike
 dîlî û bindestî zû kete bîrê
 beniyî, qûlî herdem bindestî
 ji bo nanê zik dikî bindestî
 dixebitî tu bo şerq û şaman
 cîgehê teye dev kulîn û pag
 kîşkîş pismam û xizm û xîş dike
 tev girê dide his û hestiyê te

Tu hestîkojî ne nobedarî
 Ez qet naxwazim wê jînê ci car
 Bila sed salan bîrsî û dîlkul bim
 Bila birçî û bê pirç û pal bim
 Landa min bibe qefa kevirî
 Nebînim xwarin hefteyê carek
 Ne ko l, bindestêne neyaran kar kim
 Zincîra dîlyê li serê xwe kim
 Na, na naxwazim ez wê xweşîyê
 Pêşkêsi te be ew jîna pîntî
 Te xwe firotî bo parçeyek nan
 Ez û tu çîma dibin hevhejmar

xwe gelfiroşî di hiş de jarî
 qet nakevim ez jêr lepêne neyar
 ne ku zincîra dujmin li mil bim
 bê koşk û sera bê xan û mal bim
 nerazêm li ser binraxên hirî
 li birsa bimrim li ber zinarek
 dijî gelê xwe gazî û hawar kim
 gişt karî dijî netewê xwe kim
 dijî gel nakim ez dilresîyê
 tu ne ji meyi herre azintî
 kengê ez û tu em dibin yeksan
 herre wenda be ey segê mirar

4.5.02 Zürich

Hizra vê çîrokê ji çîrokeke Almanî hatîye wergirtinê û naveroka
 wê li dijî kesekî taybetî nehatîye nivîsinê.

Perwîz Cîhanî

Dostê Baranê

Dr. Zorabê Bûdî Aloian

Hesenê Silo ji baranê pirsî:

- Tu çima konê min şil diki?

Baranê got:

- Tu çawa diwêrî bêyî vir? Dakeve jêr û tev gundiyêن xwe mîna berê bijî, miqatî mala xwe be.

Hesenê Silo bi hêrs ket:

- Ev êdî karê min e, ez li kuderê xaniyekî ji xwe re şen dikim. Ji te re çî?

Baranê aveke gur reşande konê Hesen, ew jakand û ji erdê rakir. Paşê baranê vekir, Hesenê Silo dîsan carekê dakete gundê xwe û konek din ji xwe re kirî. Wî didît, ku pîrejin awirân diavêjînê û zilam pê dikenin: “Lê Quran li te ketiyê, teba te li gund nayê? Te jin-zarokên xwe radestî merivên xwe kirin û bi xwe hildikişî ser van giran. Xanebêzarê bêşerm, te li wir çi winda kiriye?”

Baranê jî herdem ev pirs didayê:

- Gelo te li vir çi winda kiriye? Teba te li gund nayê?

Îro jî baranê konê Hesenê Silo tev ava qirêj berda çemê Erezê. Lê Hesenê me li ser ya xwe sekinî û konekî nû danî.

Barana westiyayî gazinêن xwe kirin:

- Ez li dunya-alemê digerim, lê rastiyê bêjîme te, min serhişkên mîna te hêñ nedîstine. Tu jî rind dizanî: Kes tuneye, ku bi dilxwaziya te re qayîl be. Her dirawsêyek berhingarê te ye. De bêjê, ezê avê çawa bireşinim ser deşt û zozanan, ser berm û rûbaran, û xelk jî di ser de tuf li rûyê min bike? Gunehê te li min nayê?

Hesenê Silo gunehê xwe pê anî, lê ji armanca xwe daneket. Wî konê xwe danî û rahişte mer û keviran. Berêvarê sekoya xaniyê nû hatibû danîn. Niha mabû, ew xwaliya zêde biavêje jêr û şîvê bixwe. Hesenê Silo serê xwe bilind kir, li ezmanan nihêrî û ji şabûnan bazda. Xuya ye, ku îro ne ewrayî ye û baran nabare. „Ezê şevê jî bixebitim, mala xwe ava bikim, cihê xwe li vir dayînim.“

Roja din rûyê Hesenê Silo ji xwêdan û tozê reş dikir, lê mala wî ji kevirênu ku wî li dor goristanan kom kiri bûn, tîk û bedew bala xwe dida Dara Herherî. Gava baran barî û konê Hesen dîsan tevlihev û pirtî-pirtî dikir, ciwamêr xwe di mala xwe de veşarti bû û simbêlên xwe badidan.

Ji îro şünde baranê çi bikira, çi nekira – êdî ne xema Hesen bû. Li bin piyêñ wî gundê wî bû. Welatê ku ji bona bavê wî yî rehmetî dûrdest xuya dikir, niha jêre dibişkurî. Wî aliyê çemê Erezê xaka Kurdan bû. Eger meriv li berjêr seyr bike - milê Îranê ye, eger li destê rastê biferice – milê Roma Reş e.

- Te bi ya xwe kir, aferim! – baranê gotê û keniya.

- Çarê, bavê min Siloyê Ceferê rehmetî gelek li ber xwe diket, ku wî welatê xwe hîştî bû. Min jin anî, zarok mezîn kirin û niha dixwazîm, ruhê bavê xwe şâ bikim. Ez ji vir zozanên bereka wî baş mêze dikim. Xwedê bike, rojek bê û ne ala Tirkan zemîna me heram bike, ne jî sînorvanêñ Farisan.

Hema baranê ev gotin bihîstin, peya bû, li kêleka Hesen rûnişt û ew hembez kir:

- Tu ji min nexeyide, min rê nedida te, lê tu

bi xwe dizanî, neyarên te bi çendî fêlbaz û pîsin. Ez salê diwanzdeh meh gef dixwim, ku warê Kurdan geş nekim. Ev avrabûn û lehiyên ku têne serê te, wana ev daxwaz kirine. Ez ci bikim, delalê min? Xwedê fermanan dide min, dibêje: „Cîhanê avde!“ Xelk jî bi duhayan zorê li min dikan, ku ez mala te xerab bikim. Sawa wan ev e, ku eger te welatê bavê xwe bi ronî û zelal dît, hebe-tunebe, tuê rojekê wî ji xwe re paşde bistînî. Hesenê Silo dev ji gundiyên xwe ên bêtap berda bû û bi xwe bû sedema tirsa xêrnexwaz û

dizekan. Mala wî mîna şaxên serberz û serberf di navbera ewr-ezmanan de quloz dikir. Cari-nan Hesen çavên xwe ji Xwedê re diqurçandin. Xwedayê hebûn û nebûnê serê xwe bi loman dihejand ûbihna baranê teng dikir:

- Tu li Hesenê Silo nikarî, ez li wî nikarin, desthilatêñ cihanê li wî nikarin, gelo halê me wê çawa be? De bila ev duniya han hilweşê û bibe geremol! Wê çaxê belkî Hesenê çavşor bibe xwediyyê welatê bavê xwe! Tenê ez bi ci rengî qirkirina dijminên wî asteng bikim? Ne ez Xwedayê wana me ji?

Helbest

Adalbêrt Ludwîg Balig

Wergerandin ji zimanê elmanî

Dr. Ebdilmecît Şêxo 2002

Adalbêrt Ludvîg Balîng di sala 1933an de ji dayik bûye, me çend malikên vebijartî ji dîwana wî“Eger dilşadî bi basik bin“wergerandin û ev pirtûka wî ji (91) rûpelan pêk hatiye, û di sala 1984an de li Friburgê(Almaniya) çap bûye.

EGER DILŞADÎ BI BASIK BIN

Dilşadî
Pênpêniikeke

Rengdar û
Ronak e

Em li pişt wê diçin.

Dilşadî

weke kenîn
weke girîn

navnetewî ye

û bi hemî zimanan dipeyive.

Eger dilşadî bi basik bin
Barêñ derdan
Yêñ rojêñ dirêj namînin.

Eger dilşadî bi basik bin
Emê bibîsin

Çawa gul dipeyivin
 Û stêrik bi hev re dikurpisin

Dilşadî ew e
 Eger zarok li rex hev,
 bê kk kesek wanbihnteng bike.

Dilşadî ew e,
 eger aştî li her derê hebe.
 Dilşadî li ku derê ye?
 Li derênu ku gul bi hev re
 Hevaliyê dikan
 Li derênu ku, dar hev
 Diawirînin
 Û bi hev re rû li ken dibin.
 Dilşadî ew e,
 eger kesen din jî bi me re şanin

Dilşadî ew e,
 eger keçen nûgihayî,
 bê sedem bilind bikenin.
 Dilşadî nirxdar e,
 wek zêr e,
 lê zêr weke dilşadiyê
 nebiha ye.

Dilşadî hêvî ye,
 Dilşadî sipasî ye
 Dilşadî mîna nameyeke evînî
 ji jînê re ye
 Ev helbest hêjî maye.
 Dilşadî ew e, ku mirov, li ber destê sibê
 Di nav geyayê xunavî re
 Pêxwas seyranê bike.

Dilşadî ew e,
 ku kaniyek li çolistanê hebe.
 Dilşadî mîna bawesînekê
 Di deryayê de ye.
 Dilşadî mîna çiya

Ji tîrêjên rojê pirşenge.
 Dilşadî ew e, eger em bixebeitin.
 Dilşadî ew e, eger em bêhnên xwe
 vedin.
 Dilşadî ew e
 Eger emcejnan pîroz bikin.
 Dilşadî ew e,
 eger em bi heval bin.
 Dilşadî ew e,
 eger mirovine ku bi erkên xwe
 radibin
 wan bi-
 pesinînin
 Kî ronahiyê bide,
 ew dilşadiyê dide.
 Kî dilşadiyê bide ew hêviyê dide.
 Kî hêviyê diyarî bide,
 ew hezkirinê diyarî dide.
 Eger te çi kar kir
 Bi xwe re dilşadiyê bibe,
 û jê re deriyan û pencereyan veke.

Dilşadî cêwiye,
 dilşadî li nik te ye,
 eger tu kuda biçî,
 eger tu li ku bijî
 eger te çi kir
 her dem dilşadiyê bi xwe re bibe
 û jê re deriyan û pencereyan veke.

Eger tu dilşad bî
 Bihêle ku kesên jî
 Bi te re hevpar bin,
 ji ber ku dilşadî cêwiye.
 Ez ji te hez dikim,
 pênpinokê bi gulê re got:
 Ez jî ji te hez dikim,

gulê lê vegerand, lê tenê diviya bû,
te weha gotiba,
ta ku gulên din jî bibihîstana.
Eger mirov niha
Di ber min re derbas bin,
nizanin ku ez dixwazim
hîn guldar bim
û zû ne çilmisim û nemirim.
Eger dilşadî bi basik bin
Emê bibihîzin
Ku gul bi hev re deng dikin.
Û stêrik distrêr.
Eger dilşadî bi basik bin
Ewê dilekî li dû dilekî veke.
Eger dilşadî bi basik bin
Ewê royê rake
Û bi ber me de hûne.

JI BO ME

Henîf Derwêş

Ji bo me...	Çekdarên çavres.
Xoşewîstên	Canê xwe
Dilê min.	Di devê tivingê de
Çavêن çiyan...	Danî...
Şêrên şikevtan...	Ji bo me..
Guhêñ gundiyan...	Di tariya şevê de.
Zimanê perîşanan...	Sitêrkên jînê
Şiyarin.	Ronî dikin
Ranawestin.	Da zarokêñ me
Lal in	Mîna zarokêñ cîhanê
Ji bo me ...	bê tiras bilîzin
Hatin...	bixwînin..
Derwêşê Evdî	bikenin..
Ehmedê Xanî	û bê tirs
Melayê Cizîrî	şîrê dayikêñ xwe bimijin
Osmanê Sebrî	
Nivîsandin	
Ji ber me...	12 o5 1999 Os
Evîna canê min.	
Seyrana buharê	
Sehera serê salê	
Agirê evînê	
Gulêñ darê hatine veşartin.	

Lehengê Laleş.

أن يصدر الرأي، أي رأي، عن الشريعتين كالدستور الوطني والوثائق الدولية فهو أقل ضرراً بالتفكير من صدوره عن مرجعيات، دنيوية كانت أم أخرى ().

أحمد جان عثمان يظهر موقفاً واضحاً ومتقدماً على الجمّيع عن باكراً وها وهذا الموقف أو الرأي لن نصل إليه إلا بعد ضياع وقت طويل وكلّي أمل أن لا يكون بعد ضياع أرواح كثيرة أيضاً وقد تكون فرصة هنالك لدعوه الكتاب والمنتففين العرب والسوريين خاصة أن يقرأوا التاريخ والأحداث جيداً وأن يكتوّنوا سباقين في تجذيب شعوبهم ولدهم الكثير من الآلام، اتخاذ موقف واضح لا ليس فيه ما من عداه قضايا وعلى رأسها قضية الشعب الكردي في سوريا وحقوقه القومية، هناك تناقض بين أن تكون مثلاً مع الشعب الفلسطيني ونبيله كافحة حقوقه ومن ضمنه ماحق تقرير المصير والعكس مع الأكراد، هناك تناقض في أن أطالب بحق عودة اللاجئين بين الفلسطينيين والإغوان ووو بينما لا أخذ موقفاً من حرمان أنس موجودين أصلاً في أرضهم من حقوق المواطنة والجنسية والملكية ووو....

الهروب من مواجهة المشاكل والقضايا تحت أي مسمى يستعمل: كالوحدة الوطنية والمواجهة مع العدو والاستقرار ووو لم يعد مقبولاً.

أو ضدّاً لهم الاقت صادية والاجتماعية والثقافية بكل حرية، حسب ما جاء في المعاهدة الدولية للحقوق الاقت صادية، الاجتماعية، الثقافية الموقعة عام 1966.

3- تبطأ لما سبق، فإن لهم الحرية في الاختيار: الا تصال بالوحدة الوطنية أو لسوريا أو الانفصال عنها. إذا كان خيارهم السياسي الحر هو الا تصال بذلك يعني الاندماج الكلي بالمجتمع السوري أو الحكم الذاتي أو الفدرالية وأما الخيار الآخر فيعني الاستقلال كدولة أو إقليم في ما يسمى بكرستان.

4- كل ذلك، كما أعتقد، بعض النظر عن إدانة السلطات السورية ومثقي بها لهم بـ "الخيانة العظمى" أو الدعم الذي يتلقونه، كما يدعى البعض، من الإمبريالية والصهيونية العالميين أو بعض النظر عما يحدث الآن في المنطقة من مؤامرة دولية. هكذا كان رأيي.

وأضدّيف أن الشعب الكردي كان، في ما مضى ، ضحية المؤامرة الدولية، مثله مثل الشعب الفلسطيني، ولا ضير إذا استعاد حقوقه جراء مؤامرة دولية أخرى ! فلندع الأكراد ليتمتعوا بحقوق قيم الثقافية والاجت ماعية والاقت صادية قبل أن نطالبهم بكل الواجبات التي تخطر على بالنا.

قو مي تقد مي رأى أن الـ حل يتم باقـا مـة دـولـة كـرـديـة مـسـتـقـلـة فـي العـراـق وـتـخـيـرـ الـاـكـرـاد فـي سـورـيا بـالـرـحـيل أـو الـبقاء . . . الـحـقـيقـة أـنـا اـحـتـرـ متـ الـشـقـ الـاـول مـنـ رـأـيـهـ كـوـنـهـ لـمـ يـقـ بلـ باـسـقـلـالـ أـوـ اـنـفـصـالـ الـاـكـرـادـ وـكـوـنـهـ لـمـ يـهـاـ جـمـ الفـيـدـ رـالـيـةـ مـثـلـ غـيرـهـ دـونـ أـنـ يـعـرـفـ ماـذـاـ تـعـنـيـ . . .

الـكـثـيـرـ مـنـ الـكـتـابـاتـ رـافـقـتـ وـتـلـتـ الـاـحـدـاثـ وـفـرـضـتـ عـلـىـ الـجـمـيعـ انـ يـدـلـيـ بـدـلوـهـ مـنـ مـخـلـفـ الـاـتـجـاهـاتـ وـالـمـوـاقـعـ، وـعـبـيـداـ عـنـ كـتـابـ السـلـطـةـ وـمـنـ يـدـورـ فـيـ فـلـكـهاـ وـفـلـكـ الـتـعـصـبـ الـقـومـيـ الـأـعـمـىـ تـجـدـ فـيـ كـتـابـاتـ بـعـضـ الـمـقـنـيـنـ الـاـكـرـادـ عـبـارـاتـ الـمـدـيـحـ عـنـ التـعـاـيشـ الـسـلـمـيـ وـالـفـيـسـيـفـاسـ الـرـائـعـ الـتـيـ كـاـنـتـ سـائـنـةـ قـبـلـ اـحـدـاثـ تـلـكـ الـمـبـارـاةـ وـكـانـ الـمـشـكـلـةـ فـقـطـ بـدـأتـ بـعـدـ الـمـبـارـاةـ . . . آخـرـونـ بـدـأـوـ يـسـرـدـونـ وـيـذـكـرـونـ اـلـاـخـرـ اـلـذـيـ اـنـاـمـ نـهـ بـتـضـحـيـاتـ الـاـكـرـادـ وـالـشـخـصـيـاتـ الـكـرـديـةـ اـلـتـيـ قـدـ مـتـ لـسـوـرـيـةـ اـرـواـحـهـاـ مـثـلـ يـوـسفـ الـعـظـمـةـ وـفـكـرـهـاـ مـثـلـ مـحـمـدـ كـرـدـ عـلـيـ مـعـ الـاحـتـرـامـ الـكـاـمـلـ لـمـنـ وـرـدـ ذـكـرـهـمـ وـلـكـنـ حـسـبـ رـأـيـهـ اـنـ الـاـكـرـادـ لـيـسـوـاـ فـيـ قـفـصـ الـاـتـهـامـ حـتـىـ بـيـرـهـنـوـاـ اوـ يـجـهزـوـاـ الـأـدـلـةـ عـلـىـ مـدـىـ تـفـانـيـهـمـ فـيـ خـدـمـةـ هـذـاـ الـوـطـنـ . . .

فـيـ بـحـرـ الـكـتـابـاتـ الـتـيـ رـافـقـتـ وـتـلـتـ الـاـحـدـاثـ لـمـ أـجـدـ مـوـقـفـاـ أـوـ وـضـعـ منـ مـوـقـفـ الـكـاتـبـ الـسـوـرـيـ أـحـمـدـ جـانـ عـمـانـ الصـيـدـيـنـيـ الـأـصـلـ وـنـحـنـ قـوـمـ نـحـبـ أـنـ ذـكـرـ الشـخـصـ بـأـصـلـهـ دـائـمـاـ، حـتـىـ لـوـ كـانـ الشـخـصـ أـوـ الـشـعـبـ هـذـاـ مـوـجـودـاـ فـيـ هـذـهـ الـبـقـعـةـ مـنـ الـأـرـضـ قـبـلـ وـجـوـدـنـاـ . . .

يـقـولـ الرـجـلـ فـيـ مـقـالـ نـشـرـ فـيـ مـوـقـعـ الـحـوارـ الـمـتـمـدـنـ التـالـيـ، تـحـتـ عنـوانـ: هـكـذاـ كـانـ رـأـيـيـ: (ـ مـنـذـ 12ـ آـذـارـ ، فـقـدـ أـدـلـيـتـ بـدـلـوـيـ فـيـ مـاـ يـتـعـلـقـ بـالـحـوارـ حـولـ الـمـسـلـةـ الـكـرـدـيـةـ فـيـ سـورـيـاـ). أـسـتـطـيـعـ تـلـخـيـصـ مـاـ ذـهـبـتـ إـلـيـهـ فـيـ تـلـكـ الـمـاـدـلـاـتـ كـالتـالـيـ:

1 - الـاـكـرـادـ هـمـ سـورـيـونـ كـفـيـرـهـمـ مـنـ الـإـثـنـيـاتـ الـمـتـعـاـيشـةـ جـنـبـاـ إـلـيـ جـنـبـ مـعـ الـعـربـ . . .

2 - يـنـدـغـيـ أـنـ يـتـمـتـعـواـ بـحـقـ رـيـرـ الـمـصـيرـ كـشـعـبـ مـنـ شـعـوبـ الـعـالـمـ حـيـثـ يـسـتـطـيـعـونـ الـقـيـكـرـيـ فـيـ مـصـيرـهـمـ السـيـاسـيـ وـبـحـثـ وـدـرـاسـةـ

تقـعـ بـيـنـ الدـرـبـاـسـيـةـ وـعـامـودـاـ تـسـمـيـ (ـأـبـوـ جـرـادـ)ـ وـلـاـ أـدـريـ إـلـاـ سـبـبـ الـذـيـ جـعـلـ الـاـكـرـادـ يـسـمـونـ قـرـيـتـهـمـ بـهـذـاـ الـأـسـمـ رـبـماـ تـيـمـاـ بـالـجـرـادـةـ كـوـنـهـ لـاـ تـحـتـاجـ إـلـىـ جـنـسـيـةـ أـوـ جـوـازـ سـفـرـ.ـ الـمـهـمـ كـوـنـيـ جـاـوـرـتـ تـلـكـ الـقـرـيـةـ لـفـتـرـةـ مـنـ الـزـمـنـ أـوـ قـلـ أـنـيـ هـجـرـتـ إـلـىـ جـوـارـهـمـ وـأـخـذـتـ أـرـضـهـمـ وـكـلـ مـهـمـ أـخـذـتـ أـخـفـ وـطـنـاـ مـنـ غـيـرـهـاـ حـتـىـ لـاـ أـتـهـمـ بـنـدـقـصـ فـيـ عـرـوـبـيـ،ـ الـقـرـيـةـ سـالـفـةـ الذـكـرـ يـوـجـدـ فـيـهـاـ شـخـصـ وـاـ حدـ مـوـجـودـ حـسـبـ الوـثـائقـ الـرـسـمـيـةـ السـوـرـيـةـ وـهـذـاـ الـمـحـظـوـظـ يـسـتـطـيـعـ أـحـفـادـهـ وـأـحـفـادـهـ وـمـنـ تـبـعـهـمـ إـلـىـ يـوـمـ الـدـينـ أـنـ يـحـتـقـلـوـاـ بـعـيـدـ مـيـلـادـهـ وـمـوـتـهـ يـوـمـاـ مـاـ يـلـغـهـمـ الـخـاصـةـ بـهـمـ وـبـشـعـارـهـمـ،ـ وـلـكـ مـاـذـاـ عـنـ الـبـقـيـةـ؟ـ اللـهـ أـلـعـمـ وـالـدـكـتـورـ الـشـعـبـيـ وـبـثـيـنـةـ شـعـبـانـ اـيـضاـ . . .

ماـ حـصـلـ أـثـنـاءـ الـمـبـارـاةـ وـبـعـدـهـاـ وـمـاـ أـدـتـ إـلـيـهـ مـنـ نـتـائـجـ فـيـ الـقـرـيبـ الـمـنـظـورـ وـالـبعـيدـ دـفـعـنـيـ مـثـلـ الـكـثـيـرـ بـنـ غـيرـيـ أـنـ أـكـتـبـ وـأـدـعـيـ الـاـلـامـ بـالـقـضـيـةـ بـكـلـ تـقـاصـيلـهـاـ وـمـسـبـبـاتـهـاـ وـحـسـبـ الـمـثـلـ الـفـاقـلـ أـهـلـ مـكـةـ أـدـرـيـ بـشـعـابـهـاـ فـمـاـ بـالـكـ وـأـنـاـ اـبـنـ تـلـكـ الـشـعـابـ وـالـشـعـوبـ . . .

مـنـذـ بـدـايـةـ الـاـحـدـاثـ حـاـوـلـتـ تـوجـيهـ سـؤـالـ مـحـدـدـ إـلـىـ الـاـحـزـابـ وـالـمـنـظـمـاتـ وـالـشـخـصـيـاتـ الـكـرـديـةـ السـوـرـيـةـ السـؤـالـ هـوـ مـنـ فـقـرـتـيـنـ:

1- هلـ أـنـتـ مـعـ حـقـ تـقـرـيرـ الـمـصـيرـ لـأـيـ شـعـبـ عـلـىـ وـجـهـ الـأـرـضـ،ـ وـبـالـأـخـرـ خـصـ الـشـعـوبـ الـفـلـسـطـيـنـيـ؟ـ

2- مـاـذـاـ عـنـ الـشـعـبـ الـكـرـديـ إـذـاـ؟ـ

وـالـحـقـيـقـةـ حـتـىـ الـاـنـ اـنـتـرـرـ الرـدـودـ.ـ مـنـ خـالـلـ الـمـنـاقـشـاتـ وـالـأـحـادـيـثـ مـعـ الـاـشـخـاصـ الذـيـنـ قـابـلـتـهـمـ وـيـتـمـ الـتـطـرـقـ إـلـىـ الـقـضـيـةـ الـكـرـديـةـ بـشـكـلـ عـامـ وـمـاـ حـصـلـ فـيـ الـفـامـشـلـيـ بـشـكـلـ خـاصـ تـصلـ إـلـىـ نـتـيـجـةـ سـرـيـعـةـ إـنـ الـاـحـدـاثـ مـفـتـلـةـ وـمـدـعـومـةـ مـنـ الـخـارـجـ لـاـ يـوـجـدـ الـاـكـرـادـ اـصـلاـ فـيـ تـلـكـ الـمـنـطـقـةـ مـنـ سـورـيـاـ اـنـمـاـ اـنـاسـ قـدـمـواـ مـنـ الـعـرـاقـ وـتـرـكـيـاـ وـاـيـرـانـ وـكـرـمـ الـاضـيـافـةـ الـعـرـبـيـ تـرـكـهـمـ يـقـيمـونـ تـلـكـ الـمـدـةـ الـطـوـلـيـةـ . . .

صـدـيقـ اـسـلـامـوـيـ تـمـنـيـ لـوـ أـنـ الـاـكـرـادـ لـمـ يـكـوـنـوـنـ مـسـلـمـيـنـ لـكـانـتـ مـشـكـلـهـمـ مـحـلـوـلةـ،ـ عـلـيـهـمـ فـقـطـ اـنـ يـدـفـعـوـنـ الـجـزـيـةـ وـيـعـيـشـوـنـ بـسـلـامـ وـأـمـانـ،ـ رـفـيقـ

هذا هو رأيي

عمر هلال
عفرين - نت 08.05.04

